

Ji xunava Bîranînan

<i>Ji Xunava Bîranînan</i>	1
----------------------------------	---

<i>Ji Xunava Biraninax</i>	2
----------------------------------	---

Dilawerê Zengî

Ji Xunava Bîranînan

(Dîtin û Hevpeyvînên Min)

Mafên çapkirin û belavkirinê parastî ne

Dilawerê Zengî

Ji Xunava Bîranînan

(Dîtin û Hevpeyvîn)

Çapa yekemîn Qamişlo – 2017

Çapa duyemîn Qamişlo 2021

Çapxana Pêla

Naverok

- Arşekê Baravî. GUL.FM Amûdê.....	7
- Orient-Net.....	25
-Rojnameya NÛDEM -E.Bavê Alan.....	33
- Spûtnîk Kurdistan.....	57
- MALPERA: www.serhed.org / E. Mûşî.....	65
-W. Demhat Dêrikî www.rojnamawar.com	85
- Malpera Tîrêj-Şûro.....	107
-Malpera Rizgarî- Hozanê Bengî.....	131
- Wêneguhêza R.TV-Fêselê Daxilî.....	141
- Rojnameya Mîdya- Ako Mihemed.....	159
- Rojnama Roja Teze- Yakûp Karademîr.....	169
-Kovara Pirsê- K.Pirs.....	187
-Kovara Zevî -Mîdasê Azîzî.....	205
- Kurtejiînenîgariya D. Zengî	213
-Helbestên ku diyarî min bûne.....	225
-Wêne û berhema.....	249
<i>Ji Xunava Biranînan</i>	5

Hevpeyvînek ligel Dilawerê Zengî ..

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya...

Arşekê Baravî. GUL.FM | Amûdê

*D.Zengî, di sala 1961-ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistana Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di sala 1979-an de, û li Amûdê bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, di wê salê de dest bi nivîsandina helbestanê dike.

*Li ber destê diyêke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Ev dê (Ferîde Elî) akameke (bandurake) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike.

*Di sala 1980-an de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zangoya Şamê kar dike.

*Li bajarê Şamê gelek qursên fêrkirina zimanê kurdî li nav kurdên Şamê lidar dixê û bi sedan xort û keçên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dike.

*Di warê ramyarî û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye.

*Di sala 1991-ê de, piştî serîhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî girê dide.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yê navdar ji tîpên Erebi veguhestiye Latîni û pêşgotin ji wan re nivîsiye ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)...û du dîwanên helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî (Ji Evîna Çirayên Kevin û li Xelkê Tehlê li Min Şêrînê). Li dora (200) pirtûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê daye weşandin.

* Berhemên wî, di warê Helbest, Çîrok, Ziman, Dîrok, Wêje, Folklor û Wergerandinê de, li dora (35) pirtûkî weşandiye. Gelek pirtûkên wî destnivîs hene..

*Gelek xelat li derveyî welêt û li hundirê welêt jî wergirtine.

P1- pir kesayetiyên navdar piştevaniya te kirine mîna Şêx Sedrî, helbestvanê kurd Seydayê Tîrêj,

**Siyasetvan Osman Sebrî, Rewşen Bedir-Xan û..
hwd. Rola kê ji wan di warê hînkirina ziman û
miştomalkirina behre û berhemên te yên wêjeyî û
ramanî de bêhtir hebû..?**

B: Di destpêkê de, ez spasiya te dikim û bi hêvî me ku em sûdeyekê li xwênerên xwe yên hêja bikin. Bêguman, naskirina van ronakbîrên gewre û hêja û danûstendina bi salan bi wan re wê bi bandor û ezmûneke hêja be. Nemaze, di fêr-kirina xwendin û nivîsandina zimanê kurdî, rêziman û azînen wê, nivîsandina serbest (Pexşan), hûnandina helbest û razên wê û têgihîştina kar û xebata kurdayetiyê de, roleke pir mezn di avakirina kesayetî, raman, bîrûbawerî û xebata min de kirine. Her yek ji wan bi awayekî rola wan hebû. Di destpêka xebata min de, Şêx Sedrî ez hînî nivîsandina tîpên latînî kirim û bi seydayê Cegerxwîn û Tîrêj dam naskirin. Seydayê Tîrêj di hûnandina helbesta kurdî de pir piştevaniya min kir. Tekoşerê gewre Osman Sebrî ez hînî nivîsandina pexşan û rêzimana kurdî kirim. Rola O.Sebrî di miştomalkirina behre û berhemên min yên wêjeyî û ramanî de balkêş û sereke bû. Bi serbilindî dibêjim: Ez ji şagirtên dibistana O.Sebrî me. Li dora deh salan min pêre daye û stendiye. Min ji ezmûna wî ya kar û xebata bê rawestandî pir sûde wergirt, nemaze di warê hizrê neteweyî û hezkirina wî ya bê sînor, ji zimanê kurdî re. peyayekî

bêhempa û pir mêr bû. Dayika hêja gorbuhiştî Rewşen Bedir-Xan ewê jî roleke pir baş di warê wergerandin, wêje, heskirina kurdayetî û kar û xebata min de kir. Bi rastî ez hînî gelek ji serpêhatiyên jiyanê kirim û ta bi vê rojê di bin bandûra wan gotin û pendê wê de mame. Ji min re digot: (Lawê min!, peyayên malbata Bedirxaniyan bextê (şensê) wan di jiyanê de pir kêr bû. Ji wî tovê ko çandin negihan ko jê bixwin. Ew mirov in, pir li pêş bûn, lê millet ne gihabû. Ez ji Celadet bi şenstir im. Ji ber ko ewî xort û keçên kurd ên xwendevan bi çavên serê xwe ne dît. Bi keda xwe şad nebû. Lê, bi sedan xort û keçên xwendevan û zana îro li dora xwe dibînim. Lawê min!, Tu xortekî di xebatê de pir germî, û te qedera xwe bi malbata Bedirxaniyan ve girêdayî. Wek çawa şerê wan ji hêla mirovên dixok dihat kirin, weharengê wê şerê te jî bibe. Riya te dirêj û dûr e. Bi bê dengî karê xwe bike. Ji karê xwe meweste. Divê hilma te fireh be. Kê çi got li wan venegerîne. Ez bawer im dem kefile ji bo rastiyê. Divê tu hevalê yekî-tiya Kurdan bî. Nebe sersebebê perçebûn û dûrketina kurdan ji hev. Bila tu berê keda xwe di jiyanê de nexwî. Lê wê dîroka gelê te, te jibîr neke. Bila tu peyayekî setembar bî, ne setemkar bî).

P2-Binemayên ku divê bi kesekî re hebin da bibe helbestvan û afrîner çine?!!

B: Helbest mêvanekî bê wext e. Helbest, bê rêdan û rêxwestin, dergehê raman û sawêrên helbestvanan vedike û baskên xwe li hizrên mirov dide û bi hestekî pir nazik û rewan dihingive û di movika çerxa demekê de, li bihneke xweş divarçile û di raza nepenî de dimeye. Di wê kêlîkê de, stêrkan mîna gulan dibîne û gulan mîna stêrkan dibîne. Ne bi dîtineke ekadîmî jîweriyê diguhêze, xunça helbestê linik helbestvan gul dide, bihin dide û zayîna jiyaneke nuh e. Helbest, hest e, qeşeng e, sawêrgêr e û şîrînzar e. Şîrîniya gulê bi dîtîna û şîravê xweş e. Lê ya xweştir ew e, ko bilbîlekî şeyda/ helbestvan bi deh hawan bixwîne û pesnê xeml û xêza gulê bide. Ezê wê gavê bawer bim; heger tu axaftineke bê sûd e, lavijeke bê awaz, sazike bê dûzan bî, tucarî tuyê nikaribî dilê gulê bidestxwekî; gulê dilkoçer e.

Helbestvan nikare di her dem û gavê de, yan di bin xwestekeke de, an bi biryarekê helbestê binivîsîne. Mexabin, helbestvanên me, para mezin dûrî vê rastiye ne. Gotinan li hev tînin, bêjeyan ji ferhengan derdixînin û rêzek ji vir û yek ji wir komdikin û dibêjin: Ev e helbest!!!. Hin jî hene, ji zimanê biyanî werdigerînin, di bin bandûra peyrewî û hevenda vê diyardekê de mane. Hin jî hene bi zimanê biyanî (Erebî, Tirkî, û Farisî...td), diramin û bi kurdî dinivîsin. Bi giştî helbestên wan bê sûde, bê fesal, bê serûber, xav, kerik û bê hawe ne. Helbestên wan

giyanekî bê can, balayekî bê per û bask û sirûdekî bê awaz in.

P3-Em dikarin navên berhemên we yên ji hemû nijadên wêjeyî û çandî binasin..?

B: Berhemên min yên çapkirî ji sala 1985-an de, di rewşeke pir dijwar û awarte de belav bûne. Li hemberî van dijwarî û qedexekirinê jî min li dora 300 pirtûkên nivîskarên kurd li Sûriyê daye çapkirin. Ezê berhemên xwe bi nav bikim, di navbera: (Daner, wergerandin û amadekirin)ê de, li dora 35 pirtûkên min hatine çapkirin, ew jî ev in:

*Dîwana (Pêdarî), Helbest. Sal:1985.

*Gramêra ziman-Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko - wergerandin-1990.

*Ji Mesela Kurdistanê- Celadet Bedirxan-wergerandin -1990.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Ji Evîna Çirayên Kevin) veguhestina tîpan 1991.

* Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Li Xelkî Tehlê li Min Şirînê)- 1991.

*Mîr Bedirxan: Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî.
Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê
ZENGÎ.

*Alîkariya Rewşen Bedir-Xan kir di weşandina hin
pertûkan de, ji wan:

-Bîranînên min -Salih Bedirxan-.

-Name bo Mistefa Kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan).

-Bîranînên Jinekê (perçê didiwan).

*Şerefnameya Menzûm- Cegerxwîn- ji tîpên Erebi
bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirin.
1997.

*Bîranînên Celadet Bedir-Xan, komkirin û
wergerandin bo zimanê Kurdî.

*Ez û Agir- Dîwana helbestvan Hizrevan-veguhestina
tîpan 1998.

*Stran, berf û baran -helbestvan Mûeyid Teyib
veguhestina tîpan.

*Bedirxanî di Cezîra Botan de -Malmîsanij-
wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û D.ZENGÎ. 1998.

*Berî heyv hilê -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebi. Ji weşanên Mîdiya-Erbîl. 2001.

*Qedrî Can- (helbest. Gotar. Çîrok û Wergerandin).- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

*Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Erebi-2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

* Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî-.komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Careke din li Istanbul, weşanxaneya Pêrî, 2005- hate çapkirin.

*Dîroka kelepura mîrnişîniya Botan. –Mele Xelefê Bafî. -veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Qedrî Can -(Helbest. Gotar. Çîrok û Wergerandin). Amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004. Careke din ev pirtûk li çapxana Emîral, Beyrît- Libnan. 2005-an de hate çapkirin

*وثن للعشق dîwanek ji helbestan- wergerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî. Weşandina Dar-Kîwan-Şam -2005.

*Mewlûda Pêxember –Tîrêj- veguheştina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral. 2006.

*Serpêhatiyên Kurdan-Tîrêj- veguheştina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral.2009.

*Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat), D. Zengî, Perçê 1-2. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

*Etyaf El-Madî, Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

*Bînahî- (Gotar, Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), D.Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneyê Emîral. 2010.

*Bîranînên Celadet Bedir-Xan. Komkirin û wergerandin: D.Zengî. Bi herdû zimanan /Kurdî- Erebi/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010.

*Ji Wêjeya Dozê. Amadekirin û komkirina D.Zengî û Ehmed Şîhab. Elmanya- Berlîn- 2011.

*Osman Sebrî. (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

*Çîroka Alaya Kurdî. Qamişlo. 2012.

*Pirtûka (Wêjeya Kurdî- Di Navbera Rastî û Hêviyan de)- Daner: D.Zengî Qamişlo, 2014-an.

*Pirtûka (Kurd û Kurdistan) Daner: D.Zengî. Qamişlo, 2015-an.

*Nivêjên Êzîdîyan- Celadet Bedir-Xan- Veguhes-tina tîpan ji erebî bo latînî: D.Zengî- Qamişlo, 2017

*Xwendina Kurdî, Kamîran Bedir-Xan. Wergeran-din bo zimanê erebî: D.Zengî. Qamişlo 2017

Ji bilî van pirtûkên min î çapkirî, hin pirtûkên min î li ber çapkirinê hene, û hin jî destnivîsin, bi hêvî me, di rojên bê de, ronahiyê bibînin.

P4-Tu weke wêjevan; zorê di guhertina çanda gelê me de nabînî..peyvên nû dertên (demoq-ratî-civaka sivîl-mafê mirov..hwd) tê çawa karibî van têgehyan belav bikî û xwe nêzî xwendevan bikî, çiku ev bûne rastiya civakê?

B: Berî her tiştî, li nav civakên pêşketî û şaristanî de, ev têgeh di riya azîn, rêbaz û yasayan de cihgirtî û xwedî sistemin. Ji dehên salan de, di riya avakirina sazî û dezgehên xwe re civaka xwe avakirine, pêşxistine û parastine.

Bi pêşveçûn û pêşketina alavên ragihandinê (Nêt, wêneguhêz.. hbd) re cîhana me bûye mîna gundekî biçûk, bi zû û bi liz, li hemberî bayên guhertinên ku di cîhanê de dibin û nemaze, li herêmekê mîna herêma me, ku bi dehên salane êş û azar ji rêjîmên setemkar û mafnenasan kişandibin, bêdiro wê bandor û akama van guhertin û têgehan lê bibe. Çendîn welatîyên me tiyê azadî, serbestî, wekhevî û mafên mirovan bin, hîn pirtir tî û birçiyên çanda ku têgehên riya azadîxwaz li pêşiya wan dûz û serast bikin û mafên wan, bi wan bide naskirin. Di civaka me de, çandeke nuh e. Pêwîst e, bi zanebûn û zanîne lê bihingivin, ne bi şaşî û qurmiçandî lê varqilin.

Di baweriya min de, ji bo belavkirin û danasîna van têgehan, pêdivî bi avakirina sazî û dezgehan heye. Heger dezgeh û saziyên civaka sivîl neyên avakirin û di karên xwe de ne azad bin, wê tucarî dê nikarin civakeke azad û serbest ava bikin. Ji hêlekê din ve , di riya hemû beşên ragihandinê re, di riya

lidarxistina şevbuhêrkan re û di riya rêbazên xwendinê re ev çand divê belav bibin.

P5-Gelek wêjevan û helbestvan bi wergerê weke pirojeyeke ramanî û şaristanî qayil dibin, mamoste Dilawerê Zengî ji wergerê li ku derê ye, gelo te karên xwe an yên kesên din werge-randine zimanên dîtir..?

B:Belê,wergerandin beşek pir giring û pêwîst e di wêje û çanda gelan de. Wergerandin mîna pirekê, di navbera wêje û çanda gelan de ye. Di riya wergerandinê re mirov pirtir sûde û haydarî çanda gelên dî dibe. Nemaze miletekî ku xwedî çandeke qedexekirî û bi dehê salan ji fêrkirina zimanê xwe û ji naskirin û xwendina dîrok, wêje, folklor û kultûra xwe dûr ketibe, pir pêdiviyê karê wergerandinê ye; ji bo pêşxistin û dewle-mendkirina ziman, wêje, çand û ramana ronakbîriyê linik gelê xwe. Di baweriya min de, karê wergerandinê karekî afrîner e, afrandin û vejandina wêje û çandê ye.

Min hin ji berhemên xwe wergerandine zimanê erebî, lê koka hemû berhemên min bi zimanê kurdî ne. Ez nivîskarekî kurd im. Çend berhemên min, di riya hin nivîskaran re bûne erebî. Min jî bi dehan berhemên gelek nivîskarên mezin, wergerandine erebî. Armanca min ji wê wergerandinê ev e ku ez

gelên dî haydarî çand û wêjeya kurdî bikim û bi gelên dî bidim nasîn ku gelê kurd xwedî çand û wêjeyeke pir dewlemend e. Xwedî dîrok, çand, wêje û şaristaniyeke pir kevnare ye. Roleke pir mezin di avakirina şaristaniya herêma de lîstîye.

P6-Helbest nehênî ye (raz e) û divê xwendevan li vekokê (kilîtê) bigere, gelo nehênîyên helbestê yê taybet hene.. û divê xwendevan dergehên wê veke..??

B: Wek min gotî helbest, ne diyaredeke sekinî û bê liv e. Ne jî dîtaniyeke ekadîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî di cîhana peyv û şorzaran de digere, û jiyaneke sermedî ye. Di pêşketin û nûkirina raman, hizir, ziman, huner û civakê de roleke mezin dilîze. Helbest deryake ji evîna bê dorpêç û sînûr e. Bê rawestandî û miçiqandin, dizê û diherike. Lewra, merov nikare şîretan li helbestvanan bike. Lê merov wek xwênerekî dikare nerîna xwe di helbestê de bide. Xwendina helbestê ji mirovekî ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwedyê (afrandekê) helbestê bixwe, piştî çend xwendinan, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sînora gotin û şorzaran de nayê bestîn, û ne jî tê hevragirtin. Ji ber ku ziman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweberî de jiber bike. Divê têtikiliyek giyanî di

navbera xwendevan û helbestê (pirsur û pirsurî)yê de hebe.

P7- Li navbera siyasetmedar û rewşenbîr hevaltiyeke kevnar heye..û roleke teyî ektîv di vê hevaltîyê de heye, tu vê çawa ji me re şirove dikî?

B: Rewşa gelê kurd ya jeopolîtîkî û dabeşbûna wan, kiriye ku rewşa helbest û toreya Kurdî bi giştî wekî rewşa ramiyarî û civakî be. Di nav rewşenbîriya cîhanê de, ev tişt nîne. Rewşenbîr tim rexnegir û çavnêrê civakê ye û neynika civaka xwe ye. Bi mêranî hemû kêmasî û şaşiyên siyasetmedaran diyar û xuya dike û dinirxîne. Belê çareseriyê jî ji wan kêmasî û şaşiyên re dibîne û bê dudilî zelal dike. Pireya caran siyasetmedar ji rexne û hebûna rewşenbîr dilgiran e. Dema min kar û xebata xwe ya siyasî dikir, min pir gotarên rexnegir jî belav dikir. Min şaşî û kêmasî paşguh nedikirin, nemaze ku kêmasî û ne guhdan di der mafê nivîskar û rewşenbîran de bûba. Gerek rewşenbîr di riya neynika xwe re hemû kêmasiyên siyaset-medaran ji gelê xwe re diyar ke û çareseriyê bibîne. Lê heyf e, di civaka me de, şerekî bê sinçî li hemberî wî nivîskar û rewşenbîrê ku bi rastûdurist, bi rol û karê xwe radibe, tê kirin. Diyare, divê tu di bin baskê wan de bî, yan tu dijmin î. Li gorî dîtina wan hevaltîyeke

dijber e. Pîvanên wan li gorî berjewendiya kesayetî û partîtiya wan e. Ev jî ne tiştêkî rast û durist e.

P8- Tu weke serokê yekîtiya nivîskarên kurd.. û ji ber ku te karê rojnamevanî jî ji kurdeweriya xwe kiriye, tu rûpelên konevaniya (siyaseta) kurdî çawa dixwînê..tu dibînî ku rewş vajî berjewendiya dozê diçe.. û rola nivîskar û rojnamevan di vê qonaxê de çiya?

B: Bêguman, Li gorî guhertin û veguhestinên ku li herêmê dibin, ji kurdan re derfeteke zêrîn e. Li gorî rewşa guhertinên cîhan û herêmê, diyar e, derfet û dema dest bi guhertina sînorên herêmê hatiye. Bêdiro! Hêdî hêdî ew siyaseta zelal dibe. Divê û giring e, em Kurd wek netewe biramin, û dest bi tevger û xebata xwe bikin. Maf û daxwazên xwe wek netewe bixwazin. Em, ne Tirk, Ereb û Faris in. Ji bo em vê derfetê ji dest xwe bernedin, divê em yek bin. Li her perçeyekî ji perçên Kurdistanê yekîtiya xwe ava bikin, û piştgiriya perçê dî bikin. Em ne destik û dûvik bin ji dijminê xwe re. “Tucarî dijmin nabin dost”. Ji bo pirsê kurdî dijminên me tev yekin. Ji bo kurdan alozî û kêşeyên xwe jibîr dikin. Daxwaza tevan tenê Kurd negihên armanca xwe, Kurd nebin xwedî dewlet. Îro, di pîvana siyaseta navdewletî de, pirsê kurdî hejmareke pir gir e û girêkeke girêkûtîkî di tevdan û hûnandina siyaseta herêmê û di ya cîhanê

de ye. Bê çareserkirina pirs a kurdî aramî di herême û di cîhanê de qet nabe. Lewra rewşa pirs a kurdî pir nazik e. Ji vê qonaxê re seriyekî sar û dilekî gerim giring e. Ji her demê pirtir doza kurdî pêdiviyê pirojeyê yekrêzî, hevgerî û zelal e. Pêdiviyê yekîtiya tevgera siyasî ye. Berjewendiyê doza gelê kurd di ser hemû berjewendiyên partîti û rêxistinên re ye. Ji hemû nivîskar, rojnamevan û rewşenbîran tê xwestin ku doza yekîtiya tevgera siyasî ya kurdî bikin. Doza parastina hizrê neteweyî û belavkirina hezkirina kurdî di nava gel de belav bikin. Bi dengê bilind li dijî şerê birakujiyê rawestin. Birakujî xwekujî ye.

Siyasetmedarino! Li dîroka xwe vegerin û bixwînin, kê xinizî bi mafê mîletê Kurd re kiriye?!. Kê welatê me Kurdistan dagîr kiriye?!. Di roja îro de, û ji her rojê pirtir zanebûn û kurdî ji siyaseta û rêberên me tê xwestin. Çareser kirina pirs a Kurdî bi yekbûn û yekîtiyê ye. Ma hûn guhê xwe ji gemara salan paqij nakin û dengê zingilê hişyarî û banga azadî û yekîtiyê, ya bavê neteweya Kurd Ehmedê Xanî (1651-1706) guhdarî nakin û nabihîzin?! Lê, ez dipirsim: „Em Kurd dikarin sêde ji vê nîrê werbigrin?!

P9- pirs a ku te dixwest ji te bikim û te li nav pirsên min nedît çi bû?

Spasdarê te me li ser van pirsan û her bijî ji bo kurd
û kurdistanê.

Amedekirin

Arşek Baravî

Amûdê

18-ê Nîsanê, 2017

Hevpeyvînek bi Dilawerê Zengî re

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya

Orient-Net

1: Di serî de, Tu çawa li rewşa Yekîtiya nivîskarên kurd dinêrî? û çima ev yekîti ne yekparçe ye?

B: Roja zayîna Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya di 11-10-2013 de kongirê damezrandinê li bajarê Qamişlo hate lidar xistin. Piştî danûsendineke dûr û dirêj di navbera YNKS û HNRK di 1-3-2014-an de, di riya kongirê ragihandinê re- li navenda Sobartû tevî Yekîtiya Nivîskarên Kurd bûn û di 10-10-2014-an de kongirê yekê hate lidar xistin. Pireya nivîskarên herêma Cizîrê li dora vê Yekîtiyê civiyan û daxwaz û dîtinên xwe tê de dîtin. Li hemberî van nîrên pir dijwar ku di ser gel û welatê me re derbas dibin, (rêjîmeke hovane, Şer, kuştin, girtin, Perçebûnên tevgera siyasî, penaberî û buhabûn) avakirina dezgeheke rewşenbîrî û çalak ne karekî hêsan e. Hebûna Yekîtiyê, Kar û xebata wê li hundirê welêt e. Em li ser xaka xwe bi hêz û huner karê xwe dikin. Ez roja damezrandina Yekîtiyê pêwîstiyêke dîrokî, sinçî û mirovatiyê dibînim.

Armanca wê yekbûn û yekirina yekrêziya hemû nivîskar û rewşenbîran e. Ez bawer im wê xêrnexwaz jî pir bin. Lewra Yekîtiya me raserî gelek dijwarî û astengan hat. Mexabin, yek ji wan dijwariyan, ji ber destwerdana hin endamên serkirdayetiya partiya (PDKS) (M.S) Yekîtiya Nivîskaran bi darê zorê perçe kirin. Ya dudiwan, ji ber: ezezîtî, kêsbazî, pîrgîrî, bêwijdanî û bêbextiya hin nivîskarên ne xwedî berhem û nivîsandin. Diyar e, perçekirina Yekîtiyê ji wan dihate xwestin. Piştî belavbûna ew ewrên reş û tarî, rewşa Yekîtiya Nivîskaran ji her demê bi hêztir û çalaktir berdewam e.

Çi dema nivîskarên me bûn xwedî kesayetiyeke azad û serbixwe û xwe ji bin bask û çengê siyasetvanan rizgar û riha kirin, û berjewendiyên gelên xwe dan ser perjewendiyên kesayetiya xwe, wê gavê tucarî Yekîtiya xwe parçe û par nakin û wê baweriya wan bi karê dezgehiyê were. Teqez, wê gavê herkes wê karê xwe bike yê nivîskar wê nivîskariya xwe bike û yê bacan û xiyaran difroşin û karê xwe bikin.

2: Em dixwazin tu hinekî bi kurtî li ser rola Yekîtiya Nivîskarên kurd biaxivî? û ta neha vê yekîtiyê çi pêşkêş kiriye?

B: Di civaka hemû gelan de, sazkirin û avakirina dezgehên civaka sivîl pir giring û pêwîst e. Mîna Yekîtiya Nivîskarên kurd-Sûriya dezgeheke rewşenbîrî, serbixwe û sivîl e. Guhdanê li ziman, kultûr, folklor, çand û wêjeya kurdî dike. Xwedîderketin li berhemên xwedî berhemdar û çapkirina wan. Kovarekê pir qeşeng bi navê (Nivîskar) bi herdû zimanan (Kurdî-Erebî) diweşîne. Bi dehan semîner, şevbuhêrk û mihrecan û heftiyên çandî lidar xistine. Gelek pêşengehên hunermendên şêwekarên kurd lidar xistine û ji wan çilrojîya hunermendê cîhanî Umer Hemdî û pêşengeha wê li Heseke û Qamişlo lidar ket. Roja 6-ê meha 6-an cara pêşî lidar dikeve wek roja çîroka kurdî, li asta herçar perçên kurdistanê. Heft şaxên me hene. Du navendên me (li Hîsiça û Qamişlo) hatine vekirin. Yekemîn belgeya karê rewşenberiyê di navbera me û navenda Gelawêj li Silêmaniyê bi merasîmin pir mezin hate imzekirin. Programê me yê mehane heye; her roja sêşembê simînerê lidar dikeve. Ev simînerên me tev li ser rewşa civaka gelê kurd, Sûriya û cîhanê ye,

li ser ziman, dîrok, çand û wêjeya kurdî ye. Simînerên me bi beşdarî û danûstendina siyasetmedar, rewşenbîr û ronakbîran pir germ û geş in. Têkilî û danûstendinên me bi tevaya Partiyên siyasî, rêxistinên civaka sîvîl, komelên jinan û dezgehên rewşenbîrî re xweş in. Em nuha karê ava kirina şaxên Yekîtiyê li dervî welêt dikin. Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya Yekîtiya hemû nivîskarên xwedî berhem in.

3: Di mijara hişyarî û Saxlemkirina Civakê de ,tû bi çi rengî rola rewşembîrên kurd li rojavayê Kurdistanê dinerixînî? û van kesan çi ji Civaka xwe re pêşkêşkirine?

B: Wek hûn dizanin rewşenbîr bi gelek rangan hatine ravekirin, ez rewşenbîr neynika civakê dibînim. Tiştê ji rewşenbîran zelal û diyar in ji her kesî ve nexuya ne. Rewşenbîr ji çavkaniya hemû zanînan vexwariye û di hizr û ramana xwe de meyndiye. Rewşenbîrê rasteqîne û durist riya riha kirinê ji gelê xwe re diyar dike, rastî ji nerastiyê jê re nîşan dike û bi mêranî , dilsozî, pendarî, ronakbîrî û bi çaksaziyê civakê dinirxîne û civakan serûbin diguherîne, pêşdixe û finda zanîne di tariya nezanîne

de vêdixe. Rewşenbîr tim dûrî dudilî, kêsbazî, pîrgîrî, çavpehnî, guhdirêjî, nandozî, berjewendî, çavboq û xêrnexwaziyê dikeve. Li rojavayê kurdistanê rastî tu rewşenbîrên -wek min li jor daye diyar kirin-, nehatime û (rewşenbîr) û nivîskar jî qet bi rola xwe ranebûne. Ji ber ku nivîskar û (rewşenbîr)ê ne azad bin, wê çawa civakekê azad bikin!!??.

4: Di warê siyasî de û di dema ku parçebûn rewşa aliyên siyasî kurdî ye, çi ji rewşembîr û nivîskaran tê xwestin?

B: Rewşenbîr, ronakbîr û zanyarê bilind Ehmedê Xanî (1650-1707) ji mêjde gotiye: (Ger dê hebûya me itîfaqek ... Vêkra bikira me inqiyadek... Tirk û ereb û ecem bi tamamî... hemyan ji me re fikir xulamî) Ev gotina rewşen-bîrê kurd ji siyasethanên kurd re ye. Heger rewşenbîrên vê demê û serokên partiyên me pirtûka zanayê xwe Ehmedê Xanî bixwendana wê giringiya yekîtî û lihevkerinê bizanîna..lê mexabin îro ne roja rewşenbîrekî wek E.Xanî ye. Kêmcaran di civaka kurdî de siyasethedar guhdarê dengê zengilê rewşenbîrên xwe ne. Gelek caran rewşenbîr têne piştguhkirin.

Di hemû waran de, (rewşenbîr) û nivîskar divê rexnegîrê rewşa civakê bin. Tiliyên destên xwe li ser birînan deynin û ji êş û derdên me re dermanan peyda bikin û çareser bikin û riya rast û durist şanî gelê xwe bidin. Jê tê xwestin ku nirx û buhaya cihşîna gelê xwe biparêze, bilind bike û berjewendiya neteweyî ya bilind bin pê neke. Berjewendiya kesayetiya xwe nede li ser berjewendiya gelê xwe. Çi di warê civatê, gerdiş û serhawan de be, û çi di warê siyasî, ramanî û zanyariyê de be.

5: Ma gelo raste kesên rewşembîr, Civaknas, nivîskar û helbestvan dûrî êş û azarên Civaka xwe ne?

B: Wek min got: kesê dûrî civaka gelê xwe bin, ew ne rewşenbîr in. Rewşenbîr neynika civakê ye. Divê bi kul, azar, şê û kovanên gelê xwe ve haydar be. Li sedemên rûxandinên raperîn û şoreşên gelê xwe haydar be. Vedenga berxwe-dana gelê xwe be. Wijdanê gelê xwe be. Dengê devê birîna pirsê gelê xwe be. Wêneya tekoşîna pakrewanê azadîxwaz be, periya tabloya rengên gerim, rengên rojê, Sor, Sipî, Kesk û zerê roja Mîtanî li ser sînga alaya welatê xwe be. Pênûsa rastiye be eger ku şûrê Daişê mejîreş li

ser stûwê te be. Ne rojnamevanekî çavbirçî û kultêrxurê masa partiyan be û ne li hêviya ragihandina gotinfiroş û zimanlewçan be. Ez bawer im, xebata wan wek kelemperan pûç e, li ber bayê bayekî winda dibin û teqez wê ew û karê xwe yê erzan winda bibin.

Hevpeyvînek Taybet

Dilawerê Zengî

Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd - Sûriya.

-Seydayê Dilawer ji xwendevanê NÛDEMê re xwe bide nasîn?

Piştî şewata Sînema Amûdê bi salekê, ango di sala 1961-ê de, ez li wir hatime dinê. Ez li ser bîna şewata zarokên Amûdê mezin bûm. Du birayên min bi agirê Sînemê şewitîn. Diya min Ferîde li dora deh zarokên bê guneh ji nav devê agirê Sînemê riha kirine. pîrejineke welatparêz û miletperwer bû. Ew welatparêziya wê ji kurdayeriya bavê min dihat. Min xwendina xwe ya seretayî û ya navîn li bajarê Amûdê kuta kir. Lê, mexabin piştî mirina bavê min û ji ber ûştî rewşa abûrî min xwendina xwe nebir serî. Piştî mirina bavê min, barê malê kete ser milê min û xwiya malê ji min hate xwestin. Ji bêçarî min berê xwe da bajarê Şamê. Ji wê demê de, min xwe ji nivîsandin, belavkirin û çapkirina wêjeya Kurdî re vala kiriye.

-Hûn çawe hînî çand û wêje û zimanê kurdî bûn?

Di sala 1977-an de, min dest bi nivîsandina helbestanê kir. Bandûra Şêxê welatparêz û mîletperwer (Şêx Sedredînê Bavê Kal-dostê bavê min bû) pir li min hebû, û li ber destê wî pirtir fêrî nivîsandin û xwendina Kurdî bûme, û bi alîkariya wî min helbestvanê gewre Cegerxwînê nemir û Seydayê Tîrêj nas kirin. Helbesta pêşî ko min nivîsand bi navê Ey Felek bû. Ta bi vê rojê jî min nedaye belavkirin. Sedemê ne belavkirina wê helbestê jî ev bû; ez di rewşeke pir dijwar û xizan re derbas dibûm. Min bi çavekî pir tarî li dunyayê dimeyzan. Lewra min navê helbesta xwe kiribû Ey Felek. Birastî felek li serê min digeriya, û ez xortekî 16 şazde salî bûm. Min ji van kaniyan tevan ava zanîn û perwerdekirina helbest, wêje, dîrok û zimanê kurdî vexwariye. Ji serpêhatiya jiyânê, ez hînî nivîsandinê bûme.

-Bêtir seydayê Dilawer nêzî çiyê di nivîsê de?

Helbest mêvanekî bê wext e, lê ez jî mazûvan-ekî baş im. Ez pirtir pala xwe didim lêkolînan. Herdû, du baskên firê ne di cîhana wêje, dîrok û zimanê kurdî de.

Berhemên we ên çapkirî çî ne, û wan ji xwendevan re binav bike?

Berhemên min yên çapkirî ji sala 1985-an de, di bin baskê rewşeke awarte de, belav bûne. Li hemberî van dijwariyan jî min li dora 210 pertûkên biraderan li Sûriyê dane çapkirin û belavkirin. Ji wan berheman, ezê berhemên xwe binav bikim:

***Dîwana (Pêdarî)**-helbest 1985.pêşgotina wê seydayê Tîrêj nivîsiye. Ew dîwan ji helbestên evînî, nîşan, welatperwerî, xweşxwan, marş, aştî, jîna hov û teban, dîrokî...û bi awayekî kilasîk hatine hûnandin. Lê, ez bawer dikim di naveroka xwe de pir nûkirî û hevdemî ne. Bi zimanekî pir bilind hatine hûnandin. Li vê dawiyê min helbesta nûjen jî hûnandiye

***Gramêra ziman**-Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko-1990. Ev pirtûk giramêra mîr Celadet û şagirtê wî yê Firansîz Rojê Lîsko ye. Birastî, ciwantirîn û buhatirîn pirtûka ko li ser zaravê Kurdmancî hatiye afrandin ev pirtûk e. Ji ber giringiya vê pertûkê, û tunebûna giramêrên zimanê Kurdî di nav destên xortên Kurdan de, me ev pirtûk li ser daxwaza Rewşen

Bedir-Xan û bi alîkariya du-sê mamosteyên zimanê Firansîzî wergerand zimanê Erebbî. Ji ber rewşa siyasî ya pir dijwar, ewan mamosteyên dibistanê ne xwestin û naxwazin navên xwe, an keda xwe di vî karî de binav/eşkere bikin, û ta bi vê rojê jî nexwestine bînin ziman. Li ser daxwaza wan û ya Rewşenê navê min bi tenê daket ser pertûkê. Lê, mexabin hin kesên ko di çirava gola genî de nêçîrê dikin û bi şevê mîna beqan qurqurê dikin, ji çavnebarî û dixsokî ev kar kirin qajika nav deranan û pir bêbextî li min kirin –digel ko me di pêşiya pertûkê de, di rûpelê sipasiyê de, daye diyar kirin. Lê, dîsa jî dev ji zikreşiya xwe bernedan. Birastî, daxwaza me ya pêşîn û dawîn ev bû; ko em vî berhemê hêja di nav gelê xwe de bidin belavkirin. Em ne heyranê navê xwe ne. Li gorî gotina Rewşen xanim; '(Bi vî karê xwe, me sûdeke pir mezin li gelê xwe kir', Bila tu mirovekî setembar bî çêtir e ko tu mirovekî setemkar bî), û nerîna wê di pêşgotina pertûkê de xweş zelal û xuya ye.

***Ji mesela Kurdistanê-Celadet** Bedirxan-wergerandina min e-1990. Ev pirtûk li ser tirkirina Kurdan dipeyive. Ew jî hate wergerandin û belavkirin.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Ji evîna çirayên kevin**) wergerandina tîpan-1991. Dema min ev dîwan ji tîpên erebî veguhest tîpên latînî, li Binxetê pireya helbestvanên nûhatî destên xwe avêtibûn helbestên erebî û di bin bandûra çanda erebî de mabûn. Bi belavkirina vê pertûkê û dîwana didiwan (**Li xelkî tehlê li min şirînê**), di yek salê de, berê xortên nûhatî ji helbesta erebî baş hate guhertin, û destê xwe avêtin hûnandina helbesta Kurdî ya nûjen. Ji ber ko di wê demê de meydana meydana helbesta kilasîk bû. Bi vî karê xwe, min helbesta nûjen ya kurdên başûr di nav xortên nûhatî de da belavkirin.

***Mîr Bedirxan**: Lutfî, wergerandina: E.S.Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedirxan. Ev beşek ji pirtûka Lutfî ye, Rewşen Bedir-Xan ji cem seydayê Goranî ji bajarê Emanê-Urdinê anîbû. Ez û wê, em li ser sekinîn û me hin navên malbatê û dîroka wan serast kirin. Bi rastî, ez û Rewşen Bedir-Xan, me gelek karên hêja bi hev re kirin. Me çend pertûkên malbata wê dane çapkirin û belavkirin. Ji wan pertûkan: -Bîranînên min -Salih Bedirxan-. -Name bo Mistefa kemal paşa. -Bîranînên jinekê (perçê didiwan).

***Şerefnameya Menzûm**-Cegerxwîn-ji tîpên Erebî bo tîpên Latînî, û lêveger, ravekirin û serastkirina min bû. Di 1997-an de. Ev destnivîs nehatibû çapkirin û belavkirin. Di riya dostekî re bi navê (Kalemêr=Sedeqe) re, min ev destnivîs peyda kir.

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan**- min komkir û wergerand bo zimanê Kurdî. Ev bîranîn di rojnameya Wicdan û Huriyê de –ya ko rojnamevanê Aşûrî Yûsif Melek li Beyrûdê diweşandin- derdiket. Careke din bi herdû zimanan /Kurdî-Erebî/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010-an hate çapkirin.

***Ez û Agir**- Dîwana helbestvan Hizrewan-wergerandina ji tîpên erebî , sala1998. Ev dîwan jî mîna herdû dîwanên E.Mizûrê min veguhestin tîpên latînî û belavkirin.

***Bedirxanî di Cezîra Botan de**-Malmîsanij-wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan bi piştgirî û alîkariya min amade bû.1998. Bi rastî, ev pirtûk pir hêja û giranbuha ye. Gelek reşbelek û wesîqeyên dîrokî tê de peyda dibin. Min jî li dora bîst wesîqe û gelek wêneyên malbata Yezdanşêr, û him agahiyên

dîrokî yên di dermafê wî û Bedir-Xan de, dane belavkirin. Ez bawerim ev cara yekemîne ko ew wêne û agadarî têne belavkirin. Tu kesî berî min ev belge belav nekirine; mîna wêneyên Yezdanşêr û birayê wî Mensûr û neviyên wan.

***Berî Heyv Hilê** -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebi. Nivîsandina min e- Ji weşanên Mîdiya-Erbîl.2001. Ev pênc çîrokên min in, ji jîweriya gelê Kurd in. Di van çîrokan de, min rengê mêranî, fedakarî û xebata gelê Kurd aniyê zimên. Ê ji hêleke din ve, min zordarî û sitemkariya dijminê gelê Kurd daye diyarkirin.

***Qedrî Can** amadekirin û berhevkirina min e. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Erbîl=Hewlêr 2001. Ev berhem ya pêşîn e ko hemû nivîsên helbestvan Qedrî Can civandiyê û gelek agahiyên nû li ser nivîsiyê û jiyana wî diyar dîke. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004. Careke din ev pirtûk li çapxana Emîral, Beyrût- Libnan. Di 2005-an de hate çapkirin.

***Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Erebî-2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Ev bîranînên xebatkarê nemir Osman Sebrî di riya Kurê wî Hoşeng re gihane destê min. Hem bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

***Şerrên Sasûnê** -Osman Sebrî-.komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Careke din li Istanbul, weşanxaneyê Pêrî, 2005- hate çapkirin.

***Dîroka Kelepûra Mîrnişîniya Botan.** Ev destnivîs ji hêla Seydayê mezin Ebdureqîb Yûsif gihabû destê min -Xwediyê wê Mele Xelefê Bafî bû.-Min veguheste tîpên Latînî. Bi zimanê Kurdî -2005, li Beyrût, Libnan. çapxana Emîral hate çapkirin.

***وثن للعشق** dîwanek ji helbestan- wegerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî. Weşandina Dar -Kîwan-Şam -2005.

***Muxtarat** (Lîqaat we Hîwarat), pirtûka min e, Perçê 1-2. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

***Etyaf El-Madî,** pirtûka min e . Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

***Bînahî-** (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), pirtûka min e, Beyrût – Libnan. Çapxaneyaya Emîral.2010.

***Ji Wêjeya Dozê.** Amadekirin û komkirina min û hevalê min Ehmed Şîhab e. Elmanya- Berlîn- 2011. Pirtûkeke pir bi belge û wesîqe ye.

***Osman Sebrî.** (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Ya min e. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

***Çîroka Alaya Kurdî.** Qamişlo. 2012. Lêkolîneke pir giring e.

*Pêvî van berhemên ko min anîne ziman, bi dehan gotar û lêkolînên min bi herdû zimanan (kurdî-erebî) di kovar û rojnameyên Kurdistanê de hatine belavkirin.

-Têkiliyên we bi Seydayê Tîrêj û Apo Osman û yadê Rewşen Bedir-Xan re hebûn û xurt bûn jî, tu dikarî li ser wan têkiliyan biaxivî?

-Wek min got, seydayê Tîrêj mamosteyê min bû ji sala 1977-an ta bi roja koçkirina wî. Min jî pê re nemerdî nekir. Tevaya berhemên wî bi destên min

hatine çapkirin. Seyda bandûra wî li xortên nûhatî gelek hebû. Têkiliyên me sînorên mamoste û şagirtiyê derbas kiribû. Em bûbûne wek heval, dost û birayên hev. Li gorî daxwaza wî ya berî mirinê ko ez bi kar û barê roja koçkirin û veşartina wî rabim. Min jî ev daxwaza wî bicih anî. Seydayê gewre Osman Sebrî mamosteyê min î ziman û nivîsandina pexşane bû. Ji sala 1983-an ta bi roja koçkirina wî têkiliyên me her berdewam bûn. Mamostakî rastgo, zana, û pir mêr bû. Li ser destê wî ez hînî awayê kar û xebatê bûm. Mîreka Kurd Rewşen Bedir-Xan di sala 1987-an de min ew naskir û her roja pêncşem û îne ez li mala wê bûm. Wê ez wek lawekî xwe pejrindibûm. Li ser wesyeta wê min cendekê wê ji bajarê Banyasê anî bajarê Şamê, li rex Mîr Bedir-Xan û Celadet veşart. Ew danûsten-dinên ku di navbera min û wê de çê bibûn, min tev di riya gotarekê re belav kiribûn.

-Rast e ku Seydayê Tîrêj navê te kir Dilawer?

Belê, Seydayê Tîrêj navê min kir (Dilawer) û paşnavê min jî Zengî ye.

Te bi helbestê dest binivîsê kir, hûn çawe helbesta kurdî li rojavayê Kurdistan dinexînin?

ji bo helbesta kurdî beşê kevneşop, bi destê hin helbestvanan riya xwe dişopîne lê mexabin bi yekgavî li pêşiya helbestvanên me yên kilasîk nexistine û dîl û giriftarên wan mane. Di nav Kurdên Sûriyê de dest bi nivîsandina helbesta nûjen bûye. Kelandinek li ser pêmayên mîrê ronakbîran Celadet Bedir-Xan, Dr.Kamîran Bedir-Xan, Qedrî Can, Cegerxwîn, E. Namî, Osman Sebrî, Ehmedê şêx Salih û Tîrêj... heye. Hin xortên nûhatî bi şêweyên nûkirî, dixwazin dest bi hûnandina helbesta kurdî ya nûjen bikin. Di hin helbestan de çirîska hêviyê dibînim. Lê neyê hevotin ku helbesta nûjen cihê xwe li nav me girtiye û bûye mîna helbesta kilasîk, xwedî dibistaneke serbixwe. Tenê tiştê balkêş ev e: Reh û çavkaniyên helbestvaniya van kesan, yan ji çavkaniya helbestvanên Erebb, an ji helbestvanên biyanî yên ko helbesta nûjen nivîsandine, werdigrin û riya wan dişopînin. Mexabin, di bin bandûra peyrewî û hevenda vê diyardekê de mane. Hin jî hene bi zimanê biyanî (Erebî, Tirkî, û Farisî...td), diramin û bi kurdî dinivîsin. Helbestên wan bê sûde, bê fesal, bê serûber, xav, kerik û bê hawe ne. Helbestên wan giyanekî bê can, balayekî bê per û bask û sirûdeke bê awaz in. Rast e, merov nikare şîretan li helbestvanan bike. Lê merov wek xwêner

dikare nerîna xwe di helbestê de bide. Xwendina helbestê ji mirovekî ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwediyê (afrandekê) helbestê bixwe, piştî çend xwendinan, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sînora gotin û şorzaran de nayê bestîn, û ne jî tê hevragirtin. Ji ber ku ziman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweber de ezber bike. Divê têkiliyek giyanwerî di navbera xwendevan û helbestê (pirsur û pirsurî)yê de hebe. Helbest, ne diyardeyeke sekinî û bê liv e. Ne jî dîtaniyeke ekadîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî di cîhana peyv û şorzaran de digere, û jiyaneye sermedî ye. Di pêşketin û nûkirina raman, hizir, ziman, huner û civakê de roleke mezin dilîze. Helbest deryake ji evîna bê dorpêç û sînûr e. Bê rawestandî û miçiqandî, dizê û diherike.

Gelo helbestên we bûne stran, û kî ew gotine?

Belê, helbestên min gelek jê bûne stran. Gelek dengbêjan gotinên min gotine. Ji wan dengbêjên ko têne bîra min: Seîd Rêzanî, Elî Şingalî, Ronî can, Xêro Ebas, Seyid-Xan, Şewqî, Şêrzad Efrînî, Behai Şêxo û gelek komên folklorî jî helbestên min di cejna Newrozê de gotine.

Seydayê Dilawer hatiye xelat kirin?

-Belê, min ev xelat wergirtine:

-Di sala 1999-an de ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname)ê min wergirt.

-Di sala 2011-an de careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne hatim xelatkirin.

-Di sala 2012-an de, ji hêla komela Celadet Bedir-Xan ya çandeyî li bajarê Qamişlo hatim xelatkirin.

-Di sala 2013-an de, ji hêla komela Şawişka li bajarê Qamişlo hatim xelat kirin.

-Di sala 2013-an de, ji hêla Yekîtiya nivîskarên Hisiça hatim xelatkirin.

-Di sala 2013-an de, ji hêla komela Celadet Bedir-Xan ya fêrbûna zimanê kurdî li bajarê Dêrka Hemko hatim xelatkirin.

-Seyda bi zelalî ji me re li ser damezrandina Yekîtiya nivîskarên kurd li Sûriyê biaxive?

-Berî girêdana kongirê damezrandinê di (11-10-2013-an de-Qamişlo), danûstendinek di navbera Hevbenda nivîskar û rojnamevanan û di navbera Yekîtiya nivîskaran de hebû. Lê mexabin, wê danûstendinê bernedigirt. Berî çûna kongir bi du-sê mehan, herdû aliyên danûstendinê bi hev re ji min xwestin ku vê projeya yekîtiya nivîskaran li destê xwe bigerînim û bibim serî. Ez wek nivîskarekî bêlayan, bi xwîngermî min li xwe girt. Min hemû binema û helûmercê telezgehê daberçavan û mercê cêbecêkirina ezgeriya rêkeftinê pîva û bi bawerî destpêkir. Piştî çend rûniştinan ji alî min û herdû aliyên -Ji aliyê Yekîtiyê mamoste Mihemed Şêxo, Ibrahîm Xelîl û E.B.Alan, ji aliyê Hevbend mamoste Ehmed Heyder, Mehmûd Xelîl û Ferman Bocix- ve em gihan van encaman: Yekirina herdû rêbazan, avakirina komîteke amadekar ji bo girêdana kongirê damezrandinê û me bangê da ko em tev bi hev re diçin kongirekî yekbûyî. Lê mexabin, aliyê Hevbenda nivîskaran bixwe lihevketin. Tevlihevî di danûstendinê de di navbera hevalên wan bixwe yê dervî welêt û yê hundirê welêt de peyda bû. Di dawiya dawî de û piştî pir danûstendinan, Hevbend

ji ber vê projeyê xwe dan alî -di riya weşandina daxuyaniyekê re- û bi taybetî hevalên wan yê dervî welêt nekirin. Me dîsa gelek hewldan kirin, û me dixwest em bi hev re herin kongirê damezrandinê. Lê mexabin, ew daxwazên min neçûn serî. Tiştê baş ko pireya endamên Hevbenda nivîskar û rojnamevanan hatin kongir û li serserê wan komîta danûstendinê Dr.M.Xelîl û F.Bocix. Kongirê damezrandina yekîtiya nivîskarên kurd bi beşdariya - 144- endaman hate girêdan. Pireya nivîskarên herêma Cizîrê beşdar bûn. Kongir bi awayekî baş bi Kar û barê xwe rabû. Ez nabêjim tu kêmasiyên wê tunebûn, belê ev cara yekê ye helbet wê kêmasiyên wê hebin, pir şaşî, nakokî û ezezîtî jî derbasbûn. Lê, bi tevayî kongir di karê xwe de serkeftî bû. Komîta rêvebir ji 15 endaman hate hilbijartin. Mexabin û sed heyf e, ji ber rewşa awarte ya ko welatê me tê de derbas dibe, nivîskarên herêma Efrîn û Kobanê beşdar nebûn. Eger derfeta me lê hat, emê derbasî herêmên wan bibin û konfirasên wan girêdin.

-Çima Hevbenda Nivîskar û rojnamevanên kurd bi we re nehatin kongir?

- Wek min got pireya endamên wan hatin kongir û serserê wan komîta danûstendinê; Mamoste Ferman Bocix û mamoste Mehmûd Xelîl û pireya hevalên wan endamên Yekîtiya nivîskarên kurd in. Ew nivîskarên di hundirê welêt de dijîn û nehatin kongir pir hindik in. Ez bawerim wê nêzîk ne dûr ew jî bigihên rastiye û biryara xwe bidin. Me niha dest bi avakirina konfiransên şaxan kir, li herêma Cizîrê şeş-heft şax hatin lidarxistin: konfirans şax (Dirbêsiyê, Girkê Legê, Dêrika Hemko, Hesekê, Amûdê û Qamişlo....). Nivîskarên ko li dervî welêt dimînin, li gorî rêbaza me wê di konfiransê şaxên Ewropa, Emerîka, başûrê kurdistan û yê dewletên Erebestanê de beşdar bibin. Bêdiro, navenda Yekîtiya nivîskaran li hundirê welêt e.

-Çima ewqas şerê vê Yekîtiyê tê kirin, sedem çine?

- Em dezgeheke rewşenbîrî, sivîl û serbixwe ne. Em bi zelalî dibêjin: Biryar û pêşdestiya damez-randina yekîtiyê ji serê me nivîskaran bû, ne bi destê tu partiyên bû. Em wek Yekîtiya nivîskaran daxwaza endametiya xwe ji yek partiyê re pêşkêş nakin.

Helwesta me ji hemû partî, rêxistin û herdû encûmenan ev e ku em bi yek pîvanê têkilî û danûstendinê bi tevan re dikin. Rêzgirtinên me ji tevan re hene. Em xwe tevî karê wan nakin. Di nakokiyên partiyane de em ne alîgirê tu kesî ne. Lê, em xwedî dîtî û nerîn in, xwedî gotin in, ramyarî û rêbaza me kurdayetî, ne partîyê ye. Yekîtiya nivîskaran malê hemû nivîskaran e. Ji her kesî tê xwestin ku xwedî lê derkeve. Diyar e, ev biryara me ye serbixwe bela serê me ye. Em kurd hînî karê serbixwe nebûne. Ji narevîna me kurda ye ko karê konevanî û rewşenbîriyê li hev divarqilînin. Siyaseta hinekan ev e: -Eger Tu ne hevalê (Partiya) min bî, tu dijminê min î- Ji hêleke din ve pîreya nivîskarên me nesebixwe ne, yên serbixwe jî mêldariya hin partiyên dikin û erk û stûbariya xwe-wek nivîskar-jibîr dikin. Rola pêûsa xwe pûç dikin. Di vê rewşa bedbîn û telezgeh de, hin kesên bedkar, daxbar, têder û têkdanê pir in. Berjewendîya wan di diryana civakê de ye. Miriyên kesatiya xwe ne. Armanca wan xapor û çewsandina karê me ye. Lê, qet em guh nadin wan. Barê me giran e. Em ji karê xwe piştrast

in. Ez bawerim emê bi hebûna xwediyên pêûsên rastgo biserkevin.

-Çima ev Yekîtî nebû sêwana hemû nivîskaran?

-Wek min got gelek sedem hene; sedemin konevanî, partîtî, ezezîtî, kesayetî û bêber-pirsiyariyê û hin nivîskar jî hene ji ber erk û stûbariya xwe ya dîrokî direvin û xwe bêbar dibînin. Hinek ji wan nivîskaran heyranê navê xwe ne, ew beşdarî kongir jî bûn û encamên wê bînpêkirin; ji ber ko di hîlbijartinan de bi serneketin. Ew nivîskar pingirîn û zîzbûna wan ji ber berjewendiya kesatiya wan bû. Me tawan û raçavkirin. Lê, qet me bersiva wan neda û emê nedin. Bertekiya wan bi metoda vîlik, çenebaz û gefînan nadar dikin. Têperbûn û tawana wan bê çemek û sincî ye. Ez dilnîyam im ji arşîna hin nivîskarên xwedî nihad û rasteqîne ku, wê rê li ber çirçirî û zirzexeliyan bibirin. Bêperwa, em xwedî hêmin, asûde û aram in. Deriyê Yekîtiyê li ber her kesî vekirî ye. Di vê demê de, ji her demê pirtir em hewcedarên hev in. Rasteqîneya karê me dabîna serketina me ye. Di rojên bînan de her tişt diyar dibin.

-Tozika we ya hundirîn derket, li gor tozika derketî hûn dibin Serokê vê yekîtiyê?

-Belê, rast e. Min di dengdanê de dengê herî pir (89 deng) di kongir de wergirtin.

Wek hûn dizanin, li gorî biryara kongirê me komîtek ji bo lêveger û amadekirina rêbazê –Tozikê-hate saz kirin. Piştî du mehan ji danûs-tendinê ji aliyê komîtê ve rêbaz bi ser hev de hat û reha bû. Ji îro û pêde emê li gorî rêbazê karê xwe bikin. Rêbaza me cihê rêzgirtinê ye, û tu kes di ser rêbazê re nîn e. Me dest bi bikaranîna wê kir. Ji me tevan tê xwestin ku, em bi erênî li rêbaza xwe binêrin û rê li pêşiyê dûz bikin. Ev rêbaz hinkufê daber û cêbecêkirina biryar û rêkeftina Yekîtiya me ye.

-Li gor tozika we ya nû, me bihîst komîta birêvebir mercên endametiye ji ser wan çûne?

-Di serî de, endamên komîta birêvebir ji kongirê damezrandinê hatine hilbijartin. Wê endamên birêvebir bin heya kongirê bê. Li gorî rêbaza me, piştî salekê ji girêdana kongirê damezrandinê, kongirê yekê tê girêdan. Hin hene -li gorî rêbazê-

mercên endametiye wernegirin, ne ji mafê wan kesan e ko di kongirê bê de beşdar bibin. Ber-bijar li kongir beşdar nabin.

-Hûn bêdeng in, ragihandina we qels û lawaz e, hûn vê demê çi karî dikin û armanca we li pêş çiya?

-Wek hûn dizanin, di dîroka gelê Kurd li rojavayê Kurdistanê de, ev cara yekê ye ko /144/ nivîskarên kurd digihên hev û kongirekî giştî û berfireh dadimezrînin. Ji serî de, me dest pê kir, tiştêkî avakirî tune bû. Tenê çend nivîser li vir, li dera han, di bin navin wek (Hevbend, komele an Yekîti) hebûn, lê ne bi şêweyekî damezirandî di riya girêdana kongirekî berfireh ko karibin tevaya nivîseran bicivînin. Armanca me ya sereke guhdan û vejandina kultur, ziman, folklor û wêjeya kurdî ye. Di gavên pêşîn de xebat ji bo:

-Yekîtiya kar û xebata ji bo rewşenbîrî û wêjeya kurdî.

-Belavkirina afirandinên nivîskarên kurd û xwedîderketin li berhemên çapnebûyî.

-Arîkariya xebata parastin û pêşvebirina zimanê kurdî.

-Pêkanîna mehrecan û şevbuhêrkên rewşenbîrî.

-Guhdan li berhemên jinan û weşandina afirandinên wan.

-Guhdan li wêjeya mendalan.

-Çêkirina şevberk û raberiyên rewşenbîrî û hunerî.

-Weşandina kovarekê sê-mehane bi du zimanan (Kurdî-Erebî).

-Avakirina malperekê bi navê Yekîtiya Nivîskaran.

-Vejudandina karê şanogeriya kurdî.

-Pêşxistina karê ragiyandinê bi awayekî zanistî.

-Avakirina beşên lêkolîn û zanistiyê.

-Amadekirina pertûkên dibistanan ji bo zarokên Kurdan.

-Li gor ku gengeşa li ser vê yekîtiyê çêbû ye, hûn dikarin ta çi radewam û kar bikin?

Keko! Guhgiran be ji gengeşa nezanan (çiqçiq a şê vala ye), guhdar be li dengvedana karê Yekîtiyê.

Mirovê bê tore, nikare toreyê binivîsîne. Jiyana bê huner mîna dara bê ber e. tore, çavkaniya xwenaskirinê ye. Ew kes kî ne ?! Çi dixwazin... ?! Ji dêvla kê şerê me dikin?! Ji bo çi şerê me dikin...?! Armana wan çiye?!

Berdewamiya kar û xebata me ji ber vê jîweriyê hatiye; miletekî wek milletê kurd blindest, welatê wî di nav pênc dukelan de parvebûyî be, û her narevîna wî ne di destê wî de be. Ma gelo, rewşa wêje, ziman û dîroka wî wê di çi rewşê de be?! Bêdiro, wê hest, raman, bîr û zimanê wî di nav sînorên çêkirî de parvekirî bin. Lê, bandûr û dijawariya sînorên ko axa kurdistanê parvekir bin ne diwartir in ji nivîserên bedkar, bedraman, sîxur, bêbext, bêbar, bê erk û stubar û bêrasteqîne bin. Divê ew mejiyê gemar û bi qijnik tucarî nikaribe bibe bend li pêşiya yekbûna nivîserên kurd.

Em bi hêvî ne, ji hemû xwediyên pênivîsên azad û civatên rewşenbîrî li rojavayê Kurdistanê, bi bîr û bawerî û viyaneke xurt, bi hêz û bi şikodariya berevaniya pîroz, bi pênivîsên xwe, bi hizr û ramanên xwe, bi berhem û afirandinên xwe pirên têkilî û danûstendinên biratî di nav hev de ava bikin.

Û berjewendiya kesayetiye nedin pêşiya ya gelemperiyê. Pêwîst e, em li ser koka zanyariya Zerdeştê pêxember – Gotina xweş, karê baş û ramana paqij- berhem û afirandinan biweşînin.

Em wek Yekîtiya Nivîskarên kurd- Sûriyayê bi gyanekî biratî û bi erk û stubariya xwe ya dîrokî ji bo hemû têkilî û danûstendinan amade ne.

-Ji (144) endamên ku li kongirê we amade bûn, hûn dibînin ku çiqas ji wan nivîskarî?

Birastî, ez bi xwe pireya nivîskarên nûhatî nasnakim. Lê, nivîskarên bejinbilind di kongir de hebûn. Ez bawerim di rojên bîst de wê ew nivîskarên nûhatî baş cihê xwe bigrin û wê hêviya pêşerojê bin.

-Seydayê Dilawer, navê te û dîroka te di nivîsê de berz e, hûn poşman nebûne ku hûn bûn endamê vê yekîtiyê?

-Na, di jiyana xwe de, ez mirovekî çakbîn im, ne bêwexer im. Min tucarî karek nekiriye û paşiyê lê poşman bûme. Ez gavên xwe bi pîvanê dişopînim. Damezrandina Yekîtiya nivîserên kurd pêdiviyeke

dîrokî ye. Ji mêj de gerek tiştêk weha bûba, pir dereng maye. Derfeteke zêrîn bi dest me ketiye, divê em vê derfetê ji dest xwe bernedin. Ez ji dehê salan ve li hêviya Yekbûna nivîserên kurd bûm. Ev Yekîtiya nivîseran ji min re xewn bû, lê îro ew xewn bû rastî. Ezê bi hemû hêz û hinera xwe wê biparêzim, û ta ji min bê ezê karê wê pêşbixim. Yekîtiya nivîseran bi şêweyekî dezgehî wê karê xwe bike. Cihê her kesî di vê dezgehê de heye. Ji me tevan tê xwestin em berjewendiya Yekîtiya nivîsarên kurd bidin pêş. Û Spas ji we re.

Ehmed Bavê Alan.

Qamişlo 15.12.2013

**Hevpeyvîna Spûtnîk Kurdistan,
bi Serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-
Sûriyayê mamoste Dilawerê Zengî re**

Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriyeyê ya ku li gel sê rêxistinên din hewl da navbeynkariyê di navbera ENKSê û TEV-DEMê de bike, nivîskar Dilawerê Zengî ji Spûtnîk Kurdistanê re sedema nakokiyên, pêvajoya hewldanê û aliyên kêşe û bizavê vegotin.

Di vê dema dawî de rageştî û nakokiyên navbera ENKS û TEV-DEMê gelekî zêde bûne ku herdû alî hevdû tawanbar dikin û her yek ji wan aliyê din wek sedema kêşeyê nîşan dide. Li ser vê rewşê, di medyayê de hinek nûçe derketin ku çend sazî, rêxistin û komeleyên Rojavayê hewl didin navbeynkariyê bikin ta ku herdû aliyan li hev bînin.

"HEVBENDIYÊ EW PÊŞNIYAR KIRIBÛ"

Li gorî agahiyên ku Spûtnîk Kurdistanê bi dest xistine, ev bizav li ser pêşniyara Hevbendiya Niştimanî ya Kurdî li Sûriyeyê hatiye destpêkirin. Li

gel Hevbendiyê, Partiya Azadiya Kurdistanê, Encûmena Hoz û Êlên Kurdî û Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriyeyê ji bo lihevanîn û nêzîkkirina aliyên civînek li dar xistiye. Di encama vê civînê de, komîteyek ji nûnerên beşdaran, bi armanca dîtina (ENKS) û (TEV-DEM)ê hatiye avakirin.

Komîteya damezirandî pêşniyareke ji 4 xalan pêkhatî biriye ji ENKS û TEV-DEMê re. Ev xal wiha ne; yek, rawestandina ragihandina dijberî û dijayetiye, dudo, rawestandina pelamar, êrîş û zimandirêjiya li ser serdarên kurdan û destdirêjiya li ser alaya neteweyî ya kurdî, sisê, berdana hemû girtiyên siyasî yên ENKSê, çar, rawestandina xwepêşendanan û rêzgirtina rêdanên ku li herêma tîna birêxistin.

Roja Îniyê 9-12-2016an saet çarê êvarî li baregeha ENKSyê komîteya damezirandî bi ENKSê re civiya û bi awayekî fermî pêşdestiya xwe gihand wan. Herwiha roja 11-12-2016an saet çar û nîvê êvarî komîteya damezirandî bi awayekî fermî bi TEV-DEMê re jî rûnişt û xalên pêşdestiyê jê re rave û pêşkêş kirin.

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, Serokê Partiya Niştimanî ya Demokrat a Kurd li Sûriyeyê Tahir Sifûk, nûnerê ji Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyeyê li gel hinek endamên din ên herdû partiyên navborî di civînê de beşdar bûne.

Piştî hevdîtina bi herdû aliyan re, komîteyê daxuyaniyek weşand ku tê de encamên hevdîtînê bi erênî hatine nirxandin û wiha got: Di encama herdû rûniştinan de, me dilsozî û gotina xêrxwaziyê li bal herdû aliyan dît. Hêviya me ew e ku ev pêşdestî cihê xwe bigire û bibe bingeha çareserkirina kêşê û pirsgirêkên tevgera siyasî ya kurdî bi giştî. Çespondina vê pêşdestiyê rê li pêşiya xêrnexwazên gelê me tê birîn. Serkeftin ji doza gelê me ya dadmend re."

"HURMET JI TEVGERA SIYASÎ YA KURDÎ RE NEMAYE"

Spûtnîk Kurdistanê li ser vê mijarê bi endamê Yekitiya Nivîskarên Kurd-Sûriyeyê Nivîskarê kurd Dilawerê Zengî re axivî. Zengî diyar kir ku nakokî û şerê di nava tevgerên siyasî ya kurdî bi giştî û di navbera TEV-DEM û ENKSê de li ser medyayê ghişhtine ast û qonaxekê wiha ku êdî rêz û hurmet ji

ti tevgera siyasî re nayê girtin û rewşa pirsra kurdî bixwe jî ketiye metirsiyê.

Herwiha Dilawer diyar kir ku ev pêşniyara hewldana lihevanîna herdû aliyan ji aliyê Hevbendiya Niştimanî ya Kurdî li Sûriyeyê hatiye kirin û wiha pê de çû: "Me xwest wek Encûmena Eşîrên Kurdî, Yekîtiya Nivîskaran û Partiya Azadî ya Kurdistanê û Hevbendiya Niştimanî Kurdî li Sûriyeyê li hev rûnên û li ser vê meseleyê danûstendinê bikin. Piştî em rûniştin û me nîqaş kirin, em ghiştin encamekê ku divê em komîteyekê damezirînin ji bo navbeynkariyê di navbera herdû aliyan de bikin."

"JI BO LIHEVKIRINA ENKS Û TEV-DEMÊ ME 4 XAL PÊŞNIYAR KIRIN"

Zengî diyar dike ku armanca wan ji vê hewldanê ne çareserkirina hemû kêşe û nakokiyên navbera herdû aliyan e lê ew dixwazin ku ji hinek xalan re çareseriyê peyda bikin ku rewş hinekî aram bibe û wan xalan wiha diyar dike: "Xala sereke, rawestandina ragihandina dijayetiyê di navbera herdû aliyan de. Ya duduyan, rawestandina êrîşa li ser serok û rêberên kurdan û alaya kurdî. Ya sisiyan, divê ew girtiyên siyasî yên ji bo bîr û baweriyên xwe

hatine girtin bân berdan. Xala çaran, xwestina ku axiftin û gotinên giran nebin ta ku xelk pê tehrik nebin."

"HERÛ ALÎ JÎ ERÊNÎ BÛN"

Nivîskarê kurd diyar kir ku sê partiyen li ser navê ENKSê bi wan re civiyan û teqez kir ku bersiv û helwesta wan erênî bû û got, "ENKSê diyar kir ku tenê yek daxwaza wan heye û ew jî berdana girtiyên wan e."

Derbarê helwesta TEV-DEMê de jî, Zengî diyar kir ku helwesta TEV-DEMê jî erênî bû. Nivîskarê kurd eşkere kir ku wan xwestiye ku ti kes li Rojava ji ber fikir û nerînên xwe yên siyasî neyê girtin û diyar kir ku bersiva TEV-DEMê wiha bû: "Ew ê şerê ragihandinê yê dijayetiye dihewîne rawestînin. Ji bo xatirê girtiyan jî, wan diyar kir ku ew ê kesên girtî jî derxînin pêşberî dadgehan û wan gotiye, 'jixwe me gelek ji wan berdane jî û em ê alîkariyê jî bikin ji ber ne ji berjewndiyan kesekî ye ku ev nakokî hebin û em hewl bidin ku van nakokiyan çareser bikin!'"

"HINEK PARTÎ HENE, NAXWAZIN KÊŞE WERIN ÇARESERKIRIN"

Zengî dibêje ku çend sedemên sereke yên van nakokiyên hene û yek ji wan ew ku biryara tevgera siyasî ya rojavayê ne ji Qamişloyê ye lê ji aliyên din tê û wiha dibêje: "Bê diyalog pirsgerêk nayên çareser kirin. Divê em li ser maseyê rûnên û çareser bikin. Divê biryara me ji destê me be. Divê biryara me ji Qamişloyê be. Di baweriya min de, heta biryara me wek tevgera siyasî ne li bajarê Qamişloyê be, ew ê her nakokî hebin û çareser kirina wê jî dê gelekî dijwar be."

Herwiha nivîskarê kurd diyar dike ku hinek partî hene qet naxwazin ev nakokî bînin çareser kirin û wiha dibêje: "Sedema vê helwestê ew e ku naxwazin tevgerên siyasî nêzîkî hev bibin, ji ber ew ê sedema hebûna wan ji holê rabe û ew ji wan nakokiyên hebûnekê ji xwe re bi dest dixin. Ew miriyên berjewndiyên kesayitîya xwe û partiya xwe ne. Heta em karê partîtiyê bikin, em ê ticarî negihêjin ti encaman. Divê em karê kurdayetiyê bikin."

"CUDABÛNA NERÎNA WAN JI BO ÇARESERIYA PIRSA SÛRIYÊ"

Zengî li bingeh û jêdera nakokiyên navbera ENKSê û TEV-DEMê de bi van gotinan rave dike: “(Sedem) nexwendina wan a rast ji rewşa Sûriyeyê re. Her aliyekî ji wan çareserîya pîrsa Sûriyeyê bi awayekî cuda dît. Ya duduyan, girêdanên wan ên derveyî ne. Anku mihwerên Kurdistanê(aliyên din ên Kurdistanî), a sisiyan, heta roja îro jî ti tevgera siyasî ya kurdan nebûye xwedan biryareke serbixwe”.

Hêjayî gotinê ye ku ENKS û TEV-DEM berî niha sê caran bi serperîştîya Herêma Kurdistanê û serokê wê Mesûd Barzanî ku dudo ji wan li Hewlêrê bûn û ya dawî li Duhokê bû. Di yaw dawî de herdû aliyan peymanî Duhokê îmze kiribû û wan biryar dabû ku têxin meriyetê û li gorî wê Rojava bê birêvebirin. Piştî wê ew peyman nehatibû sepandin û her aliyekî yê din tawanbar kiribû ku ew sedema nesebandina peymanê ye.

HEVPEYÎVÎN bi NIVÎSKAR û HELBESTVANÊ NAVDAR Dilawerê ZENGÎ re

Ebdurehîmê Mûşî

Wek tê zanîn, Dilawerê Zengî bi salan e ku di warê wêjeya Kurdî de ji me ra xizmeteke payedar dimeşîne. Her wiha kedkar û Nivîskarekî Malpera me ye jî. Zengî heya roja îroyîn bi Helbest, Gotar û Lêkolînên xwe di gelek Kovar, Rojname û Malperan de kedeke giranbiha daye. Ew bi gelek Rêberên kurdan re jî geriyaye. Her wiha karê Rojnamegeriyê jî kiriye. Her çiqas Zengî, derfet nedîtibe ku Zanîngeh û Zankoyê bixwîne, wî jî wek min xwe di Dibistana Jiyana û Vejinê de perwerde kiriye. Lewre, ji gelek Rewşenbîran jî sûde wergirtiye. Ji ber vê yekê ez dikarim pir bi hêsanî bêjim ku rêzdar Zengî ji piraniya kurdan re mînakek bêhempa ye. Bi taybetî di warê Helbestvaniyê de, ew stêrkeke giranbiha û Rewşenbîrekî pir hêja ye. Helbestvanek pîspor û şareza ye. Sipas ji Xwedê re ku wî ji dayîk û bavê welatparêz daye. Lewra ez wek Nivîskar, Dengbêj û Helbestvanekî kurd dikarim pir bi hêsanî bêjim ku Zengî emrê xwe daye vê xizmeta giranbiha. Bila

Xwedê Te'ala si'eta sax û emrê dirêj bide Destbirakê min ê qedirşînas û serbilind. Zengî di dilê min de hêja ye wek heyva li ser gund. Ronî dike tariyê, ew mîna çira û find. Bêguman Dilawer bi fikr û ramana xwe ya Ronakbîrî, riya gel dike ronahî. Lewma ez dibêm, bila her bijî vê Fikr û Ramana Kurd û Kurdewarî. Ka werin em bi hevra guh bidin şîreta Dilawerê ZENGÎ:

BÎLBÎL

Min silava Mîr hil da
Li Mûşî bêhna gul da
Silav li civaka Mîr

Hezkirina di dil da

Silava min li Bilbil
Bi bêhna reyhan û gul
Bilbilê Welatê min
Te pêtek berdaye dil

Ji MALPERA: www.serhed.org / Ebdurehîmê Mûşî

Pirsiyar: Keko Tu li kîjan bajarî û di kîjan salê de dehatiye dinya yê?

Bersiv: Ez, li parêzgeha Hisiça bajarê Amûdê, di sala 1961-ê de hatime dinê.

P: Keko Navê bav û dayîka we çiyê, hûn ji kîjan Eşîrê ne, her wiha hûn ji kîjan herêma welat mişextî Binxetê bûne, tu dikarî ji me ra bi berfirehî behsa Malbata xwe ya Welatparêz bikî?

B: Belê. Navê bavên min, Îsmailê Muhemedê 'Emê ye, navê diya min Ferîde keça Eliyê Heskê yê Xanîsorî ye. Em bi xwe, ji xelkê Kurdistana Bakur in, ji qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik, û ji eşîra Dumiliya ne. Li herêma me, Eşîra Dumiliya gelek bavik in: „Ji wan; Mala Miqdad, mala Haco, mala Cindo, mala Mîro, mala Zengî, mala Nebo, mala Muhemedê Fetah, mala Çilqeda, mala Diho û hwd. Bapîrê me yê pêşî Miqdadê Haco ye, li gundê Soyê dima, û bapîrê min Muhemedê Emê jî li gundê Qewmik dima. Gundê Qewmik, Sîrsê û Zeviya Sor yên Zenga ne. Em bi xwe Dumillî ji mala Zengî ne. Di dema şerê Dewleta Osmanî û Qeyser de, û ji ber sedemên ramyarî yên wê demê, bapîrê min

(Mihemedê ‘Emê) bi tevî malbata xwe ji gundê xwe derdikeve. Bi rê de, çemê Mezin tê pêşiya kerwên. Kerwan li çem dide, dapîra min Xedîce xanim xwenga Miqdadê Bapîr bû, di ava çemê mezin Dîcle de diçe û têde difetise. Û li gundekî ji gundên Wêranşehrê bapîrê min Mihemedê ‘Emê pir dirêj emir nake ew jî dimire. Lawên wî (Bavê min Îsma’îlê Mihemedê ‘Emê -neh salî- û birayê xwe yê biçûk ‘Emê -heft salî) „Mişextî Binxetê” dibin, û li bajarê Amûdê bi cî û war dibin.

P: Ezbenî te kîjan Dibistanan xwendiyê?

B: Min, Xwendina xwe ya seretayî û ya navîn li bajarê Amûdê xwend. Lê, mixabin ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê, min xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê, min xwe ji xwendina pirtûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir.

P: Çi mînakek baş. Keko Xwedê emrê dirêj, saeta sax bide cenabê te, tu niha çend saliyê, tu kengê Zewicî, Xwedê ji te ra bihele, çend zarokên te hene?

B: Spas ji te re. Ez niha derbasî sala pêncî û yekê bûme. Di sala 1985-an de min jin anîye. Sê lawê min hene, bi navê; Royar (1985), Rodî (1986) û Ronî (1990), û qîzek min a bi navê Rewan jî (1995) heye. Ez lawê sêyemîn bûm ji bavê xwe re. Birayê min Ferhan yê mezin bû, Muhemed yê navîn bû û ez yê biçûk bûm. Birayekî min î din jî hebû, ew di Şewata Sînema Amûdê de şewitî û çû ber dilovaniya Xwedê. Wek nas e ko, Sînema Amûdê di 13.11.1960-î de hatiye şewitandin. Li dora 300 zaroyên Kurd tê de şewitîn. Diya min „Ferîde Elî” li dora deh (10) zarokên Kurd ji nav wî agirê Sînema Amûdê xelas kiribûn. Lewra, jê re dibêjin: „ Diya Şehîdan”.

Maşelah Çi navekî xweş, Xwedê hemûyan Efû bike. Birastî şewata Sînema Amûdê dilsotîne-reke mezin e pir xemgîn e.

P: Mamoste Dilawerê ZENGÎ, kengê dest bi Nivîsandina Helbesta Kurdî kir? Gelo tê bîra te Helbesta ku te berê ewil nivîsand? Ew Helbest kîjan e gelo?

B: Di sala 1977-an de, min dest bi nivîsandina helbestanê kir. Ez li ber destê: „Dayîkeke Welatparêz û Bavekî Miletperwer mezin bûm”. Evê diyê

(Ferîde Elî) akameke (bandûreke) pir mezin li jiyana min ya nivîskarî û ramyarî kiriye. Gelek cefakêşî û dijwarî ji bo min, di vê riyê de jî kişandiye. Bandora Şêxê welatparêz û milet-perwer (Şêx Sedredînê Bavê Kal-dostê bavê min bû) pir li min hebû, û li ber destê wî pirtir fêrî nivîsandin û xwendina Kurdî bûme, û bi alîkariya wî min helbestvanê gewre Cegerxwînê nemir û Seydayê Tîrêj jî nas kirin. Helbesta pêşî ko min nivîsand bi navê „Ey Felek” bû. Ta bi vê rojê jî min nedaye belavkirin. Sedemê ne belavkirina wê helbestê jî ev bû; Ez di rewşeke pir dijwar û xizan re derbas dibûm. Min bi çavekî pir tarî li dinyayê dimeyzand. Lewra min navê helbesta xwe kiribû Ey Felek. Birastî, felek li serê min digeriya û ez xortekî şazdeh (16) salî bûm. Barê xizanî û dijwariya gerînoka demê ne hêsan bû. Mala felekê ne ava be.

P: Te heya niha çend Pirtûkên xwe Çapkirine. Tu dikarî navê wan Pirtûkên xwe ji me ra destnîşan bikî. Her wiha hinek jî behsa Rewşenbîriya xwe bikî?

B: Min heya niha pir Gotar, Lêkolîn û Helbest di kovar, rojname û malperên „Kurdî û Erebi” de dane belavkirin. Ji bilî nivîsandin, lêkolîn û helbestan, min

karê rojnamevaniyê jî kiriye. Min di gelek kovar û rojnameyên Kurdî û Erebî de nivîsandiye, ji wan: (Gelawêj-Sûriye), (Gurzek gul-Sûriye), (Pirs-Sûriye), (el-Hîwar-Sûriye), (Newroz- Sûriye), (Hêvî- Parîs), (Kurmancî- Parîs) (Armanc- Siwêd), (Medya Guneş-Stenbol), (Xebat- Erbîl), (Metîn-Dihok), (Birayetî-Dihok), (el-Itîhad-Silêmanî), (Mîdya- Erbîl), (Gulan-Erbîl), (Serxwebûn- Erbîl) (Rojda-Libnan) (Jîn-Sûriya) (Zevî-Sûriya) û hwd. Ez di hin redaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dikim. Di tevahiya malperên Kurdî de berhemên min têne belavkirin. Û malperê min jî heye. Min gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yê navdar ji tîpên Erebî veguhestine Latînî û pêşgotin ji wan re nivîsine, ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî. Û pertûka wî; Serpêhatiya Kurdan û Mewlûda Kurdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)... Min piştgiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê, û yê malbata wê de kiriye. Mîna pirtûka: (Bîranînên Salih Bedir-Xan, Name bo Mustafa Kemal Paşa, Mîr Bedir-Xan û Bîranînên jinekê û hwd). Li dora (250) pirtûkên kurdî yê nivîskaran li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê min dane weşandin.

Pirtûkên min yên çapkirî di nav wergerandin, amadekirin û afirandinê de, li dor bist û heft (27) Pertûkan min çapkirine. Hin ji wan jî ev in:

★ Dîwana (Pêdarî) helbest 1985. -Gramêra Ziman - Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko-wergerandin 1990. (Bi alîkariya hin mamosteyan). -Ji Mesela Kurdistanê- Celadet Bedir-Xan. Wergerandin 1990. - Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Ji Evîna Çirayên kevin) veguhestina tîpan 1991. -Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Li Xelkê Tehlê li Min Şirînê)- veguhestina tîpan 1991. -Mîr Bedir-Xan: Lutfî, wergerandina: E.S.Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ - Şerefnameya Menzûm-Cegerxwîn- ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirin 1997. - Bîranînên Celadet Bedir-Xan -komkirin û wergerandin bo zimanê Kurdî. -Ez û Agir- Dîwana helbestvan Hizrevan- veguhestina tîpan, 1998. - Stran, Berf û Baran -helbestvan Mûeyid Teyib wergerandina tîpan. -Bedirxanî di Cezîra Botan de- Malmîsanij-wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ 1998. -Qeble Bizûx ElQemer -çîrok-wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebi. Nivîsandina Dilawerê Zengî- Ji

weşanên Mîdiya-Erbîl 2001. -Qedrî Can, Helbest, Gotar, Çîrok û wergerandin, amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001. -Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Erebî 2001. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. -Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Kurdî 2005 Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. -Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî- komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî 2005. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. -Dîroka Kelepora Mîrnişîniya Botan. -Mele Xelefê Bafî. -Veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî 2005. Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral. -Qedrî Can, Helbest, Gotar, Çîrok û wergerandin, amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Stenbol 2004. /Mixabin çapkirineke pir lawaz e. -Qedrî Can, Helbest, Gotar, Çîrok û wergerandin. - Amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana Emîral, Beyrût, Libnan 2005. - Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî-Komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî 2005. Stenbol, weşanxaneya Pêrî, 2005.-Wesenon Lilişq -Dîwanek ji Helbestan-wegerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî ye bo zimanê Erebî. Weşandina Dar Kîwan e -Şam 2005. - Mewlûda Pêxember -Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirin: Dilawerê Zengî. Beyrût-Libnan.

Çapxana Emîral 2006. -Serpêhatiyên Kurdan -Tîrêj-veguhestina tîpan û pêşkêşkirin: Dilawerê Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral 2009. -Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat), Dilawerê Zengî, Perçê 1+2, Beyrût, Libnan. Çapxana Emîral 2009 -Etyaf El-Madî, Dilawerê Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral 2009. -Bînahî- (Gotar, Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), Dilawerê Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneyê Emîral 2010. -Bîranînên Celadet Bedir-Xan. Komkirin û veguhestin: Dilawerê Zengî. Bi du zimanan: Kurdî û Erebbî. Çapxana: Emîral. Beyrût, Libnan. Çapa: duyemîn. 2010". Lê hîna Çend Pirtûkên neçapkirî jî mane.

P: Maşelah. Te heya niha çend carî Xelat wergitine û tu ji aliyê kîjan Saziyan ve liyaqî van Xelatan hatî dîtîn?

B: Ez du caran hatime xelat kirin. Cara pêşîn di sala 1999-an de, û cara dawîn jî di sala 2011-an de bû. Herdu car jî ji aliyê rojnameya Medya ya partiya /YNDK/, ko li Kurdistana başûr li Hewlêrê tê weşandin.

P: Te kîjan Helbestvanên Me yê Navdar nazkir û dît?

B: Min gelek helbestvanên kurd yê navdar naskirin û têkiliyên min bi wan re hebûn, û hene. Ji wan: „Mamosteyê min û ronakbîrê gewre, mamoste Osman Sebrî, Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mele Nûriyê Hesarî, Mele Ehmedê Palo, Seydayê Keleş, Hesên Hişyar Serdî, helbestvan Yûsifê Berazî (Bêbuhar), helbestvan Ehmedê Şêx Salih, Helbestvan Mumemed Elî Heso û Umerê Elê û hwd”. Li başûr jî ez gelek helbestvanan nas dikim û min ew dîtine. Ji wan: „Ebdulrehmanê Muzûrî, Şêrgo Bêkes, Mihsin Qoçanî, Necîb Balayî, Ferîd Zamdar, û hwd”. Bi rastî têkiliyên min bi pireya helbestvanên kurd li her çar perçeyên Kurdistanê re hene, lê mixabin di vê lez û bezê de navê tevan nayê bîra min, bibûrîn.

P: Tu herî pir kîjan Helbestvanên Kurd rind dicibîne?

Zengî: Dara evîna tevan şîn e. Bi hezar berê rengereng xemilandî ne. Lê, heger berê darê tehl nebî şêrînî û sipehîbûnê jî nadin. Şîrîniya gulê bi dîtin û şîravê xweş e. Lê ya xweştir ew e, ko bilbilekî şeyda helbestvan bi deh hawan bixwîne û pesnê xeml û xêza gulê bide. Heger tu axaftineke bê sûde, lavijeke bê awaz, sazike bê dûzan bî, tucarî tuyê

nikaribî dilê gulê bidestxwekî; gulê dilkoçer e. Ango yê ko helbesteke xweş bide min, ezê wî bipejirînim”.

Mûşî:

Yê ku nizanibe Qedrê Gulê wele ew xayîn e
Li Kurdistan her roj matem, şîn û ayîn e
Belê te xweş gotî bi vê kelama şêrîn
Erê bira ez çi bikim, felek bi me ra xayîn e

Gula me maye bitenê di nava pencê neyara
Bi bombeyên Napalmê lêdixin wan zalim û
xwînxwara

Gur û keftar û roviyan dor pêçane li Gulê
Dinya bi mera xayîn e, nayê hewar ji dost û yara!
Her bijî bersiva te pir xweş bû bi zarê Helbestvan
Lê li ber newa Bilûra Serhedê dema lêdixin Şivan
Dilê min peritî Dilawer li vî welatê xerîb
Lê bi îzna Xwedê emê Welat Rizgarkin ji destê
hovan.

**P: Tu zêde di bin bandora kîjan Helbestvanî de
maye. Her wiha tu kîjan Helbestvanî ji xwe ra
mamoste dibîne?**

B: Ez di bin baskê seydayê xwe Tîrêj de fêrî
hûnandina helbestê bûme. Tîrêj jî, di bin baskê

helbesta Cegerxwîn de berz û mezin bûye. Em tev, di derya Cezîrî û Xanî de hevotî melevaniyê bûne, hînî perwaze û firê bûne. Vêca, her yek li gorî siwariya xwe, li gorî xurtî û hunera xwe, di meydana helbesta Kurdî de siwar e.

P: Heya niha çend Helbestvanên Kurd Helbest diyarî te kirine?

B: Helbestvanên ko helbestên xwe diyarî min kirine ev in: Seydayê Tîrêj, Ehmedê Şêx Salih, Yûsifê Berazî (Bêbuhar), Ebdurehîmê Mûşî û Ehmed Mustefa ne. Lê, gelek ronakbîr û rewşenbîrên Kurd bi nivîskî hestên xwe di nivîs û xebata min de diyar kirine, ji wan: „Profesor Cemal Nebez, Profesor Merûf Xeznedar, Xefûr Mexmûrî, Dr. Cewad Mele, Rewşen Bedixan, Mele Nûrîyê Hesarî, Şêx Tewfîqê Huseynî, Dr. Ehmed Mehmûd Xelîl, Îzedîn Elî Mele, Sînim Bedirxan, Ebdulreqîb Yûsifê Zivingî, Mehmed Uzun, Nezîr Cezmatî û hwd”.

P: Tu Siyaseta Partî û Saziyên me kurdan çawa dinirxînî. Dema ku tu bi çavên Rewşenbîrî lê mêzebikî, gelo tu çi kêmasiyan di siyaseta kurdan de dibînî?

B: Piştî şerê cîhanê yê yekemîn Kurdan dest bi avakirina civat, komele û rêxistinên rewşenbîrî, civakî û siyasî kirin. Ev dezgeh, civat û rêxistin roleke pir mezin di geşkirina hestê neteweyî û hişyarkirina gelê Kurd de lîstin. Lê, li gorî mercên îroyîn rewşa rêxistin û tevgerên me Kurdan çî ye û çî dikin?!

Berî her tiştî partî çine û ji bo çî têne avakirin?! Partî bixwe wesîle ye, ne akam e. Ji komêk merovên bîrbir û zana di hizr û bîr û baweriyên xwe de mîna hev diramin ava dibe, li hev dicivin, û tozîk û rêbazan ji kar û barê xwe re datînin, û ji bo pêkanîna armancên gelê xwe dixebitin. Armanca dawî û pêşî ji hebûna partî û rêxistinên, di civaka Kurdî de, ji bo bidestxistina mafên milletê Kurd e. Ji bo kurdayetiyê ye. Çî di warê siyasî û çî di warê rewşenbîriyê de be. „Mixabin, rewşa tevgera Kurdî dûrî van erk û stûbaran e”. Ez nabêjim hemû partî, û ne ez şerê hebûna wan dikim, lê belê, pireya van partiyan, reng e, mercê çêbûna xwe wînda kirine. Bê nakokî û dijayetî nikarin bijîn. Perwerdekirina endamên xwe jî li ser van sincan dikin; yê ne hevalê min be dijminê min e. Rewşa tevgera me gihaye wê rewşê ku hejmara partiyên me ji hejmara tiliyên herdu destan pirtir bûye. Lê, hejmara Siyasetmedarên me ji

hejmara partiyên me bi gelekî kêmtir e. Partîzanên me bûne dahol û zirne ji wan kesên ko ji bo şexsê xwe dixebitin. Ew kes miriyê şexsê xwe ne. Ne ku miriyên Kurdayetî û azadiyê ne. Em herêmî diramin û berjewendiyên xwe diparêzin.

Partî bixwe wesîlek e ji bo tu pê bigihê akama xwe, mîna ko tu li kerê siwar bibî û bi vê wesîlê bighê cihekî. Lê, heger ew ker li te siwar be, û ji dêvla wî tu bizirî û tîzka bidî..., Mixabin eva malwêranî bixwe ye. Ji ber rewşa ko em tê de, em Kurd ne hejmarek in di lîska siyaseta herêmî de. Mixabin rejîmên serdest bi me dilîzin, û em bûne goga ber şega wan.

P: Ji bo Azadiya Welat çi banga we li Siyasetmedar û Gelê kurd heye. Her wiha ji bo Yekîtiya Gelê Kurd hûn dixwazin ji gelê me ra çi bibêjin?

B: Li gorî rewşa guhertinên cîhan û herêmê, diyar e, derfet û dem dema dest bi guhertina sînorên herêmê hatiye. Bêdiro! Hêdîhêdî ew siyaseta diyar dibe. Miletên herêmê jî serî li hember rejîmên sitemkar û zordar radikînan û wan hildiweşînin. Ev dem dema azadî û serbestiya gelan e. Divê û giring e, em Kurd wek netewe biamin, û dest bi tevger û

xebata xwe bikin. „Maf û daxwazên xwe wek netewe bixwazin”. Em, ne Tirk, Erebi û Faris in. Ji bo em vê derfetê ji dest xwe bernedin, divê em yek bin. Li her perçeyekî ji perçên Kurdistanê yekîtiya xwe ava bikin, û piştgiriya perçên dî bin. „Em ne destik û dûvik bin ji dijminê xwe re”. Em hevûdu tune nekin, û ji bo berjewendîya xwe destê xwe dirêjî mala hevûdu nekin, û ked û xebata hev talan nekin. Riya rizgarkirina Amedê di ser laşê kurdên binxetê re derbas nabe!!!. „Tu carî dijmin nabin dost”. Ji bo pirsê kurdî dijminên me tev yekin. Ji bo kurdan alozî û berberîtiya xwe jibîrê dikin. Daxwaza tevan tenê Kurd negihên armanca xwe, Kurd nebin xwedî dewlet. Li dîroka xwe veşerî û bixwînî, kê xîzî bi mafê mîletê Kurd re kiriye?!. Kê welatê me Kurdistan dagîr kiriye?!. „Di roja îro de, û ji her rojê pirtir zanebûn û kurdîyê ji siyasî û rêberî me tê xwestin”. Çareserîkirina pirsê Kurdî bi yekbûn û yekîtiyê ye. Ma hûn guhê xwe ji gemara salan paqîj nakin û dengê zengilê hişyarî û banga azadî û yekîtiyê, ya bavê neteweya Kurd Ehmedê Xanî guhdarî nakin û nabihîzin?!

**P: Ezbenî Tu Pêşeroja me Kurdan çawa dibîne?
Ango çi talûkeyên mezin li pêşîya me kurda hene?**

B: Wek min got, ev dem dema pirsâ Kurdî ye. Demeke pir nazik e. Berjewendiya dinyayê bi Kurdan ve çêbûye. Baweriya min ew e ko nîrê demê û berjewendiya dewletên mezin, di dinyayê de, wê Kurdistanê çêbikin. Lê, tirsâ mezin ew e ko bi destê Kurdan ew Kurdistan hilweşe. Derfet û nîrê demê xweş hatiye. Eger ev dem derbas bibe û em sûde û qezencê jê wernegirin, di baweriya min de çû pêncî salên dî. Dijwar e dem û rewşên weha di demên nêz de bi dest me ve bîn. Lê, ez dipirsim: „Em Kurd dikarin sûde ji vî nîrê werbigrin?! Em dikarin nakokî, dûvetî û peyetiya xwe jibîr bikin, û bi rastî û duristî Kurd bin, û ji bo Kurd û Kurdistanê bixebitin?!“

P: Mixabin her ku diçe li Sûriyê zilma zaliman li ser milletê mezlûm diwartir dibe. Lê li gel vê zilmê jî êdî em rind dibînin ku tu şansê Rejîma Sûriyê nîne ku êdî li ser Text bimîne. Gelo, Kurdên me yên herêma rojava wê bikaribin ji bo Azadiya Rojavayê Kurdistan Azadiya xwe bidest bixînin?

B: Ez jî xwediyê wê baweriyê me ko tu rê li pêşiya rejîma setemkar û xwînmij nemaye. „Ev rejîm zû, dereng wê bingor bibe“. Ev dem dema azadî û serbestiyê ye, ne dema kuştin, talan û hovîtiyê ye.

Mixabin, tevgera Kurdî li rojavayê Kurdistanê jî ne yek in. Heta niho tu projeyên zelal ji bo pêşerojê nîn in. Lê, baweriya min pir bi xortên ciwan yê xwediyê van çalakiyên hêja ko dirabin heye. Ez bawerim, di bin bandora wan de wê hin kar û xebatên hêja bên kirin. Di demek nêz de, Encûmena Niştimanî Kurdî lidar xistin. Li dora yazdeh (11) partî û çend tevgerên xortên ciwan tê de kom bûn. Hîn çend partî û çend tevgerên xortan li dervî vê encûmenê mane. Lê, rewşa tevgera Kurdî roj bi roj baştir dibe. Ez bawerim, ji hêlekê, tevan giringî û pêwîstiya yekîtiya tevgerê nas kirine, ji hêleke din ve, tundî û diwariya rejîmê, setemkarî û hovîtiya wê, roj bi roj, hêdîhêdî Kurdan digihîne hev. Ez, ji kurdan re dibêjim, ew dema berê, dema sitem û bindestîyê êdî nema. Bê guman, Rojên bên rojên serbestî û azadiya gelê Kurd in. Rojên çareserîya pirsê gelê Kurd in.

P: Ezbenî dibe ku hinek pirsên ku min nepirsî bin, tu bixwaze bîne ziman mabin. Tu dixwazî di dawiyê de ji me ra çi bibêjî?

B: Ez pir spasiya we dikim, û pîroziya xebata we ya hêja dikim. Malpera we: „serhed.org” pir dewlemend e, cihê pesn û şanaziyê ye. Birastî, malpera we

gencîneyeke pir bi nirx û buha ye. Ez bawerim, ew jî ji ber parastin û xwedîkirina kes, endam û rêveberên wê ye. „Mirovên qenc, karên qenc dikin”. Mala we sed carî ava be û her pêşketinê ji we re dixwazim.

Tu her hebî Keko, mala te jî ava be. Ji bo ku te dema xwe ya giranbiha ji me ra veqetand, û ev Hevpeyvîna payedar bi me re çêkir, ez gelek spasiya Destbirakê xwe yê Navdar dikim, Xwedê Te'ala emrê dirêj û saeta sax bide cenabê te, tu her serfiraz û serkeftî be înzêlah. Her wiha ev nirxandina te ya erênî ji bo min xelat û serbilindiya herî mezin e, wê min bixîret û bihêztir bike û di warê pêşketina rewşenbîrî de jî riya min ronî bike. Mamoste bi îzna Xwedê û piştgirî û du'ayê rewşenbîrên wek cenabê te, înzêlah emê bikaribin di pêşerojê de vê Malpera: „Wêje, Çand û Hunera Kurdî di warê Neteweyî de bikin Dibistana Vejînê û Azadiya Zimanê Kurmancî”.

Şam, 05.01.2012

HEVPEYVÎN, MALPERA: www.serhed.org -

Ebdurehîmê Mûşîdengbej@hotmail.de

Hevpeyvîn bi Nivîskar

Dilawerê Zengî re

Hevpeyvîn: Demhat Dêrikî

W: Mamoset ji salên heftiyan were cenabê we di nava cîhana nivîskartiyê de ye. Li ser deşta vê cîhanê we cotkir, tov reşand, berhem wergirt û hêjî ev lebat, kar û bizava we berdewam e. Gelo, ji encama van salan, hûn dikarin (bi kurtî be jî) behsa rewşa wêjeyê li rojavayê kurdistanê bikin, yan jî, piştî şerê cîhanê yê duyemîn û heta îro wêje li rojava di çend qonaxan re derbas bû?

B: Di nerîna min de, di serî de, qonaxa yekemîn ji piştî rawestandina tevger û şoreşên kurdî û damezrandina civata Xoybûnê dest pê dike. Ev qonax qonaxeke pir hêja û giring e. koka dîroka wêje û rewşenbîriya Kurdî li rojavayê Kurdistanê ji vê dîrokê dest pê dike. Hêjaye em hinekî li ser vê qonaxê rawestin.

Di 5-ê çiriya pêşîn sala 1927-an de, civata Xoybûnê li Bihemdûnê- Libnanê hat damezran-din. Di wê demê

de, Sûriyê di bin sîdariya Firensîzan de bû. Ew penaberên ko li Şamê civiya bûn û bi çek ne ghiştibûn armanca xwe, ji xebata xwe bêhêvî nebûn. Dest avêtin pêûsê û bi xebata li ser ziman, folklor û wêjeya Kurdî dest pê kirin.

Tevger û xebata pêşî bi destê Bedirxaniyan hate kirin û li ser serê wan mîrê ronakbîran, rêber û pêşengê hêja, zimanzanê yekta Celadet Alî Bedixan (1893-1951).

Di roja 15-ê Gulanê, sala 1932-an de, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan hejimara pêşî ji kovara Hawarê derxist. Pê re alfabeya xwe ya Latînî û çend pertûkên li ser zimên di bin navê weşanên kitêbxana Hawarê(1932-1943) de belavkir. Di riya kovara Hawarê re çend navin gewre di gasîna toreya Kurdî de hatin naskirin. Ji wan navdaran Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Hesên Hîşyar, Ehmedê Namî, Cegerxwîn û Kamîran Bedirxan....hd. Ev qonax bi van ronakbîran û bi berhemên wan hate naskirin.

Ev qonax qonaxa hişyariya hest û ramana neteweyî ya rizgarkirina Kurd û Kurdistanê bû. Berhemên hêja di warê dîrok, ziman û toreya Kurdî de da afirandin. Folklorê Kurdî ji qonaxa devîkî derbasî qonaxa nivîskî kirin. Folklorê Kurdî ji windabûnê rizgarkirin. Raman, hizir û bîrweriya mirovî di koda Hawarê de meyndin. Zaravayê Kurdmancî hem ji mirinê riha kirin, hem jî rewan û canekî nû danê.

Di 1-ê Nîsana 1942-an de, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan hejmara pêşî ji kovara Ronahî belav kir. Ewê Kovarê nûçe û salixdanên şerê cîhanê yê didiwan bi wêne, digel gelek nivîsên hêja di warê folklor, tore û rewşenbîriya Kurdî de belav dikirin. Em dikarin bibêjin herdu kovar (HAWAR û RONAHI) Qur'ana zimanê Kurdî ne.

Hêjayî gotinê ye, ko ev qonaxa dîrokî bi qonaxa Bedirxaniyan bê binavkirin. Ji ber ne tenê xebata wan di ber çand û toreya Kurdî de cihê serbilindî û şanaziyê ye. Belê, di geşkirina hestê neteweyî de rol û bandoreke pirî mezin di civaka Kurdî de lîsitiye. Tîrêjên vê akamê bi xurtî li raman, hizir û jiyana civakî ya Kurdan kir.

Di vê demê de, li Libnanê nivîskar û zimanzan Dr. Kamîran Bedir-Xan (1895-1978) kovara /Roja Nû/(1943-1946) û rojnama /Stêr/ derdixist. Ev berhem li nav Kurdên rojava dihatin belavkirin.

Di sala 1932-an de, li şarê Hisiçayê Komela (Civata Arîkariyê ji Bona Belengazên Kurd li Cizîrê) hate damezrandin. Evê Komelê armanc û sedemê çêbûna xwe di kovara (Hawar)ê de, hejmara:2 ya ko di 1-Hizêranê 1932-an de hatiye weşandin, dide diyarkirin.

Li bajarê Şamê xortên Taxa Kurdan "Nadî Henano" damezrandin. Gelek xortên Kurd li dorê dicivyan. Xebata wan geşkirina hestê neteweyî û hînkirina zimanê Kurdî bû.

Di sala 1939-an de, li bajarê Şamê li taxa Kurdan komela (Yekîtiya Xortan) damezrandin. Lê, evê Komelê pir dirêj nekir, li ser destê nivîskarê Navdar Osman Sebrî û Nûredîn Zaza navê xwe guhertin, navê (Nadî Kurdistan) li xwe kirin.

Di nîva salên sihî de li bajarê Amûdê (Nadî Ciwan Kurd -Amûde) hate damezirandin.

Tiştê balkêş di van tevgeran de ew e ku ramanin nû bi xwe re anîne meydanê; Bi milletê Kurd dane zanîn ko, bi zimanê Kurdî jî dikarin zarokên xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin. Baweriyeke nû afirandin, û dane zanîn ko xortên nû dikarin têkilî tevgerên rêzaniya welatê xwe bibin, dûrtir binêrin.

Di sala 1937-an de, "Civata Azadî û Yekîtiya Kurdan" hate damezrandin. Piştî ko Sûriyê ji bin destê sîdariya Frensayê rizgar bû û qedera gelê xwe bi dest xwe xist, alîkarî û piştgiriya Kurdan ji xwe re jibîr kir. Hemû civat û libatên Kurdan hatine qedexekirin. Girtin, binçavkirin û setemkarî ma para mirovên welatperwer. Ziman, tore, çand û çapemeniya Kurdî jî qedexe kirin.

Di sala 1951-ê de, li parêzgeha Helebê (Komela Rewşenbîrî) hate damezirandin.

Di sala 1953-an de, Edîb Şîşeklî, Sûriya xist bin rejîmeke leşkerî, û bû serokomarê welêt. Bi hatina leşkeran zoreke mezin ket ser welat û gelê Sûriyê.

Di sala 1953-an de 'Civata Yekîtiya Xortên Demokrat ên Kurd li Sûriyê' hate damezirandin.

Ji xebatên Civatê yên herî giring, xebata di ber çand û xwendina Kurdî de bû.

Di sala 1955-an de, li bajarê Şamê, li mala nivîskar Osman Sebrî komela (Vejîna Çanda Kurdî) (Encûmen) hate damezirandin.

Di sala 1956an de, li bajarê Helebê Komela (Zanistî û Alîkariya Kurd) hate damezirandin.

Evê Komelê mîna yên berî xwe, xwendina zimanê Kurdî kiribû barê xwe, û çend pertûkên hêja dan çapkirin û belavkirin.

Di sala 1957-an de, Partiya Azadî li bajarê Qamişlo hate avakirin.

Di 14-ê hezêrana sala 1957-an de, partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê hate damezirandin. Qonaxeke nû di civaka Kurdên binxetê de dest pê kir. Belavokek bi navê /Dengê Kurd/ bi zimanê Kurdî derxistin. Lê, mexabin piştî hejmara sisiyan bi zimanê Erebî derket. Osman sebrî di wê navê de çend pirtûk û elfabeya Kurdî belav kirin.

Rewşa Sûriyê ji sala 1954- 1958-an, û berî yekîtiya di navbera herdu hikûmetên Sûriyê û Misrê de çêbibe, gelê Sûriyê di bin siya hikûmeteke niştimanî û perlemanî de, jiyaneke hinek xweştir di warê siyasî, civakî û wekhevîyê de dijiya. Lê, dîsa jî gelê kurd ji hemî mafên xwe bê par bû.

Qonaxa diwemîn piştî damezirandina Partiya Demokrat sala 1957-an, dest pê dike. Rewşa gelê kurd ya jeopolîtîkî û dabeşbûna wan,

kiriye ku rewşa toreya Kurdî bi giştî wekî rewşa ramiyarî û civakî be.

Di civaka her miletekî de, pêwîst e rêxistin û dezgeh bêne avakirin. Bêdiro! dibin siya rejîmên setemkar û zordar de jiyan ne azad û ne serbest e. Lê neyê wê wateyê ko, li hemberî vê rewşa heyî em bêçare bimînin.

Belê, giring e ko em dezgehên civakî û rewşenbîriyê ava bikinda em riya xebatê ji nifşên pêşe-rojê re dûz bikin. Lê, mexabin piştî dameziran-dina Partî, ewan jî tu liv û kar ji bo rewşenbîriya Kurdî nekirin. Pirtir karê wan rewşa siyastî û siyasetvaniyê bû. Tenê di wê demê de kovara Agahî bi destê Hesên Hîşyar bi hejmarin hindik derket. Ev rewş weha bêdeng dimîne ta bi dawiya salên şêstan. Belê, ji bilî çend berhemên Osman Sebrî û dîwanên Cegerxwîn tu berhemên balkêş nehatin meydanê. Di wê demê de, bi destê helbestvanê gewre Cegerxwîn, kovara Gulistan, ew jî bi hejmarin pir hindik derdikeve. Dîsa rewşa wêjeya Kurdî bêdeng dimîne ta dawiya salên heftiyên kovara Gelawêj derdikeve, û di dawiya salên heştiyên kovara Stêr û wehareng e çend kovarên din derketin. Ev qonax bi lawazî xwe dihingêve sala 1985an .

Ji sala heştê û pêncan û bi vir de, qonaxa siyemîn dest pê dike. Di vê qonaxê de, çapemeniya Kurdî ji bilî kovar û rojnameyan, bi dehan pertûkên kurdî di warê ziman, helbest, folklor, şano, roman û dîrokê

de hatin weşandin. Lê, mexabin ev tevger û bizava rewşenbîriya Kurdî ne di rîya karê hevbeş, xwedî dezgeh, civat û komele û rêxistinan bû. Pirtir bi destê hin nivîskar û pirtûkfiroşan dihate kirin. Hêjayî gotinê ye ko, di vê qonaxê de berhemên ko dihatin belavkirin du beş bûn; beşek jê kovar û belavokên siyasî yên partiyan bûn, û beşê dî serbixwe bûn. Bi derketina van berheman, tevger û bizaveke wêjeyî pir hêja peyda bû û bandoreke bi encam li civaka kurdî kir. Kesayetiyeke wêjeyî ji bo Kurdên rojava avabû. Rewşenbîrin xwedî nav û nîşan di gasîna wêjeya Kurdî de peyda bûn. Ev xaka beyar ko bi tovê /Celadet, Dr.Kamîran, Rewşen Bedir-Xan, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Tîrêj, Bêbuhar, Namî, Hesên Hîşyar, Nûriyê Hesarî, Ehmedê Palo, Keleş, Ehmedê Şêx Salih û....hd./ hatibû çandin, di roja îro de berê xwe wergirt.

Li hêla din, ta bi vê rojê, hikûmeta Sûriyê, ji bo rewşenbîriya Kurdî tu gavên li pêş ne avêtine, ne jî rêdaye ko dezgeh, civat û komeleyên Kurdî bi şêweyekî fermî bêne avakirin. Siyaseteke şovînî, çewt û xerab li hember Kurdan dajo. Siyaseta Erebkirinê berdewam e. Xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî, çapkirina pertûkan, kovar û rojnameyên Kurdî qedexe ye. Lê, dîsa xêra xwedê ye ko mirovin hene di kar û xebata xwe de berdewam in û di bin bask û ûştê van nîran de berhemên xwe belav dikin.

Rola kesatiyên wek; Celadet Bedir-Xan, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj...di van qonaxan de çi bû û bingehek çawa li rojava danîn?

Hebûna mirovekî ji binemaleke mîretî û xwedî rewşenbîriyeke bêhempa û hemdemî, û xwedî kedeke pak û bejneke bilind ez bawerim wê roleke xurt û bi encam li civata kurdên rojava bike. Mirovê gewre xwedî rol û bandoreke gewre ye. Bi xwendevanê xwe re rastgo û xwedî hestekî nazik û pir sade bû. Bi erk û berpirsiyarî li rewş û awayê kar û xebat, ziman û wêje, serhawe û berhawên Kurdî dimeyzand. Hostê çêkirina peyva nûjen bû. Xwedî ferheng û azîn bû. Xebata vî ronakbîrî pir berfireh û berçav bû; rehên xwe bera civaka Kurdî dabûn. Ji hêlekê de, bûbû mak û dibistaneke serbixwe ji hemû rewşenbîr û nivîskaran re, û ji hêleke din ve, ramana neteweyî, zanîn û hişyarî di nav gelê xwe de dida belavkirin. Mirovekî ne heyranê kesatiya xwe bû; ji tinebûna nivîskaran di bin gelek navan de berhemên xwe di kovara "Hawar"ê de belav dikirin. Wêjeyeke hemdemî û nûxwazî afirand. Zimanekî wêjeyî avakir. Sermiyanê wêjeya nûkirî bû. Di nav civata Kurdî de, xwedî rûmet bû. Xwedî navekî pîroz bû. Bi saya serê wî kurda navên Kurdî li zarokên xwe dikirin. Bi cîhanê û bi herkesî da zanîn ko, Kurd neteweyekî

xwedî ziman, dîrok û xak e. Xwedî şaristaniyeke dewlemend û di dîrokê de kevnar e.

Nûredîn Zaza xortê herî biçûk ko di kovara Hawarê de nivisand. Digel Qedrî Can, bi xurtî guh da nivîsandina çîroka Kurdî û li giringiya wergerandinê bo dewlemendiya zimanê Kurdî zû haybû. N.Zaza mîna Çexovê Kurdan hate binavkirin. Li gorî çaxê xwe xortekî hemdem û modern bû. Xwedî ked û bizaveke çandî berbiçav bû. Bandorek wî xurt li kurdên Şamê hebû. Çend civat û komele lidar xistin û damezrênerê Partî yê pêşî bû. Xebata wî dihat wê yekê ko em Kurd dikarin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Pênûsa wî pir bi hostayî û zanebûn dihate bikaranîn. Zimanê wêjeyê pir rewanbêj û sade û xweş bû.

Seydayê Cegerxwîn yekemîn helbestvanê Kurd e ko nav û dengê wî li herçar percên Kurdistanê belev bûbû. Helbestên wî li ser zar û zimanê her kesî dihate gotin. Ez bawer nakim ko helbestvanekî din mîna Cegerxwîn xwedî vê akam û rolê di nav kurdan de hebe. Helbestên Cegerxwîn û Tîrêj roleke mezin di geşkirina hestê neteweyî û hişyariya Kurdan de lîstin. Mexabin, di wê demê de, zimanê Kurdî pir bêqîmet bû. Guhdan û qîmeta zimanê Kurdî nebû. Ne herkes bîra Kurdayetiyê dibir. Bi saya van ronakbîran, bi bizav û tevgera wan, hezkirina Kurdayetiyê kete dilê gelê Kurd de. Ew mejiyê kevnepereşt û tevna gemara salan ji ser û guhê gelê

xwe paqij kirin. Herdû helbestvan /Cegerxwîn û Tîrêj/ xwedî û siwarê helbesta Kurdî ya resen in. Helbesta Kurdî ji peyrewtiya helbesta Erebi rizgarkirin. Di bin baskên van herdû bazan de, gelek xortên nûhatî fêrî perwaze û firê bûn. Fêrî hûnandina helbesta Kurdî bûn. Rê û şop li pêşiya helbesta nûjen dûzkin. Bûne bingehe û bihnokek di navbera herdû qonaxan de, qonaxa helbesta Kilaşîk û ya nûjen. Di roja îro de bi dehan xortên kurdan helbesta nûjen dinivîsin. Eger ew bingehe nebûna me nikarîbû helbesta nûjen ava kirba. Ez bawerim her afirandek palvanê encama ramana mirovên berî xwe ye.

Mamoste, wek hûn jî baş dizanin wêje pir şaxên (Helbest, Dastan, Çîrok, Roman...) xwe hene û di dîroka wêjeyê de, wêje karî bandora xwe li civakan bike, gelo di nava van salan ev li rojava çawa bû?

Wêje mîna hemû heyîn û hebûnên mirovatîyê ye. Tegez afirîna mirov e. Azîna û rêzaniya xwe ji kêrhatîya jiyana werdigre, û hunerên wêjeyê haydar in, bi can û bi rewan in. Li tevna sawêr, hest, sewdan û ramanên mirov ve divarqilin û lê dihingivin. Çi karê wêjeyê be bi nivîsîna gotinê dest pê dibe, û xêzik û rêzikan jiber dike. Karê wêjeyê hunermandan hînî afirîn û afirandinê bike; bê çawa ji karê xwe hunereke bêhempa û ferzende bihûne... wêje razek

ji razên qeşengî û sipehîbûna hunermendê xwedî berhem e.

Di dema Kevin de, wêjeya devkî di bîr, hizir û ramanên mirov de cih digirt. Di roja îroyîn de, û bi saya van ronakbîran, bi xurtî di gasîna cîhana nivîskî de cih girtiye, û nema tirs ji windabûn û berzebûnê heye. Berî hertişî ûştê zimanê nivîsînê pêwîst e. Eger ev ûşt peydabû wê gavê bi wî zimanî wê bikaribe ahîn û kulên xwe, ahing û fîxanên hundirê xwe pê bîne ziman, hingê ew hunermend, nivîskar û wêjevan dikare hunera xwe ya nivîskarî ji xwendevanê xwe re diyar ke. Bêdiro, wê gavê bi dîtîna û nerînên nivîskar rol û bandûra wî li civakê diyar dibe. Çiqas ew nivîskar xwedî rol û bandûr be, ewqasî berpisiyariya wî di civakê de mezin e. Divê çekê wêjevan peyva rastgo, xweşik û spehî be ya ko bi wê şêwe, naverok, nerîn û dîtîna xwe bigihîne rewanê xwendevan. Wêje zanîn û nasîn e. Şaxek ji şaxên gulistana huneran e. Bi ziman û gotinan ava dibe. Belê ziman wêjeyê dike huner mîna deng û awazan mûsîqa çêdike û dike huner, weha rengereng hunera wêne û tabloyan çêdike. Bêguman wêje yek ji hunerên qeşengiyê ye.

Dîroka wêjeyê bi dîroka zanîn û têgihiştina mirov ve girêdayî ye.

Pêşketina miltan bi pêşveçûna wêjeya wan ve girêdayî ye. Bêdiro, wêje çekek ji bo guhertina civakan, çêkirina miovan û rewşa civatê ye.

Wekî me gotî: wêje di qûnaxa yekemîn de bi dewlemendî kete çerxê. Lê qûnaxa siyemîn yek ji sedî ji qûnaxa yekemîn pêşde navêtiye. Ew jî gelek ûştê û sedemên wê hene. Di baweriya min de, ûştê rasterast siyaset û rewşa gelê Kurd e. Lê, ji alî wêjeyê ve, di qûnaxa siyemîn de para helbestê pir ber bi çav bû li hemberî kêmbûna çîrokan û tunebûna roman û dastanan; ev jî kêmasî û seqetkirina rol û bandûra wan dide xuyakirin.

Di nava vê pêvajoyê (ji sala 1977 heta sala 2010) de mamoste Dilawer Zengî xwe çawa dibînê, anko we çikir, we çi dixwest bikin, xewn û aşopên we çi bûn, çi pêk hat û çi na?

Berî her tiştî, ez xwe sûbayekî(melevanekî) nûhatî di derya zanîn û rewşenbîriyê de dibînim. Tu sînor ji kar û xebatê re nîn in. Ta ez hebim û li gorî karîna xwe, ezê xwe xemxur û pasevanê wêje û rewşenbîriya Kurdî bibînim. Di qonaxa xebata sih û sêsalîya min de, ta bi vê rojê, min di nav berhemên xwe (afirandin, wergerandin, komkirin û amadekirinê) de li dora bîst û heft /27/ pertûkan çapkiriye. Ji bilî wan; Bi alîkariya min li dora du sed pertûkên nivîskar û helbestvanan hatine çapkirin.

Min pênc pertûkên seydayê Tîrêj; Xelat, Zozan, Cûdî, Serpêhatiyên Kurdan- beşê didiwan û Mewlûda Kurdmançî pêşgotin ji wan re nivîsand û ji tîpên Erebi veguhestin tîpên Latîni û çapkirin.

Ez xwe bextewer dibînim ko bi destê min sê pertûkên Mîreka Kurdan Rewşen Bedir-Xan hatin çapkirin û belavkirin; /Bîranên min -Salih Bedir-Xan. Name bo Mistefa Kemal Paşa -Celadet Bedir-Xan û Bîranînên jinekê-perçê didiwan-/.

Min dîwana pêşî ya seydayê Bêbuhar /Zindan/ pêşgotin jê re nivîsand û çapkir.

Bi dehan xelekên fêrkirina zimanê Kurdî li bajarê Şamê min lidar xistin û gelek keç û xortên kurdan hînî zimanê Kurdî kirin û min /Rêzname/- yek amadekir ji bo her şagirtekî ko qursa ziman xelas bike werbigre. Bi dehan min semînerên rewşenbîrî li herêmên Kurdî û li başûrî Kurdis-tanê lidar xistine. Ez yek ji endamên komîta xelata Osman Sebrî me. Ez rolek mezin di danasîna pîrsa Kurdî û rewşenbîriya wê di nav rewşenbîr û ronakbîrên Ereba de lîstîm, nemaze piştî wergerandina hin pirtûk û babetên giring li ser wêje, folklor û rewşenbîriya kurdî belavkir..

Tiştê min dixwest bibe û nebû eve; yek jê avakirina makek rewşenbîrî ko rewşenbîr û nivîskarên me di riya dezgeh û civatan re kar û xebata xwe bikin. Min û seydayê Tîrêj û helbestvan Mihemed Eliyê Heso û hin biraderin din xebat di ber vê daxwazê de kir, lê neçû serî. Sedemên sereke ko nehiştin ev kar here serî dixokî û çavnebariya hin nivîskaran bû. Bê çawa heşt çapxane li Şamê (ko pertûkên Kurdî bi dizî çapdikirin) bi destê wan kesan hatin girtin û

ezyeteke pir mezin gihand xwediyên wan çapxanan û gihand me weha, li pêşiya vî pirojeyî jî sekinîn û beravêtî kir. Mexabin îro jî li ser rûyê malperên Kurdî xwe dikin lehengên wêjeya Kurdî û rasterast vir û bêbextiyan jî dikin.

Ya din vekirina weşanxaneyek Kurdî. Lê, sed heyf, me nikarîbû ev herdû gav pêkbanya. Wek me gotî sedemên wê gelek in. Kul û derdên me pir in.

Jibo wêjeya kurdî, berhemên wêjeya kurdî di nava wêjeya cîhanî de cih bigirê, pêdiviya zaraveyek yekgirtî heye, lê heta îro em êşa wê dikişînin, ev êş wê çawa were dermankirin, çareserî çî ye û her yek dibêjê dengê deholê min xweştir e?

Berî hertiştî, ji ber rewşa me ya awarte di warê perçebûna Kurdistanê de ji hêlekê ve, ji hêleke din, ji ber rewşa kurdî ya siyasî û civakî em dûrî wêjeya cîhanî ne. Lê, ji bo pêdiviya zaraveyekî yekgirtî, birastî ez jî xwediyê vê nerînê me ko divê û pêwîst e zaraveyekî wêjeyî yekgirtî hebe. Di bawerîya min de, çareserkirina wê ne di riya partî û siyasethvanan re ye. Lê, di riya danûs-tendina zimanzan û kadroyên ziman re, li gorî Zanyarî Kurd çareser dibe.. Ango divê biryar di destê zimanzanan de be, ne karê siyasethvana ye. Lê sed heyf û mexabin biryar biryara siyasethê ye. Dahol dahola dijayetî û nakokî û

berberîtiya navxwe ye. Ev jî dûrî karê zanistî û ziman
û zanîne ye.

**Jibo we navên; Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, xak û
ziman tèn çî wateyê?**

Ehmedê Xanî: Bavê ramana neteweya Kurd e.

Melayê Cizîrî: Teqez Mîrê helbesta Kurdî ye.

Xak û ziman: Hebûn û nebûna me ye.

**Mamoste Dilawer niha bi çive mijûle, çî karî dike,
gelo berhemine nû hene?**

Min xwe ji nivîsandinê re vala kiriye. Çend karên
hêja li ber destê min hene ez dixwazim wan bi dawî
bînim. Ew jî di warê wêjeya Kurdî de ne. Lê, ne bi
awayekî kilasîk. Belê, bi şêweyekî nû û hemdemî ne.
Pertûkek jî li ser dîroka Botan bi belgeyên dîrokî û bi
agahiyên nû cara yekemîn e ko têne belavkirin. Ev
belge min ji gera xwe ya li Pertûkxaneyên Ewropa û
Turkiyê peyda kirin. Ji hêleke din ve çend pertûkên
wergerandî ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi li ber
destê min hene. Lê, sed heyf û mexabin, ji ber rewşa
çap û belavkirinê heta neha nehatine çapkirin û
belavkirin.

Kurtejiñenîgariya Dilawerê ZENGÎ:

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistanê Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Qeyser de, û ji ber sedemên ramyarî yên wê demê kalkê wî (Mihemedê 'Emê) tevî malbata xwe ji gundê xwe derdikevin û berî didin biniya xetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê 'Emê dimre. Lawên wî (Isma'îlê Mihemedê 'Emê û birayê xwe Mihemed) meşextî binya xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

*Dilawerê Zengî, piştî şewata Sînema Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê, xwe ji xwendina pertûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir .

*Di sala 1977an de, û li Amûdê bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, di wê salê de dest bi nivîsandina helbestan dike.

*Li ber destê diyeke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Ev ê diyê (Ferîde Elî) akameke (bandoreke) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike. Gelek cefakêşî û dijwarî ji bo wî, di vê riyê de, jî kişandiye.

*Bandora Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe, û li ser destê wî dest bi nivîsandina Kurdî dike.

*Du salan li gundê (Girê Sor) mamosteyî dike.

*Di sala 1980-an de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zankoya Şamê kar dike. Piştî heşt salan wî dûrî kar dixin. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin û lêkolîn û xebatê re vala dike.

*Di warê ramyariyê de jî keda wî gelek heye.*Di sala 1987-an de Rewşen Bedir-Xan nas dike.

*Piştigiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pertûkên wê û yên malbata wê de kir. (Bîranînên Salih Bedir-Xan. Name bo Mustafa Kemal Paşa. Mîr Bedir-Xan. Û....hwd)

*Di sala 1991-ê de, piştî serîhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî girêdide.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Ji bilî nivîsandin, lêkolîn û helbestan, karê rojnamevaniyê jî dike.

Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye û dinivîsîne, ji wan: (Gelawêj), (Gurzek gul), (Pirs), (el-Hîwar), (Newroz), (Hêvî, Parîs), (Kurmancî, Parîs) (Armanc, Siwêd), (Medya gunes, Istenbûl), (Xebat,Erbîl), (Metîn, Dihok), (Birayetî, Dihok), (el-Itîhad, Silêmani-yê), (Mîdya, Erbîl), (Gulan, Erbîl) û

(Serxwebûn, Erbîl) (Rojda, Libnan) (Jîn, Sûriya) (Zevî, Sûriya)...h.d.

*Di pireya malperên Kurdî de berhemên xwe bi herdû zimanan /Kurdî- Erebi/ belavdike.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yê navdar ji tîpên Erebi wergerandiye Latîni û pêşgotin ji wan re nivîsiye; ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)... li dora (200) pertûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê daye weşandin.

*Di sala 1985an de jin aniye. Sê kur û keçek wî hene: (Royar, Rodî, Ronî û Rewan).

*Di sala 1999 an de ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di 12/7/2000 de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe bajara Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. Ismaîl Beşikçi dike.

*Di sala 2004an li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metran.

* Di sala 2008an li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir Elfedil.

Berhemên Dilawerê ZENGÎ yê çapkirî ev in:

*Dîwana (**Pêdarî**) helbest 1985.

***Gramêra Ziman-Celadet Bedir-Xan** û Rojê Lîsko-wergerandin-1990.(bi arîkariya hin mamo-steyan).

***Ji Mesela Kurdistanê-Celadet Bedir-Xan-wergerandin-1990.**

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Ji evîna çirayên kevin) wergerandina tîpan 1991.

* Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Li xelkî tehlê li min şirînê)- wergerandina tîpan 1991.

***Mîr Bedir-Xan:** Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ.

*Alîkariya Rewşen Bedir-Xan kir di weşandina hin pertûkan de, ji wan:

-Bîranînên min -Salih Bedir-Xan.

-Name bo Mistefa kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan).

-Bîranînên Jinekê (perçê didiwan).

***Şerefnameya Menzûm-Cegerxwîn**-ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirin, 1997.

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan**-komkirin û wergerandin bo zimanê Kurdî.

***Ez û Agir-** Dîwana helbestvan Hizrevan-veguhestina tîpan 1998.

***Stran, berf û baran** -helbestvan Mûeyid Teyib veguhestina tîpan.

***Bedirxanî di Cezîra Botan de-Malmîsanij-**wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ, 1998.

***Berî heyv hilê** -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebi. Nivîsandina Dilawerê Zengî- Ji weşanên Mîdiya-Erbîl, 2001.

***Qedrî Can- helbest. Gotar, Çîrok û wergerandin.**- amadekirin û berhevkin. Bi zimanê (Erebî), çapxana Aras, Hewlêr 2001.

***Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Erebi- 2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

* **Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

***Şerrên Sasûnê** -Osman Sebrî- komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan, çapxana Emîral.

***Dîroka kelepura Mîrnişîniya Botan.** –Mele Xelefê Bafî-veguhestina tîpan. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût- Libnan, çapxana Emîral.

***Qedrî Can -helbest, Gotar, Çîrok û wergerandin.**- amadekirin û berhevkin. Bi zimanê (Kurdî), çapxana komal, Istenbol-2004.

***Qedrî Can- helbest, Gotar, Çîrok û wergerandin.**- amadekirin û berhevkin. Bi zimanê (Kurdî), çapxana Emîral, Beyrût- Libnan. 2005.

* **Şerrên Sasûnê** -Osman Sebrî, komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Istenbol, weşanxaneya Pêrî, 2005.

* **وثن للعشق** dîwanek ji helbestan- wegerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî ye. Weşandina Dar-Kîwan e-Şam-2005.

* **Mewlûda Pêxember** –Tîrêj- veguheştina tîpan û pêşkêşkirina: Dilawerê Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxaneyaya Emîral. 2006.

* **Serpêhatiyên Kurdan**-Tîrêj- veguheştina tîpan û pêşkêşkirina: Dilawerê Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxaneyaya Emîral.2009.

* **Muxtaran** (Lîqaat we Hîwarat), Dilawerê Zengî, Perçê 1+2, Beyrût-Libnan. Çapxaneyaya Emîral.2009.

* **Etyaf El-Madî**, Dilawerê Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxaneyaya Emîral.2009.

* **Bînahî**- (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), Dilawerê Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneyaya Emîral 2010.

* **Bîranînên Celadet Bedir-Xan**- komkirin û Amadekirin bi du zimanan Kurdî û Erebî. Beyrût-Libnan, 2010. Çapxana Emîral.

Hevpeyvîna Malpera Tîrêj

bi Dilawerê Zengî re

Hevpeyvîn: Şûro

1-Di destpêkê de em bi navê Malpera Tîrêj bixêr hatina te dikin û hêvîdarin ko tu xwe bi xwendevanê me bidî naskirin.

* Em bixwe ji xelkên şêrwanê, ji hoza Dumila ne. Bavê min Isma`îlê `Emê û birayê xwe Muhemedê `Emê, piştî şerê Cîhanê yê yekemîn meşextî binxetê dibin. Li bajarê Amûdê bi cihûwar dibin.

Piştî şewata Sînema Amûdê bi salekê, ango di sala 1961ê de, ez li wir hatime dinê. Ez li ser bîna şewata zarokên Amûdê mezin bûm. Min ji şîrê wê diya ko zarokeke xwe di nav agirê Sînemê de winda kir, û yê din heta niha jî êşa wê şewatê dikêşîne, vexwar. Ez bi şîrê êş û kovanan û li ber dengê lorandina kul û derdan mezin bûm.

Diya min Ferîde li dora deh zarokên bê guneh ji nav devê agirê Sînemê riha kir. pîrejineke welatparêz û milletperwer bû. Ew welatparêziya wê ji kurdayetiya bavê min dihat. Li mala me tim û tim şevbuhêrk dihatin kirin. Ew şevbuhêrk ji çend kalemêrên mîna bavê min, digeriya. Şevbiwêrkên xwe tev li ser rewşa gelê kurd û welatê Kurdsitanê derbas dikirin, û pir daxivîn..., û diketin danûstendinên germ.... te digot wê niha Kurdistan çêbibe... Ew rewş û xirûcir tev di serê min de diçûn û dihatin. Lê min tu bersiv ji wan re nedidît û him min nizanibû çî pirs e.

Bi demê re, û hin bi hin li ser hin girêkên pirsên ko di serê min de cih girtibûn û diçûn û dihatin vebûm, ew jî dema têkçûna şoreşa Berzaniyê nemir bû. Ez di malek weha de mezin bûm.

Min xwendina xwe ya sereta û ya navîn li bajarê Amûdê kuta kir. Lê mexabin, piştî mirina bavê min û ji ber ûştî rewşa abûrî min xwendina xwe nebir serî. Piştî mirina bavê min di sala 1977-an de, barê malê kete ser milê min û xwiya malê ji min hat xwestin.

Xwedîkirina pîra dê û birayê nesax ketin stiwê min. Rewşa me ya abûrî pir tenik bû. Ji bêçarî min berê xwe da kar.

Di salên 1980-1981-ê de, min du salan mamosteyî li gundê Girê Sor kir.

Di sala 1982an de, ji ber karê ranyarî min dûrî karê mamosteyî xistin û di wê salê de, ji neçarî min berê xwe da bajarê Şamê, ta niha li wir dimînim. Min xwe ji nivîsandin, belavkirin û çapkirina wêjeya Kurdî re vala kiriye.

2-Te çilo dest bi nivîsandinê kir.. û berhema te ya pêşîn çibû û te çewa lê meyzand piştî ko tewa bû?.

*Di sala 1977-an de, û piştî mirina bavê min têkiliya min bi helbestnivîsa Kurdî re çêbû. Ew jî di riya Şêx Sedredînê Huseynî re bû. Şêx Sedredîn mirovekî pir welatparêz û zana bû. Ez hînî nivîsandin û xwendina zimanê Kurdî kirim, û min bi seydayê Cegerxwîn û seydayê Tîrêj da naskirin. Pir ji min hez

dikir. Gelek caran pirtûk û belavokên Kurdî ji min re tanîn û herdem rewşa gelê Kurd bi min dida zanîn.

Ji wê rojê de, min dest bi hûnandina helbesta Kurdî kir. Helbesta pêşîn bi navê (Ey felek) bû, û ta bi vê rojê, min ew helbest nedaye belavkirin. Nebelavkirina wê jî ji ber taybetiyên naveroka wê ye, ne tu tiştên dî ne.

Di sala 1978-an de, min seydayê Tîrêj naskir. Seydayê Tîrêj gelekî arîkariya min kir û bandûra wî pir di awayê hûnandina helbestê de, li min heyê.

Di sala 1982-an de, û piştî ko ez hatim bajarê Şamê, naskirina min bi xebatkarê mezin û mamosteyê wêjeya Kurdî Osman Sebrî (Apo) re, çêbû. Osman Sebrî berê pênûsa min ber bi nivîsandina serbest (pexşane) vekir, û ez hînî giramêra Kurdmancî kirim. Birastî hêjayî gotinê ye, ko mala nemir O.Sebrî mîna dibistana zimanê Kurdî bû. Em gelek xortên nûhatî lê dicivyan û em hînî

zimên dikirin. Ji wê rojê de, bi giranî min berê xwe da nivîsandina serbest.

Di sala 1985an de, berhemê min yê pêşîn dîwanek ji helbestan bi navê (Pêdarî) bû. Nivîsandina pêşgotina dîwanê ya seydayê nemir Tîrêj bû. Di wê demê de, ev berhem pir bandûreke xurt li nifşên nû kir û di riya wê dîwanê re gelek kesên nexwendî hînî zimanê Kurdmancî bûn. Ev dîwan, bû sedemê şikandina wê bêdengiya ko weşan û çapemeniya Kurdî tê de dijiya. Du hezar hejmar ji vê dîwanê hatin belavkirin. Li gorî rewşa awarte ya ko gelê Kurd tê de dijiya, hejmareke ne kêr e. Li gorî wê demê, ez dibêjim pêwîst bû ko ew berhem bihata çapkirin. Ji ber ko ewê dîwanê, deriyê çapkirin, belavkirin û guhdanê li berhemên bi zimanê Kurdî vekir. Lewra, pir dirêj nekir, du-sê dîwan hatin çapkirin û dest bi qûnaxeke nû ji çapemeniya Kurdî bû.

3-Dilawerê Zengî nivîskar e, yan helbestvan e, yan lêkolînavan e û yan hersê ye? Û çima?

* Wek min got, serpêhatiya min ya pêşîn di gasîna wêjeya Kurdî de, hûnandina helbestê bû. Lê çima ..? birastî ez jî nizanim çima.. diyar e, helbest mêvaneke bê wext e. Tu nikarî biryarê bidî û bibêjî ezê niha helbestekê binivîsim. Helbest, ne diyardeyeke sekinî û bê liv e. Ne jî dîtaniyeke ekadîmî ye. Liv û guhêzeke hundirî ye, di cîhana peyv û şorezaran de, digere. Jiyanê sermedî ye. Roleke mezin di pêşketin û nûkirina raman, hizir, ziman, huner û civakê de, dilîze. Helbest deryake ji evîna bê dorpêç û sînûr e. Bê rawestandî û miçiqandin, dizê û diherike. Xwendina helbestê ji mirovekî ta bi mirovekî din ne tenê cuda û tê guhertin. Lê belê, xwediyê (afrandekê) helbestê bi xwe, piştî çend caran ji xwendina helbestê, tiştin nû jê re xuya dibin. Ev jî ji ber ko (hest) di sînora şorezaran de nayê bestîn, û ne jî tê hevragirtin. Lewra ziman nikare (hest) di bûyîna wî ya xweberî de jiber bike. Divê têkiliyeke giyanî di navbera xwêner û helbestê (pîrsur û pîrsurî)yê de hebe. Em jibîr nekin di hundirê her helbestvanekî de (heger ko helbestvan

be) romannivîs, çîroknivîs û nivîskarek jî heye. Wek nimûne: Homîros, Lorka, Mîxaîl Lîrmantof, Gotyê, Nazim Hikmet, Cibran Xelîl Cibran, Celadet Alî Bedirxan, Kamîran Alî Bedirxan, Cegerxwîn, Qedrî can, Hejar, Osman Sebrî, Hesên Hîşyar û Selîm Berekat.....hd. Ewan navdaran helbest, gotar, roman û çîrok jî nivîsandine. Dema ko ew mirov xwedî hunerek bilind be, dikare ramana xwe di riya pirtirî rengêkî ji rengên celebê wêjeyê re bigihîne xwêner, ez dibêjim hunerekî bilind e, û çima na. Daxwaz gihandina wê ramanê ye, bi çi rengê celebê toreyê be, bila bibe.

4-Tu dikarî ji kerema xwe re berhemên xwe yê çapkirî û yê ne çapkirî bi nav bikî û bi kurtayî li ser her yekê biaxivî.

Berhemên min yê çapkirî ji sala 1985-2002an di bin baskê rewşeke awarte de belav bûne. Ew rewşa ko çapemeniya Kurdî lê yasaq e. Di rewşeke weha de nivîserê Kurd pir dijwarî têne pêşiya belavkirina berhemên wî. Li hemberî van dijwariyan jî min li

dora 110 pertûkan li Sûriyê dane belavkirin. Ji wan berhemana ezê berhemên xwe bi nav bikim:

Berhemên min yê çapkîrî ev in:

***Dîwana (Pêdarî)**-helbest 1985, pêşgotina wê seydayê Tîrêj nivîsiye. Ew dîwan ji helbestên evînî, nîşan, welatperwerî, xweşxwan, marş, aştî, jîna hov û teban, dîrokî...û bi awayekî kilasîk hatine hûnandin. Lê, ez bawerim di naveroka xwe de pir nûkirin û hevdemî ne. Bi zimanekî pir bilind hatine hûnandin.

***Gramêra ziman**-Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko-1990. Ev pirtûk giramêra mîr Celadet û şagirtê wî yê Firansîz Rojê Lîsko ye. Birastî, ciwantirîn û buhatirîn pirtûkên ko li ser zimanê Kurdmancî hatine afrandin ev pirtûk e. Li dora pênc sed û diwazde rûpelan e. Ji ber giringiya vê pertûkê û tunebûna giramêrên zimanê Kurdî di nav destên xortên Kurdan de, me ev pirtûk li ser daxwaza Rewşen Bedir-Xan, û bi alîkariya du mamosteyên zimanê Firansîzî werge-

rand zimanê Erebi. Ji ber rewşa siyasî ya pir dijwar, herdû mamosteyên dibistanê ne xwestin û naxwazin navên xwe, an keda xwe di vî karî de bi nav bikin, û ta bi vê rojê jî nexwestine bînin ziman. Li ser daxwaza wan û ya Rewşenê navê min bi tenê daket ser pertûkê. Lê, mexabin hin kesên ko di çirava golan de nêçîrê dikin û bi şevê mîna beqan qurqurê dikin. Ji çav nebarî û dixokî ev kar kirin qaçika nav deranan û pir bêbextî kirin –digel ko me di pêşiya pertûkê de, di rûpelê sipasiyê de, daye diyarkirin. Lê dîsa jî dev ji zikreşiya xwe bernadin. Birastî, daxwaza me ya pêşîn û dawîn ev bû ko em vî berhemê hêja di nav gelê xwe de bidin belavkirin. Em ne heyranê navê xwe ne. Li gorî gotina Rewşen xanim; '(Bi vî karê xwe, me sûdek pir mezin li gelê xwe kir', Bila tu mirovekî setembar bî çêtir e ko tu mirovekî setemkar bî), û nerîna wê di pêşgotina pertûkê de xweş zelal û xuya ye.

***Ji mesela Kurdistanê**-Celadet Bedirxan-werge-randina min e-1990. Ev pirtûk li ser tetrîka Kurdan –

mîna te`rîba Kurdan - dipeyive. Ew jî bi piştgiriya Rewşen xanim hate wergerandin û belav kirin.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (**Ji evîna çirayên kevin**) veguestina tîpan- 1991. Dema min ev dîwan ji tîpên erebî veguest tîpên latînî, li Binxetê pireya helbestvanên nûhatî destên xwe avêtibûn helbestên erebî û di bin bandûra çanda erebî de mabûn. Bi belavkirina vê pertûkê û dîwana didiwan (**Li Xelkî Tehlê li Min Şîrînê**), di yek salê de, berê xortên nûhatî ji helbesta erebî baş hate guhertin û destê xwe avêtin hûnandina helbesta Kurdî ya nûjen. Ji ber ko di wê demê de meydana meydana helbesta kilasîk bû. Bi vî karê xwe, min helbesta nûjen ya kurdên başûr li nav xortên nûhatî de belavkir û mîna pirekê di nav herdû perçan de, min ava kir, û min ew sînorên çêkirî ji nav çanda Kurdî, hilweşand.

***Mîr Bedir-Xan**: Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ. Ev pertûk, Rewşen Bedir-Xan ji cem seydayê

Goranî ji bajarê Emanê-Urdinê anîbû. Ez û wê, em li ser sekinîn û me hin navên malbatê û dîroka wan serastkirin. Bi rastî, min û Rewşen Bedir-Xan gelek karên hêja bi hev re kirin. Me çend pertûkên malbata wê dane çapkirin, wergerandin û belavkirin. Ji wan pertûkan:

-Bîranînên min -Salih Bedirxan-. Bîranînên bavê wê ye.

-Name bo Mistefa kemal paşa.(Celadet Bedirxan).

-Bîranînên Jinekê (perçê didiwan). Ev pirtûk ji zimanê Turkî wergerandibû zimanê Erebi.

***Şerefnameya Menzûm**-Cegerxwîn- ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirina min bû, 1997. Ev destnivîs nehatibû çapkirin û belavkirin. Di riya dostekî re bi navê (Kalemêr=Sedeqe) re, min ev destnivîs peyda kir.

***Bîranînên Celadet Bedir-Xan-** min komkir û wergerand bo zimanê Kurdî. Ev bîranîn di

rojnameyên Wicdan û Huriyê de –ya ko rojnamevanê Aşûrî Yûsif Melek li Beyrûdê diweşandin- derdiket. Di riya Rewşen Bedir-Xan û hin dostan re hejmarên wan gihane destê min. Min jî ji zimanê Erebiê wergerandin zimanê Kurdî û çapkirin.

***Ez û Agir-** Dîwana helbestvan Hizrevan-wergerandina ji tîpên Erebiê, sala: 1998.

Ev dîwan jî mîna herdû dîwanên E.Mizûrî min veguhest tîpên latînî û belavkir.

***Stran, berf û baran** helbestvan Mûeyid Teyib veguhestina tîpan.

***Bedirxanî di Cezîra Botan de-**Malmîsanij-wergerandin: Gulbuhar Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ, 1998. Bi rastî, ev pirtûk pir hêja û giranbuha ye. Gelek reşbelek û wesîqeyên dîrokî tê de peyda dibin. Min jî li dora bîst wesîqe û gelek wêneyên malbata Yezdanşêr û him agahiyên dîrokî yên di dermafê wî

û Bedir-Xan de dane belavkirin. Ez bawer dikim ev cara yekemîn e ko ew wêne û agadarî têne belavkirin.

***Berî Heyv Hilê** -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebî. Nivîsandina min e- Ji weşanên Mîdiya-Erbîl.2001. Ev pênc çîrokên min in, ji jîweriya gelê Kurd in. Di van çîrokan de, rengê mêranî, fedakarî û xebata gelê Kurd min aniye ziman. Ê ji hêleke din, min zordarî û sitemkariya dijminê gelê Kurd daye diyarkirin.

***Qedrî Can** amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Erebî). çapxana Aras, Erbîl= Hewlêr 2001. Ev berhem ya pêşîn e ko hemû nivîsên helbestvan Qedrî Can civandiyê û gelek agahiyên nû li ser nivîs û jiyana wî diyar dike. Ev berhem bi alîkariya hevalê min Horemê Yezdî hate wergerand bo zimanê Erebî û li başûrê Kurdistanê çapbû.

***Bîranînên Osman Sebrî-** bi zimanê Erebî-2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Ev bîranînên

xebatkarê nemir Osman Sebrî di riya Kurê wî Hoşeng re gihane destê min. Bi rastî dilê gelek kesan hebû ku ev berhem bigihê destê wan. Lê, malbata nemir Osman Sebrî hemû destnivîsên wî dane min. Bi alîkariya hevalê min Horemê Yezdî, me ev bîranîn wergerand zimanê Erebî û çapkir. Ezê nêzîk ne dûr wan berhemên ne çapkirî yê mayî jî bidim belav kirin.

*Ji bilî van berhemên ko min anîne ziman, bi dehan gotar û lêkolînên min bi herdû zimanan (Kurdî-Erebî) di kovar û rojnameyên Kurdistanê de hatine belavkirin.

*Berhemên min yê ne çapkirî bi herdû zimanan (Kurdî-Erebî) hene. Ez, bi hîvî me ko di rojên bînan de karibim wan çap bikim. Wek hûn dizanin di van dusê salên dawîn de rewşa çapkirinê li nik me pirtir dijwar bûye û bi taybetî rewşa ko ez tê de dijîm tu derfetê nade min ko wan çapbikim.

5- Wek ko diyar e, bandora malbata Bedirxaniyan li ser te heye... ji bo vê yekê ezê pirsar xwe sê xal bikim:

a- Te çilo ew naskir û ji kîjan salê de bû.

b-Bandûra wan li ser te wek kes û wek nivîskar çibû.

c-Bê malbata Bedirxaniyan ewê nuha rewşa toreyar Kurdî çiba.

*Di sala 1989-an de, min di riya mirovekî welatparêz re Rewşen Bedir-Xan naskir. Ew mirov navê wî Ferho Ferho ye, niha li bajarê Qamişlo dimîne. Rewşen Bedir-Xan li bajarê Banyasê rûniştibû. Ez jî li bajarê Şamê dimam. Qet hayê min jê nebû. Rojekê di riya vî mirovî re em çûn bajarê Banyasê û me hev naskir. Bi rastî ji dîtina pêşî diyar bû ko Rewşen xanim jineke rewşenbîr, welatparêz û pir zana bû. Rewşen xanim xelesa dawî bû ji zîncîra dîroka malbata Bedirxaniyan. Ew dîroka tev xebat û

raperîn û serhildan, çi di warê ramyariyê de be, û çi di warê rewşenbîriyê de be. Xebata vê malbatê dîrokeke li dora sed û pêncî salî dirêj e.

Piştî me xweş bi hev re da û stend û bawerî di navbera me de çêbû, deriyê mala xwe ji min re vekir. Bi rastî min biryar da ko ez guhdaneke mezin bidim vê malbatê, nemaze, piştî ko min ji wê naskir, ko tu kes guhdariyê li rewşa wê nake, û tu partî an nivîskar xwedî li berhemên ko di nav destê wê de mane, dernakevin. Hin xortin ji Kurdsitana Bakur car caran riya xwe pê dixistin, û gelek destnivîs û reşbelek ji cem wê birin, lê mexabin ta bi vê rojê, ewan xortan sozê xwe bi cih ne anîn û rewşa wan destnivîsan bû çi kes nizane. Vêca, her roja pêncşemê û îne ez diçûm mala wê û me bi hev re dest bi kar û xebatê dikir. Li dora pênc-şeş pertûkên malbata Bedirxaniyan me çapkirin. Berî mirinê ewê di wesiyeta xwe de nivîsandibû ko divê kutabxa-neya wê ji min re be. Kutabxaneyê wê di riya qîza wê re (Ûseyme) giha destê min. Li vê dawî-yê di sala 2001ê

de dema ko ez çûm Kurdistana başûr û min kek Mes`ûdê Barzanî dît, di wê dîtîne de min kutabxaneyê Rewşen xanim diyarî wî kir gelekê kêfa kek Mes`ûd bi vê diyariyê hat.

Wekî her car min karê xwe kir û ez çûm bajarê Banyasê. Ez giham mala wê, min dît Rewşen xanim li ser livînê mirinê ye. Mexabin di wê rojê de mir. Li ser daxwaza wê min laşê wê anî bajarê şamê û li rex bapîrê wê Bedir-Xan beg û mêrê wê Celadet Bedir-Xan da veşartin.

Bi rastî, ez hînê gelek ji serpêhatiyên jiyane kirim û ta bi vê rojê di bin bandûra wan gotin û pendê wê de mame. Ji min re digot: *(Lawê min!, peyayên malbata Bedirxaniyan bextê (şensê) wan di jiyane de pir kêmbû. Ji wî tovê ko çandin negihan ko jê bixwin. Ew mirovin li pêş bûn, lê millet ne gihabû. Ez ji Celadet bi şenstir im. Ji ber ko ewî xort û keçên kurd xwendevan bi çavê serê xwe ne dîtin. Lê, bi sedan xort û keçên xwendevan û zana îro li dora xwe dibînim. Lawê min!, Tu xortekî di xebatê de pir*

germî, û te qedera xwe bi malbata Bedirxaniyan ve girêdayî. Wek çewa şerê wan ji hêla mirovê dixsok dihate kirin, weha wê şerê te jî bibe. Riya te dirêj û dûr e. Bi bêdengî karê xwe bike. Ji karê xwe meweste. Divê hilma te fireh be. Kê çi got li wan venegerîne. Ez bawerim dem kevîle ji bo rastiyê. Divê tu hevalê yekîtiya Kurdan bî. Nebe sersebebê perçebûn û dûrketina kurdan ji hev. Bila tu berê keda xwe di jiyane de nexwî. Lê, wê dîroka gelê te, te jibîr neke. Bila tu setembar bî, ne setemkar bî).

Hevalê hêja, ez jî dixwazim li gorî van pend û şîretan bim.

Di sala 1997-an de, li ser daxwaza neviyên Yezdanşêr çûme Urdinê-Emanê. Birastî ez rastî gencîneyek ji zanîne bûm. Neviyên Yezdanşêr xortin pir zana û xwendevan in. Mirovine welatparêz û gelperwer in. Gelek reşbelek û destnivîs li ser malbata xwe ji kutabxaneyên Birîtanî peyda kirine. Li ser daxwaza wan ez çûm bajarê Stenbolê û min

gelek wesîqe ji erşîvê osmaniyan derxistin. Ez bihêvî me ko dem alîkar be ji bo derxistina wan respelekan.

Ji bo xala te ya dawîn ez dikarim bi çend gotinan bersivê bidim. Ez dibêjim heger Rojnameya "Kurdistan" tunebûya dê gelê Kurd bê dîroka rojnamegeriya Kurdî baya. Heger kovara Hawar, Ronahî, Roja Nû, û Stêr tunebana dê zimanê toreyî, Gramêra Kurdmancî û wêjeya Kurdmancî tunebana. Ev kovar û rojnameyên Bedirxaniyan Qur`ana zimanê Kurdmancî ne. Pêvî kar û xebata wan di warê ramyarî de, wan berhemên hêja û giranbuha yên ko Mîr Celadet, Kamîran, Sûreya, Miqdad, Ebdulrezaq, Emîn Alî, Rewşen û gelekên din ji vê malbatê ji me re hiştine. Gerek em jibîr nekin bê çewa di warê ramyarî û xebatê de gelê Kurd deyndarê malbata Barzaniyê nemir e, weharengê di warê rewşenbîriyê de deyndarê malbata Bedirxaniya ye.

6- Wek em dizanin tu endamê komîta xelata Osman Sebrî ye, ji kerema xwe tu dikarî li ser vê xelatê bipeyivî.

*Di 9-1-1998-an de, li mala nemir Osman Sebrî civatek mezin ji nivîskar, helbestvan, rojname-van û rewşenbîran hate girêdan. Di wê civatê de pêşniyara avakirina komîtekê bi navê (komîta xelata Osman sebrî) hat kirin. Ev pêşniyar ji hêla hemû beşdaran ve hate pejirandin. Di wê civatê de komîtek ji heft kesan bi serokatiya mamoste Cemal Nebez hate helbijartin. Ev xelat her sê salan pêşkêşî mirovekî ne Kurd, dostê gelê Kurdan bibe. Komîta me biryar wergirt ko xelata xwe ya pêşî bide Profesor Ismaîl Beşikçi. Li ser daxwaza komîtek di 12-7-2000-ê, li bajarê Enqerê min xelata komîtekê pêşkêşî mamoste Ismaîl Beşikçi kir. Hêjayî gotinê ye, ko ev cara pêşî ye ko mamoste Ismaîl Beşikçi xelatekê werdigre. Wekî diyar e, tucarî tu xelat ji destê tu kesî wernegirtiye. Ji bo vê yekê em xwe pir bextewar û dilşa dibînin ko

mamoste Ismaîl Beşikçi xelata me wergirt. Ji bo me cihê serbilindî û şanaziyê ye.

Ez bawerim xelata didiwan ya sala 2003an wê para Danyêl Mîtran be.

**7-Wek ez dizanim tu mirovekî siyasetmedarî jî....
ma tu ne bi nerîna min re ye ko çi kesê nivîskar be
yan hunermend be dikeve çarçeweke teng de
dema bi yek partiyê ve têye girêdan.**

*Berî her tiştî ji narevîna me Kurdan e ko siyaset bi rewşenbîriyê ve hatiye girêdan. Lê, neyê wê angoyê ko rewşenbîr dîlê nerîn û îdyolojiya partiyan be. Ji ber rewşa ko gelê Kurd tê re derbas dibe, hiştiye ko siyaset derbasî jiyana me ya rojane bibe. Li welatê me, axaftina bi zimanê bavûkalan siyaset e. Giring e, her mirovek xwedî nerîn be. Vêca, rewşenbîr wê çewa bê nerîn be!. Lê, girêdana bi partiyekê ve û mayîna di çerçewa teng de. Di baweriya min de daxwaza te bawerî bi yek partiyê û her tiştê wê partiyê rast bibîne û di riya berjewendiya wê re

jîweriyê binirxîne, ez bawer dikim ew rewşenbîr rola xwe wek ronakbîr winda dike û xwe di bin konê partîtiyê de bingor dike. Rewşenbîrê partîzan xwedî roleke gewre û diyar e. Li hemberî doza gelê xwe rastgo û xwedî hesteke nazik û rewan e. Bi nerîneke giştî di gasîna xebatê de hevpar û piştgir e. Ne kêsbas û pergîr e.

8- Ji ber ko tu bi siyasetê kar dikî ... tu rewşa tevgera Kurd li Sûriyê çewa dibînî?

*Bi rastî, min gelek caran di riya gotaran re dîtina xwe di rewşa tevgera Kurd li Sûriyê de diyar kiriye. Ezê bi kurtî bersivê bidim. Rewşa tevgera Kurd cihê dilêş û kuldar e. Wek hûn dizanin nîgaşa parvebûnê ev e; hin partiyên Kurd di bin siya (Hevbendî) û hin partiyên din di bin siya (Bere) û çend partiyên din jî dervî herdiwan kar dikin. Hejmara van partiyan hejmara tiliyên herdû destan derbas dikin. Pîrbûna hejmara wan şana rewşa lawaz û qelsiyê ye. Di roja îro de, wek ez dibînim nakokî û berberiya di nav van partiyan de ne li ser nelihevkerina rewşin ramanê an

Îdyolojî ne. Ne li ser dirîşmên siyasî ne. Ne li ser berberiya qatî ne. Lê gelo çine?!...Ez bawer dikim sê xalên girîng û yên sereke hene:

- Xwe girêdana bi partiyên Kurdistanê ve. Ango doza xwe jibîrê dikin û rihakirina xwe bi rihakirina filan partiyê li filan perçê dibînin.

-Nerîn û dîtina wan ji rêjîma Sûriyê.

-Rengê xebatê li Sûriyê.

Ez pêvî van her sê xalan tu xalên din nabînim.

9- Gelek spas ji ber ko te dema xwe da me, fermo gotineke dawîn ji xwendevanê malpera Tîrêj re bêje?.

*Di destpêkê de, ez hemû endam û rêvebirên malperê sipas dikim û serketinê ji karê we re dixwazim. Dawiya hevpeyvîna xwe bi gotina zanyarê mezin Se`îdê Norsî kuta dikim û her bijîn ji bo Kurd û Kurdistanê:

”Zimanê me yê ku di geşbûn û pêşveçûyîna de weke dara Tu be, bi qabilyet e ji bona ku weha hişk û perîşan, ji zimanê medeniyetê ku edebiyate dûr ma ye, we li welatparêziya we gilî dike”.

(Se’de Norsi, İctimaî Reçeteler1, tenwîr Neşriyet, sh95).

Hevpeyvîna Malpera Rizgarî

Hevpeyvîn Li Gel Dilawerê Zengî

Hozanê Bengî

Çend meh berê, nûçeyek di malpera Rizgarî online – 16.06.2004-an da bilav bû, ku nivîskar Dilawerê Zengî, ji Şamê dihat Awrûpa, da “2. Xelata Osman Sebrî” pêşkêşê Xanim Danielle Mitterand bike.

Mamoste Dilawerê Zengî hat û bi serdanek gehîte ba me jî. Li gel ku em hêja Dilawerê Zengî wek nivîskar, lêkolîner, helbestvan û htd. jî dinasin, lê nasdarîyeka me yê kesî jî heye. Me bi dilek xweş pêşwazîya mamoste kir û bi çend dilan jî guhdarîya wî û bîr û boçûnên wî li ser gelek tişt û babetan kir. Li gel wê jî me xwest, wê mecal helê jî bikar bihênin û hevpeyvînan jî li gel mamoste pêk bihênin, da xwendevanên me jî, ji hindêk ji wan çalakîyan haydar bin, ku mamoste tê da tevdigere. Yek ji wan babetên, me helbijart, ku em li gel mamoste bihaxivin, gelek xwezayî bû, ku li ser “Xelata Osman

Sebrî” û “Komîta Xelata Osman Sebrî” bû. Eva jê deqa hevpeyvîna me ye li gel Dilawerê Zengî, li ser “Xelata Osman Sebrî”.

H.Bengî: Mamoste Dilawerê Zengî, tu gelek bi xêr hatî û ser çavan. Em dizanin, ku tu li ser navê “Komîta Xelata Osman Sebrî”, ji Şamê hatî. Berê her tiştê, em dixwezî tu ji me ra li ser “Xelata Osman Sebrî” bihaxivî. Ji alîyêkî û ji aliyekê din ve, kengê, li ku û bi çi mebestê/ armancê hatîye damezirandin ?

Dilawerê Zengî: Di 11-ê meha yekê (1.) sala 1998, li bajarê Şamê, em hejmarek rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan, hunermend û sîyasetmedar, li mala Apê Osman Sebrî li hev rûniştin. Hejmara me li dora 60 kesî dibû. Di nav me da, çendîn nivîskar, rojnamevan û berpirsîyarên partîyan hebûn. Civîn, ji alîyê komîteyekê ve hatibû amadekirin, ku ji kesên malbata Apê Osman – ewên di wê demê da li Şamê bûn -, wek keça wî, zavayê wî, paşî ez bi xwe, Mamoste Dr. Ebdulmecîd Şêxo û ji Mamoste

Heyderê Omer pêk hatibû. Bi mebesta bîranîna Osman Sebrî me civîn amade kiribû. Di civînê, beşdaran pêşnîyar kirin, ku komîteyek, bi navê “Komîta Xelata Osman Sebrî” bê damezirandin. Ev pêşnîyar ji aliyê tevaya beşdaran ve bi germî hat pejirandin. Hindek ji me hatin pêş û xwe wek endamê komîtê kandîd/pêşnîyar kirin. Ez bi xwe yek ji wan bûm, Mamoste Heyderê Omer, Dr. Ebdulmecîd Şêxo û Dîya Civan jî bûne endamên komîtê.

Di dirêjaya dan û standinan de, hat pêşnîyar- kirin, ku Komîte “Kurdistanî” be û lewra jî divê hindek navên ji beşên din yên Kurdistanê jî bêne pêşnîyar/destnîşankirin. Di heman demê de hat pêşnîyar kirin, ku Dr. Cemal Nebez bibe serokê komîtê. Ji ber, ku ew wek mirovek akademîk, naskirî û serbixwe ji partî û rêxistinan, dikarîya profîlek baş bide komîtê.

Ev pêşnîyar, bi tevahî hatin pejirandin. Piştê civînê, peywendî hat girêdan li gel Dr. Cemal Nebez, ku xwe

da ber karê serokatîya komîtê. Paşî jî, bi van kesên li jêr, komîte hat firehkirin; Xecê ji Bakûrê Kurdistanê, Mihemedê Tûj (Mihemedê Mele Ehmed) û Dr. Memo ji Parîs.

Piştê avakirina komîtê, inca gengeşeyên li ser kar û mebest û amancên vê “xelat”ê destpêkirin. Di dawîya gengeşeyan de, hat biryardan, ku ev xelat, berê her tiştê, divê li ser navê “dostanîya gelan” bête pêşkêşkirin. Ji wan kesan ra bê pêşkêşkirin, ku ji bo doza Kurdî xebitîne, çi di warê sîyasî de, çi di warên rûşenbîrî û hunerî de û bi giştî ji ber Kurdan da zehmetî, dijwarî û astengî kêşane, wek rêzgirtinek ji bo wan, ev xelat dê ji wan ra bihata pêşkêşkirin. Lê, divîya ev kes ne Kurd bûya. Ji ber ku Kurd bi xwe ne pêwîste hevdû xelat biken. Lê, yekê biyanî re bê pêşkêşkirin, ku di rêya Kurdan de zehmetî û dijwarî û westîyanê dîtibe.

H.Bengî: Hûn dibêjin, ku dê niha 2. (duwemîn) xelat bête pêşkêşkirin. Lewra jî, divê ku 1. xelat jî

hebe. “1. Xelata Osman Sebrî” gehîşte kê, bo çi, çawan (bi çi awayê) û bi destê kê hat pêşkêşkirin ?

Dilawerê Zengî: Me got, ku Komîta Xelatê, di sala 1998 de, hat damezrandin. Di sala 1999 de jî biryar da û bi daxuyanîyekê jî bilav kir, ku “1. Xelata Osman Sebrî” gehîşte Dr. Îsmâîl Beşîkçî. Li vir ne pêwîste, em gelek gotinan bikin li ser Îsmâîl Beşîkçî, ji ber ku her kes wî dinase. Wek nivîskar, rûşenbîr, tekoşer û xebatkarekî mezin, di ber doza Kurd de, gelek êşîyaye û gelek salên dirêj ji temenê xwe di zindanan de derbaz kirîye. Gelek pirtûk û nivîsên hêja nivîsîne. Ji ber van hemû xalan, me navê Îsmâîl Beşîkçî derxist pêş. Piştê wergirtina biryarê, li ser pêşniyarê ez hatim destnîşankirin, ji bo pêşkêşkirina xelatê bo Îsmâîl Beşîkçî.

Min bi alîkarîya hindêk nivîskarên ji Bakûrê Kurdistanê, karî xwe bigehînim cem Îsmâîl Beşîkçî û xelatê pêşkêşê wî bikem.

Yek ji wan, ku ji roja yekem ve pêşwazîya min kir û di ber me de gelek westîya û ku rêzek min ê gelek

taybetî jê re heye, Mele Îsmet bû, ku hat pêwazîya min li bajarê Enqere û bi ser de jî, di navbera min û Îsmâil Beşîkçî de karê wergeran-dinê birêve bir – bi awayek xweş û hêja. Wesa xuya bû, ku yek ji sedemên Îsmâil Beşîkçî xelata me wergirt jî ew (Mele Îsmet) bû. Bi awayek xweşik bir û anî û bi hostatî pê da pejirandin (hêjayê gotine, ku tê zanîn, Îsmâil Beşîkçî xelatan wernagire – HB).

Ez dibêjim eva (dibe ku?) cara didûwan be Îsmâil Beşîkçî xelatek webigire. Ji ber wê jî li her cihê deng da. Ji bo me jî serketinek bû, ku Îsmâil Beşîkçî xelata me werbigire.

Em bêne ser 2. xelatê. Sala 2003, piştê dan û standinan, biryar hat standin, ku 2. xelat ji bo Xanim Daniëlle Mitterand bête pêşkêş kirin. Sedema serekîyê, ku pêşkêşkirina xelatê heta niha dereng ket, bûyerên Qamîşlo bûn. Ew bûn asteng li pêşîya me, da bikarin di demek zûtir de karên xwe pêk bînin.

H. Bengî: Kartêkirinên bûyerên Qamîşlo hinde mezin bûn, ku we nedikarîya derkevin derve?

Dilawerê Zengî: Belê. Rewş gelek dijwar bû.

H. Bengî: Bo çi Xanim Danielle Mitterand ?

Dilawerê Zengî: Herkes baş dizane, ku wê di ber Kurdan de gelek cefa kêşaye û piştgirîyên bê sinor dane gelê Kurd. Wek nimûne, bûye destpêkerê avakirina gund û dibistanan li Başûrê Kurdistanê. Wek miroveka nas di cîhanê de, xemxureka doza gel û mafên milletê Kurd bûye. Ez li vir naxwezim hemû xebata wê bînim ser ziman, ji ber, ku wê bi dûr û dirêjayî xizmeta Kurdan kirîye. Lê ez dikarim bêjim, ku ew rolek pîroz lîstîye di karê navberî ya “şerê birakujîyê” de û di vemirandina wî agirî de. Ji ber van û gelek xalên din, Kurd jî, wê ji xwe ra wek “dayikek” dibînin. Ew bi xwe jî gelek pê xweş e, ku Kurd jê re dibêjin “Dîya Kurdan”. Ji lewra jî ew mirovek hêjayê wê ye, ku em xelata xwe pêşkêşê wê bikin.

H.Bengî: We peywendî girêdaye li gel, ku “2. Xelata Osman Sebrî” gehîştîye wê ?

Dilawerê Zengî: Me hêj di destpêkê de, bi nameyek li ser navê Komîta Xelatê, Dr. Cemal Nebez, pê da zanîn. Ewê jî di bersîva xwe da, ji bo me daye xuyan, ku wê wergirtina xelatê pejirandiye. Ez jî niha hatime, ku li ser navê Komîtê, xelatê pêşkêşî wê bikem. Lê mixabin, heta roja îro jî, kar û barên me bi ser hevdû ve nehatine, ku em bikarin xelata xwe pêşkêş biken.

H.Bengî: Hûn ê çawan bikarin, karên Komîtê bi berdewam bikin, ku niha endamên Komîtê, her yek li ciheke û li dinê bilav bûne ?

Dilawerê Zengî: Di rastiye de, komîta me tenê, ya li hev şêwrê ye. Ji lewra jî, me heta niha karîye vî karî, bi rêya telefonê çareser biken. Pêşniyara kesek tê kirin û em jî li ser dan û standinê dikin. Ji bo vî jî lihevruştina me pêwîst nake. Heta niha bi başî bi rê ve çû ye. Komîte karên xwe yên pêş da bi ser 3 xalan da xuya kirîye; (1) Niha jî tê pêşniyar kirin, ku

Komîte bête firehkirin. Hindek navên din, nivîskar û rewşenbîrên din jî dikarin bêne nav Komîtê.(2) Ji alîyê din ve jî, Komîtê biryar daye, ku xwedî li ber û berhemên Apê Osman Sebrî derkeve. Em dixwezin xwedî li hemû berhemên çapkirî û neçapkirî derkevin û bizanin, ka çi berhemên wî yê din hene.(3) Wek xala sisêyan jî, pirs sala 2005 tê pêşîya me, ku 100salîya ji dayikbûna Apê Osman e. Em dixwezin, li nav û derveyê welêt, gelek semîner bêne lidarxistin û Komîte jî piştgirîya wan bike.

H.Bengî: “Xelata Osman Sebrî” çend sal carek tê pêşkêş kirin ? Gelo li ser vê yekê hatîye biryar dayîn?

Dilawerê Zengî: Her 3 sal carek, ji bo mirovek destnîşankirî û li gor xalên li jor binavkirî, tê pêşkêşkirin.

Xuya ye, ku ji bo me amadekirina xelatek her sal zehmet e. Ji ber, ku em ji tu der û rêxistinan alîkariyê wernagirin ku piştgirîya me bikin. Diyare xelata me, ji parçek zêr (bi dirêjaya 10 cm) pêk tê, ku wêneya

Apê Osman li ser hatiye neqşandin û li jêr jî hatiye nivîsandin “Xelata Osman Sebrî, Ji Bo Dostanîya Gelan”. Eva jî barekî aborî dixê ser karê Komîtê.

H.Bengî: Mamoste Dilawer, em gelek spasîya te diken, ji bo te dema xwe ya hêja ji bo Hevpeyvîna me terxan kir. Di dawîyê da tu gotinên te hene ji bo xwendevanên me ?

Dilawerê Zengî: Gelek spas ji we re. Ez dixwezim li vir bi taybetî spasiya te jî bikem, ku te piştgiriya vî karê me kiriye, û te em bi babê xwe yê hêja Mele Îsmet da naskirin û bi alîkarîya camêrekî wek babê te karê me çû serî. Ez dikarim wê jî bêjim, ku ne tenê ev karê me yê navbirî çû serî. Lê, em bi vê rêyê, gehîştin peywendiyên gelek hêja jî, li gel nivîskar û rûşenbîrên Bakûrê Kurdistanê.

Hevpeyvînek digel Dilawerê Zengî li ser civata Xoybûnê¹

1-Armanca damezrandina Xoybûnê çibû?

** Piştî hilweşîna şoreşa Şêx Se'îdê kal di sala 1925an de, dewleta Turk dest bi siyaseta helandina bi darê zorê Kir-ya bi siyaseta Tetrîkê tê naskirin. Dasa şer, hişk û ter da ber hev. Bi destekî hesinî dest bi kuştin û wêrankirina gelek gund û bajaran kirin. Çek ji destê hoz û 'eşîrên Kurdan wergirtin. Berê agirê Setemkariyê giha hemû warên jiyane (abûrî, civakî, siyasî û rewşenbîrî)yê. Bi sed-hezaran Kurd dûrî welêt xistin. Kurdistan kirin dojeh. Gelek ji wan siyasatmedar û welatparêzên Kurd penaberî Sûriyê, Îraq, Îran û Ewropayê bûn. Lê digel van karan tevan jî dewleta Turk nikarîbûn viyan û hêviyên Kurdan ji hest û hizrê wan yê neteweyî bibirin û rehên agirên serhildan û berxwedanên wan vemrînin. Ew agirên

¹ Wêneguhêza Roj.Tv. danûstendina:Fêselê Daxilî.2002.

ko li Çiyayên Cabikcûr, Farqîn, Sason û Agiriyê vêxistî mabûn di şerê xwe de berdewam bûn.

Dema ku welatperwerên Kurd yên penaber bi çavên serê xwe dîtin bê çî bi serê gel û welatê wan hat, û dijmin di hovîtiya şerê xwe de her berdewam e; biryara girêdana kongirekî giştî ji hemû welatparêz, xwedî civat û rêxistin, siyasetmedar û rewşenbîr, beg û serokên hoz û 'eşîran dan.

-Giringiyek bi girêdana kongirekî giştî ji bo yekîtiya hêzên Kurdan yên belavbûyî li ser pirogrameke yekbûyî hebû.

-Damezrandina navendeke giştî ku cihê Stendina biryaran û piştgiriya şoreşa Agirî bike. Çî di warê aborî û leşkerî de be, û çî di warê siyasî, diblomasî û piropaganda de be.

-Xoybûnê wek rêxistin ji bo kurdistaneke serbixwe tekoşîn dikir, ev daxwazeke rêzanî bû. Lê belê Xoybûnê di belgeyan de û li ser kaxizê wek rêxistineke serxwebûnê, xwe ne dida nasîn, li ser

pertûkên xwe, weşanên xwe, di destûra xwe de hertim **(Xoybûn- Rixistina netewî ya kurd)** bikar tanîn, ev yeka jî gelek balkêş e.

Ewan welatparêzên kelecana û penaber kongirê xwe di 5ê çiriya pêşîn sala 1927-an de, li Beyrûdê-Bihemdûnê, girêdan. Di wî kongirî de, çend biryarên dîrokî hatin sitandin. Hêja ye em wan biryaran bînin bîra xwe:

Biryarên kongirê Xoybûnê ev bûn:

1-Helkirina hemû civatên Kurdî yê heyî, û pêkanîna civateke Kurdî ji hemû endamên kevin kom bibin û rê li ber endamên nû vekirî be.

2-Şoreşan li dijî Tirkan dirêj bikin, ta yek leşkerê Tirk li ser axa Kurdan nemîne.

3-Berî pêxistina agirê şoreşa giştî, li ser van xalên jêrîn biçin:

A-Ji bo hemû hêzên niştimanî ên Kurdî, pêşewayê giştî destnîşan bikin.

B-Rêxistina hemû hêzên şoreşgêr di rêbazên leşkerî û cengawerî de baştirîn çekên şervanî di destên şoreşgêran de bin.

C-Ji şoreşê re melbendeke giştî bê nîşankirin û ji bo hêzan serkirdayetiyeke bilind di çiyayekî ji çiyayên Kurdistanê ên bilind de bê danîn.

4-Ligel dewleta Îranê, û bi gelê Faris re peywendiyên biratî û xweş girêdin.

5-Bi herdû dewletan (Sûriyê+Îraq)ê re peywendiyên xwe girêdin, û ew mafên li gora sekihên çavdêrî ku peyman û rêkevtinên dewletî bi Kurdan dabûn, bes in û doza tu mafên siyasî yên din ji herdû dewletan nekin.

2-Di dîroka Xoybûnê de xebat û çalakî çewa hatin kirin?

** Xoybûnê, dest bi kar û xebata xwe ya neteweyî kir û bi serokên 'eşîran, serdarên siyasî û bi malmezinên Kurdan re têkilî girêdan, û bi hev re dan û stendin da ku li dema pêwîst amade bin.

Xoybûn roj bi roj xebata xwe berfireh kir û bi Kurdên derveyî welêt re têkilî girêdan.

-Nûner û endamên Xoybûnê li her çar perçên Kurdistanê û li derveyî welêt (Ewropa+Emerîka) çêbûn.

-Peywendî di navbera serkirdayetiya Xoybûnê û perçên Kurdistanê yên din de çêbûn.

Xebat û çalakiyên Xoybûnê di warê leşkerî de:

Birastî em nikarin xebata Xoybûnê û şoreşa Araratê ji hev veqetînin, ji ber ko li dora çar salan (1927-1930) bi heve hatibûn girêdan. Em dikarin bibêjin ko berdewamkirin û geşkirina agirê şoreşa Agirî pareke mezin jê keda rêxistina Xoybûnê bû.

1-Şoreşa Agirî:

-Ihsan Nûrî paşa serkêşiya şoreşa Agirî bike, û ala Kurdî û durîşma civata Xoybûnê jê re rêkirin. Serokê

şoreşa Araratê ev durîştma ha kiribû nîşana efsêrên xwe, û çiyayê Agirî kiribû nîşana leşkeran.

-Rêveberiya dezgehên bajarî bi serokatiya Birahîm paşayê Hisikî damezrandin.

Devereke fireh vegirtin: “Ararata mezin û ya piçûk, cihên Torbax û Kelhê, Tendirok, Aldax, Mîlêc, Kêrik, Êrhebeş, Zîlan, Eyaxa, Barkêrê û Diyardînê.

2-Pirojeya şoreşekê ji başûr-Binxetê:

-Xoybûn şeva 3ê Ser 4ê Tebaxê, Sala 1930ê roja êrîşkirina ji başûr-binxetê ber bi bakur-serxetê ve biryar stendin.

Serkirdayetiya Xoybûnê enya şer ji Cerabulsê ku li ser ava Feratê dikeve, ta Endîwerê li ser ava mezin (Dicle); li ser şeş deveran ji rojava ta rojhelat bi ser endamên Xoybûnê de belva kirin.

1-Devera Kobanê: Bozanê şahîn beg û birayê wî Mistefa beg serokên hoza Berazan, û Osman Sebrî

berê wan li Orfayê û Mereşê bû û wê O.Sebrî ber bi hoza Merdîsan here.

2-Serê Kaniyê: Mehmûd begê Birahîm paşayê Milî ber bi Wêranşehir here.

3-Devera Dirbêsiyê: Ekrem begê Cemîl paşa û Qedrî ber bi Mêrdînê herin.

4-Devera Tirbesipiyê: Haco axa serokê hoza Hevêrka ber bi cihê Hevêrkan here.

5-Devera Dêrikê: Celadet Bedir-Xan beg serkêşiya vê hêzê dikir û pêre Mihemed begê Cemîl paşa û hin ji begên devera Botan mîna Resûl axa serokê hoza Zîlan.

6-Devera Tilşe'îrê: Cemîlê Seyda û herdû kurapên Şêx Se'îd (Selahedîn û birayê xwe), digel pênc hevalên din , di herêma Nisêbînê re herin.

Xebata Xoybûnê di warê Siyasî, civakî û rewşenbîriyê de:

Xoybûnê gelek şêweyên tekoşînê yên ji hev cuda bi kar tanîn, wek nimûne di xala 17an ya destûra wê de tişteki gelek balkêş cih girtiye. Ew jî ev e; `propaganda divê him devkî him nivîskî bê çêkirin. Di warê propaganda devkî de miftî û derwêş divê stran, qesîde û çîrokên Kurdî di nav gel de belav bikin, û bi vî awayî zordariya Tirkiyê nîşan bidin`. Nivîskar Rohat Alakon di vî warî de dibêje: `Ev cara pêşîn ko rêxistineke Kurd folklor û edebiyatê di warê hişyarbûna neteweyî de wek çekekê bi kar tîne û vê yekê di destûra xwe de bi cih dike. Ligel tekoşîna çekdarî, Xoybûnê bi taybetî baweriya xwe gelek bi kaxiz û pênuşê tanî. Xoybûnê wek rêxistin bi zimanên Inglîzî, Fransî, Erebî û Tirkî çend pirtûkên înfomatîk û hînkari di derbarê rewşa kurdan de weşandin.

Piştî şoreşê rewşa xwe rêxistin û bi ser û ber kirin, rojnameyek bi navê Agirî derxistin û di jimarekê de, marşa xwe ya leşkerî belav kirin (Agirî Agirî-Ji 9 malikan pêk tê).

-Hin daxwiyânî ji bo piştgiriya şoreşê û geşkirina hestê neteweyî di nava gel de, çî li hindirê welêt û çî li derveyê welêt dihatin belavkirin.

-Radyo ya Kurdî li Bêrûdê hate vekirin û radyogêrên wê Dr. Kamîran Bedir-Xan bû. Di rojê de çarîk katjimêr nûçe, gotar û lêkolîn diweşand.

-Li gora biryara Xoybûnê, Şêx Ebdilrehmanê Garisî rêkirin serxetê, lê mexabin ew çûn, çûna bê vegeer bû. Şehîd ket.

-Di 24-9-1932an de, endamên civata Xoybûnê civatek damezrandin bi navê (Civata Arîkariyê ji Bona Belengazên Kurd li Cizîrê).

-Di havîna sala 1938an de, li gor biryara civata Xoybûnê Nadiya CiwanKurd li bajarê Amûdê hate damezrandin.

-Peywendî di nav Xoybûn û partiya Hîwa ya Îraqê de çêbû.

-Peywendiyên xwe bi Barzaniyan re nûkirin û çaxê Tevgera Mele Mistefa Barzanî (1943-1945), ala Kurdî jê re rêkirin da li ser kopê çiyayên Kurdistanê bilind bike.

-Di sala 1945an de Xoybûn û partiya Hîwa bi hev re raporteke hevpişkî rêkin kongirê Sanfiransîsko, doza mafê Kurdan bikin.

-Xoybûnê nûnerê Xwe Qedriyê Cemîl Paşa rêdike Mehabadê Ji bo pîrozkirina Komarê.

3-Di Xoybûnê de, ji rewşenbîr û pêşwayên rojavayê Kurdistanê kî bûn?

** Berî bersiva vê pirsê bidim, hêja ye em damezrênerên civata Xoybûnê diyar kin; ji bo zelalkirina vê pirsê bi giştî be.

Damezrênerên civata Xoybûnê ev bûn:

1-Celadet Alî Bedirxan.

2-Elî Riza kurê şêx Se'îdê Pîran.

3-Dr.Şikriyê Mihemedê Segvan.

4-Haco Axa.

5-Bozanê Şahîn beg (serokê hoza Berazan).

6-Mistefayê Şahîn beg = = = .

7-Emînê Ehmed (Serokê hoza Rima).

8-Memdûh Selîm.

9-Bedredîn axayê Hebisbenê.

10-Tewfîqê Cemîl.

11-Fehmiyê Licî (nivîskarê Şêx Se'îd).

12-Mele Ehmedê Şûzî.

13-Feqe 'Evdilayê Cizîrî.

14-Kamil efendî.

15-Kerîm efendî.

Tev endamên komîta navendî bûn pêvî (Feqe evdilayê Cizîrî û Mele Ehmedê Şûzî).

***Kesên ku Xoybûn li binxetê ava kirin û pêşvebirin
ev bûn:***

C.Bedir-Xan, K.Bedir-Xan, Xelîl beg Bedir-Xan, Sûreya Bedir-Xan, şêx Ebdulrehmanê Garisî, Dr.Ehmed Nafis, Dr. Nûredîn Zaza, Haco axa, Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa, Hemze begê Muksî, Dr. Nûrî Dêrsimî, Şewket Zulfî beg, Emîn Birûsk, Şêx Ebdilrehman û Mihemed Mihdî û Tahir birayên şêx Se'îd, Ebdilrehmanê Eliyê Yûnis, Arif Ebas, Memdûh Selîm, Tewfîq Cemîl, Osman Sebrî, Cemîlê Seyda, Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Hesên Hîşyar, Cegerxwîn, Ehmedê Namî, ...û hwd.

***lê yê ji rojavayî Kurdistanê li gorî ku têne bîra
min ev bûn:***

-Mihemed 'Eliyê Şêxmûs (Şiwêş).-Se'îd axa.-'Evdê Têlo.-Hacî Ebdilkerîmê mela Sadiq.-Mele 'Eliyê Topiz
-Dr.Xalid Qotreş. -Ûsê Hersan.-Birahîmê Qiço.-
Isma'îlê Wethiya.-Seydayê Tîrêj.-Osman Alûsî. -Eliyê Omer.....hwd.

4- Di Xoybûnê de rola Bedirxaniyan çi bû?

** Ji nav malbat û malmezinên Kurdan rola malbata Bedirxaniyan ya sereke bû:

-Celadet Bedir-Xan yek ji damezrênerên pêşîn yê Xoybûnê bû, û hemû çavkanî û jêderên dîrokî nîşan didin ko ji sala 1927-1932-an serokatiya Xoybûnê kiriye. Lêkolînerên wek Basîl Nikitîn, E.G. Elphinston, Erhart Franz, Nazmî Sevgen di berhemên xwe de Celadet Bedir-Xan wek serokê Xoybûnê nîşan didin.

Berî ko Xoybûn belav bibe, serokê Xoybûnê Dr. Ehmed Nafiz beg bûye.

-Piştî hilweşîna şoreşê û têkçûna xebata çekdarî digel birayê xwe Dr.Kamîran dest davêtin xebata rewşenbîrî û zimanê Kurdî, çend kovar û rojname li Sûriyê û Beyrûtê weşandin mîna (Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr) û çend pertûkên hêja li ser ziman, tore, dîrok û folklorê Kurdî çap kirin.

-Xelîl beg Bedir-Xan endamê Xoybûnê bû li Beyrûdê.

-Dr.Kamîran Bedir-Xan rêpêşendarê Xoybûnê bû.
Radyo ya Kurdî li Bêrûdê vekir û radyogêrê wê bû.

-Sûreya Bedir-Xan li gorî biryara Xoybûnê diçe Ewropa û Emerîkayê û roleke baş li nav Kurdên penaber radibe û alîkariyê ji nav wan dide hev û hin şaxên Xoybûnê li wir ava dike, û bi hin çalakiyên diplomasî radibe. Di raporeke Îngilîz ko di dîroka 18-4-1929-an de, ji Amerîkayê, ji bajarê Detroitê hatiye şandin, dide diyarkirin ko Sureya Bedir-Xan berî ko bê Amerîkayê çûye Îtalyayê û li wir 15 rojan maye û bi Musolonî re hevdîtinek pêk aniye, paşê riya xwe bi Yunanîstanê xistiye.

5-Ji bilî Sedemên şexsî çi nakokiyên damezrênerên Xoybûnê hebûn?

**** Nakokiyên damezrênerên Xoybûnê gelek bûn.**

Dema xwestin ji başûr êrîşî dewleta Tirkan bikin, û ji şeş deveran derbasî Kurdistana bakur bibin. Gelek ji wan axa û begên ku soz dabûn piştgiriya vî karî

bikin û pê rabin, sozê xwe xwarin û pê ranebûn. Evê yekê nebaweriyek di nav Xoybûnê de çêkir.

-Piştî şikestina şoreşê valahiyek çêbû, ewê valahiyê hişt ku nakokiyên wan geştir bibin, û li hev bigrin. Hin ji endamên Xoybûnê dev jê berdan û dest bi şerê hev kirin.

-Tirkîyê bi hemû hêzên xwe ve gelek hewl dida ko Xoybûn hilweşe û ji navê rabe. Yek ji wan metodên li dijî Xoybûnê derxistina qanûnên efûyan bû. Bi saya van efûyan Tirkîyê dixwast hin endamên Xoybûnê dev ji Xoybûnê berdin, bên radestî Tirkîyê bibin û Xoybûnê perçe bikin. Vê yekê bandûra xwe nîşan da. Wek kesên mîna Elî Riza, Emînê Perîxanê di sala 1928an de ji Xoybûnê veqetiyên û Mehemed Şukrî Sekban jî paşê dev ji Xoybûnê berda û çû radestî Tirkîyê bû. Ev veqetandin û çûyînên wisan nexweş bêguman li ser Xoybûnê bandûreke neçê dihişt.

-Di sala 1930-î de binketina serhildana Araratê di nav Xoybûnê de bandûreke mezin nîşan da û bû

sedemekî bîntengiyê. Piştî vê bûyerê Xoybûn qels dibû.

-Tevgera serkirdayetiya Xoybûnê roj bi roj lawaz dibû. Bi taybetî piştî ko Xoybûn Dr.Kamîran ji nav xwe dûrxist, birayê wî Celadet Bedir-Xan jî ji ber vê yekê dev ji Xoybûnê berda.

-Peymana ko di nav Taşnaqan û Kurdan de hatibû imze kirin, ji 19 xalan pêk dihat. Bi taybetî xala 8an ya vê peymanê gelek balkêş e. `ji bo ko karên hevkarîyê baş bimeşin, yek ji nûnerên Taşnaqan di mercîn lazim de divê têkeve nav komîta merkezî ya Xoybûnê û di wir de kar bike`. Beşdarbûna kesekî din ji bo Xoybûnê bûye serêşîke mezin. Ev yeka tê wê wateyê ko rêxistina Taşnaq rasterast tevî karên Xoybûnê yên hundirîn bûye.Hin ji endamên Xoybûnê ew têkiliya bi taşnaqan re ne durist didîtin, û eşkere li dij derdiketin. Li gorî baweriya wan; destê Taşnaqan di Xoybûnê de pir dirêj e, sedem jî ev e; Kurdan li hemberî Taşnaqan xwe lawaz didîtin. Yê li dij van têkiliyan derdiketin ev bûn: O.Sebrî,

Memdûh Selîm, Şêx Ebdilrehmanê Garisî, û binemala Cemîl paşahwd.

6-Xoybûn bi bernameyên çalak û naveroka xwe di dîroka Kurdistanê de rêçeke çewa kola?

** Di baweriya min de, şopedîroka Xoybûnê bihewceyî gelek nivîsandin û lêkolîna ye. Ji hêlekê de, rêçeke tev bi xwîn, kuştin, wêrankirin, meşextkirin, nepêkanîna soz û peymanan, xapandin û girêdana bi dijmin ve...hwd? ji hêleke din ve qehremanî, têkoşîn û berxwedan, dilsozî, welatperwerî û şoreş e...hwd. Dîroka Kurdan gelek caran xwe bixwe vegerandiye. Lê mexabin gelê Kurd tu sûde ji wan serpêhatiyên negirtiye û her û her di wan şaşiyên xwe de berdewam e.

-Di pêşiya şoreşê de şaşiya sereke ev bû; têkilî, xwesipartin, girêdan û pêwendiyên bi rejîmên ku Kurdistan di nav wan de perçe bûye.

-Berî vexistina agirê şoreşê, pêwîst e pêkhatineke giştî û amadekirineke baş û demê pêwîst helbijêrin.

Mercên alîkariyê ji serketina şoreşê re divê peyda bibin.

-Pireya wan kesên bi avakirina Xoybûnê rabûbûn ji binemalên axa, beg, şêx, mele û berjiwaziya biçûk bûn. Dema berjewendiya wan têk çû, piştî xwe dan şoreşê. Serkirdayetiya derebegî û berjewazî û ya olî ji bo pêkanîna armancên neteweyî di riya serbestî û serxwebûnê de serneket. Biryarên şoreşê ji banî bin û ne ji binkeyeke şoreşgêrî bin, û hemû şoreşgêr di avakirina wê de ne hevpişk bin, wisa pêşkêşîya wê destikek ji girêdanên berjewendiya jor be, û ji bo çewsandina cemawerê gelek ji şoreşgêran be. Gava şoreşgêr têgiha ku armanca şoreşê şoreşgêr e, û şoreş ji bo xweşîya wî û ji bo pêşketina komel xebatê dike, bê guman hingê şoreş serdikeve.

8-3-2002

Hevpeyvîna Rojnameya Mîdya

bi Dilawerê ZENGÎ re

Ako Mihemed

***Komîta xelata Osman Sebrî bi çi rengî hate damezrandin?**

- Di pêşî de, ez ji dil û can spasiya xebata we dikim, her pêşketinê ji we re dixwazim, û hirmeta vê guhdana we li çûna min î bajarê Enqerê, ya ji bo dana xelata Osman Sebrî ji prof-Ismaîl Beşekçî re, digrim. Xebata we xebateke neteweyî ye. Her bijîn ji bo Kurd û Kurdistanê, hevalno.

Ji bo pirsê we, di roja 9-1-1998 an de şevêrkek ji aliyê hin wêjevan, rojnamevan, rewşenbîr, nivîskar, hunermend û ramyarên Kurd ve, li mala nemir Osman Sebrî, li bajarê Şamê hate girêdan, da ku bûyera buhartina (93)ê saliya ji dayikbûna helbestvan, zimanzan, wêjevan û xebatkarê Kurd Osman Sebrî were pîrozkirin, û avakirina şêwazekî

rûmetiyê ji bo kesayetiya Osman Sebrî bête gotûbêjkin.

Di wê şevînê de, ji hêla beşdarên, pêşniyaza damezrandina xelatekê bi navê (Xelata Osman Sebrî) hate kirin. Ev pêşniyaz jî ji tevan hate pejirandin. Pêşniyaz ew bû ko komîtekek ji heft kesan, bi serokatiya mamosta Dr. Cemal Nebez bête avakirin. Dema ko komîtê pêwendî bi Dr. Cemal Nebez re kir, ewî pêşniyaza me pejirand.

Ev xelat dê her sê salan carekê diyarî kesekî ne Kurd yê ko xizmet û xebatên hêja û giring di ber gelê Kurd de kiribe, çî di warê ziman, wêje û dîrokê de be, û çî di warê şaristanî, mirovatî û ramyariyê de be. Simbola xelatê jî ev e: (Xelata Osman Sebrî ji bo dostaniya gelan)e, xelat perçeyek ji zêr e, wêneya nemir Osman Sebrî di nîva wê xelatê de ye. Ev cara pêşîn e, ko xelatek bi vî rengî li nav gelê Kurd çêdibe.

***Hûn wek Komîta xelata Osman Sebrî we çima prof-İsmâîl Beşikçi helbijart?**

- Piştî danûstendinê, komîtê biryar da ko xelata xwe ya pêşîn pêşkêşî rewşenbîrê demoqrat û dostê gelê Kurd prof- İsmâil Beşîkçî bike. Çimkî ji biyaniyan ew yekem mirov e ko jiyana xwe tev ji bo doza gelê Kurd tixandiye. Bi dehê salan ji temenê xwe yê ciwan di girtîgeh û zindanên rejîma Turkan de bûrandiye. Tucarî prof-Î.Beşîkçî li hember hêrîş û çewtiyên îdyolociya desthilatên Turkiyê bê deng nemaye, li ber dadgehan bê dudilî piştgiriya doza me ya dadmend kirye. Bi dehê pertûkan û bi sedê gotar û lêkolînên zanistî li ser Kurd û Kurdsitanê nivîsîne.

Ew mirovekî ne xweperest û malperest e. bervedêrê pirsê Kurdî ye, xebata wî di ber pirsê gelê Kurd de ji baweriya wî bi dadmendiya vê dozê tê. Xwedî hizreke azad û pêşverû ye. Simbola aşî û demoqratîyê ye. piştgirê doza gelê Kurd e, xêrxwazê gelê xwe ye.

Lewra, me hêja dît ko em bi serbilindî û bi şanzî xelata xwe ya pêşîn pêşkêşî têkoşerê mirovperwer, dostê gelê Kurd mamoste prof- Î. Beşikçi bikin.

***Helwîstê dewleta Turk li hember çûna we bo Turkiyê çewa bû?**

- Wek hûn dizanin çûna welatekî mîna Turkiyê ko di rewş û rêdaneke awarte de dijî, wê ne bi hêsanî be. Em bawer bûn ko wê gelek kelem û nexweşî derkevin holê. Turkiyê welatekî mîna zindan û girtîgeheke dev kilîtkirî be. Her çûn û hatin divê dibin çavan re derbas bibe. Polîsên wan li her cih û li serê her kolan û sikakan çandî bûn. Lê, dema min berî dabû bajarê Enqerê min her tişt dabû ber çavan; girtin û zindan ne pir dûrî min bûn. Erk û sitûbariya di stiwê min de pir mezin bû. Ez du rojan li bajarê Enqerê mam bê ko bikaribim xwe bigihînim prof-Î.Beşikçi. Ne ko ji hatina min ne haydar bû. Lê belê, cihê ko ew lê dimîne dibin çavan de bû. Di roja sisiyan de, di riya HDPê re, me ew dît. Ez û mamoste wergêrê min mele Usmet bûn.

Piştî ko me bi hev re baş da û stend, û em li ser rewşa Kurdan paş axiftin, me xelata xwe pêşkêşî wî kir. Rengê dana xelatê jî bi rewşa nexweş ya Turkiyê û Kurdan ve girêdayî bû.

Li ser gotina hin heval û biraderên Kurd ko ez zû ji bajarê Enqerê derkevim. Bi derketina min re dîsa polîsan dabûn ser şopa min. Lê, bi zanîn me xwe riha kir. Ez û mele Usmet çûne bajarê Istenbolê, li wir, bi arîkariya ensîtûta Kurdî me kongirekî ragihandinê lidar xist. Gelek xwedyên kovar û rojnameyan beşdar bûn.

Rejîma Turkiyê ji tevgera xebatkarekî mîna prof-Î.Beşikçî ne razîne û ne cihê dilxweşiya wan e. Ez jî li ser navê komîta xelata Osman Sebrî ji bajarê Şamê çûme bajarê Enqerê ko wî xelat bikim. Ez bawerim rejîma Turk pir ji vî karî nerazî bû, lê bi alîkariya camêran karê me bi serket.

***Pêşwaziya prof-Ismaîl Beşikçî li we û xelatê çewa bû?**

-Wek hûn dizanin, ez li ser navê komîta xelata Osman Sebrî çûbûm, hayê prof-Î.Beşîkçî ji hatina min hebû. Berî çûna min bi demekê serokê komîta me Dr. Cemal Nebez birûskek jê re rêkiribû, di wê birûskê de pîroziya wî kir li ser derketina wî ji zindanê, û ew agahdarî vê çûna min kir. Vêcar, dema me hev dît, wî ciwanmêrî hirmetek pir mezin ji me re girt û bi dilxweşî û riwekî geş xelata me wergirt. Ez bawerim ji bo me tiştêkî pir mezin bû; berî vê xelata me tu xelat wernegirtibûn. Wek ez dizanim gelek xelat pêşkêşî wî bûn, lê wî ji ber pirsê gelê Kurd ew xelat negirtin. Wek nimûne: ji Yekîtiya nivîskarên Emrîkî, ji nivîskarên Elmanî, ji serokê komîta xelata (weqfa bêjeya serbest) (Fund for free expression) Gara lara Marîş di sala 1991ê de, lê bervedêrê mafê gelê Kurd prof-Î.Beşîkçî ji ber zordariya ko bi serê gelê Kurdistanê dibe, ev xelatên ha tev wernegirt. Wergirtina xelata me serketin û pêşvebirineke pir mezin e. Ev kar cihê pîroziyê ye, cihê serbilindî û şanaziyê ye.

***Li dema derketina prof- Î.Beşîkçî ta niha xwe xistiye nav bêdengiyê da, erê ew bêdengiyê ji egera bêhêvîbûnê ye, yan ji egera ne razîbûna wî ji neteweya Kurd, yan bi sedema egereka din e?**

-Bi rastî ev pirsîn di hindirê xwe de bersivin berfireh û pir bi şax û bax hildigre. Ez bawer im di hundirê hevpeyivîneke weha bi lez de têr nake. Lê, ezê bi kurtî bersivê bidim.

Tucarî bervedêrê gewre prof-Î.Beşîkçî ji doza neteweya Kurd û pirsê Kurdistanê bêhêvî nebûye û nabe jî. Ewqas zindan, girtîgeh, dadgeh, ceza û setemkariya desthilata Turkiyê qet nikaribûn rivîna agirê hest û wicdana wî li hemberî gelê me vemirînin, an vîna wî ji bo aşî û biratiya gelê Kurd û Turk bişkînin. Her wî xwe berpirs û bervedêrê mafê gelê Kurd dîtiye. Bi hizreke zanistî û serbest pirsê Kurd ya dadmend hilgirtiye ser mile xwe. Lewre ew tucarî ji mafê vî gelî bêhêvî nabe, û ji ya xwe nayê xwar. Lê di baweriya min de, ew jî mîna gelek kesan di hin nerînên xwe de, di hin tevgerên Kurdî û

serokê wan de şaş çû. Ew şaşiya wî jî ji mêldariya wî ya bê sînor ji siyaset û îdyolociya P.K.Kê re dihat. Ew bawerî û hêviyên wî yên li ser P.K.Kê hatibûn girêdan û bi taybetî di kesîniya Ocelan de, ne li cih derketin. Nemaze piştî girtina Ocelan ew şaşî linik wî pirtir zelal bû. Li gorî gotina wî ev bêdengiya wî bixwe nîşana nerazîbûnê ye. Lê, ew qet ji doza gelê Kurd bêhêvî nabe; ji ber ko mirovekî zana ye. Ez dibêjim bêdengiya wî lêvegerek ji qûnaxa bûrî re ye, bi mejiyekî meyaî rewşa bûrî dipêve û dinexîne. Ez bawerim di vî warî de, pirojeya amadekirina pertûkekê li ber destê wî heye.

Dibe mirov di hin nerîn û dîtînên xwe de, û bi taybetî di derbarê kesan de şaş here. Lê, mêraniya mezin ew e ko mirov li ser wan şaşiyên raweste û binirxîne. Ya prof-Î.Beşîkçî ev e ko gelek caran çavên xwe ji kêmasiyên tevgera Kurdî digirt, bi vê yekê dûrî nerîna rast û zanistiya xwe jî diket. Bêgûman, ne mirovekî berjewend, kêsbaz û pergîr bû. Armanca wî serketina doza gelê Kurd û Kurdistanê bû. Î.Beşîkçî

simbola azadî û aştiyê ye. Nîşana liberxwedana hêza tevgera azadîxwaza cîhanê ye.

Hêjayî gotinê ye, ko dema em li hev rûniştin û me bi hev re dan û stendin kir, ev gotin ji min re got: *(Xoce Dilawer, nivîskar û siyasetvanên we Kurdan dibêjin: Kurdistana Turka, Kurdistana Farisa, û kurdistana Ereba, kurdistana van tevan heye, lê ya Kurdan tune!!)*. Diyar e, gotina wî rast e. Em dibêjin: Kurdistana Îraqê û...,....., ya rast weha bêye gotin: Başûrî Kurdistan, bakurî Kurdistan, rojhilatî Kurdistan û rojavayî Kurdsitan.

*Rojnameya Mîdya, ya partiya (YNDK), Li Hewlêrê tê weşandin.

Hevpeyvîna Rojnama Roja Teze

bi Dilawerê ZENGÎ re²

Şair û nivîskarê Kurd Dilawerê ZENGÎ ji bo xelata Osman Sebrî bide Îsmâil Beşikçi hatibû Tirkîyê. Bi vê munasebetê me jî hin pirs li ser rewşa siyasî û çandî ya Kurdên Sûriyê jê kirin; û wî jî bersiva van pirsên me da. Ez bawer im, ku wê ev bersiv hin nuqtepirsên di serê we xwendevanên me yên hêja de ji navê rakin.

Yakûp Karademîr

***Rewşa tevgera Kurdî û xebatên çandî li Sûriyê çawa ye?**

- Li Sûriyê, dewlet îtîrafê bi hebûna me Kurdan nake, û tu mafên siyasî û çandî yên Kurdan tune ye. 200 hezar Kurdên me yên bê nifûs hene pêvî yên nehatine tomarkirin, erdê wan jî wan hatiye

² Rojnama Roja Teze-sal:2, hejmar:54. Dîrok: 21 Tîrmeha 2000. İstenbol-Turkiye.

sitendin. Ligel rêxistin û xebatên siyasî yên çandî û rewşenbîrî jî, ne fermî ne, qedexe ne, lê bi awayekî defakto dîsa jî dibin. Zor û tadeyiya li ser siyasetvanên Kurd, li ser nivîskar û hunermendên Kurd jî her berdewam e. Lê, li hember vê zilm û zorê jî berxwedanek heye, berxwedaneke pir berfireh ji aliyê nivîskar, siyasetvan û hunermendên Kurd ve, li dijî vê yekê heye. Piraniya nivîskarên me bi zimanê Kurdî dinivîsin, lê gelek zehmetiyê jî dibînin. Dewlet jî destvala nasekine astengiyan derdixe pêşiya wan. Weke li vir, li wir jî gava tu bi zimanê Erebî binivîstî hemi dezgehên dewletê li be te vekirî ne. Lê, em nivîskarên ku bi zimanê xwe dinivîsin ji hemû hêlan ve zehmetiyan dibînin. Wek çapkirin, belavkirin û..hd. Nifûsa Kurdan li Sûriyê ji sedî 11 ye. Ango nêzîkî 2 mîlyon Kurd li Sûriyê hene. Em dixwazin ku îtîraf bi hebûna mafê Kurdan bê kirin, zimanê wan bê serbestkirin, nifûsa xelkên bînfîs li wan vegere, erdên wan ên ku ji wan hatine stendin li wan vegerin. Em dixwazin, qanûn û rêdana partiyan, çapemenî û weşandina kovar û rojnameyan

derkeve. Hin weşanên ku derdikevin ne bi awayekî fermî ne, hemî bi nehînî derdikevin. Dewletê heta niha çavê xwe ji vê yekê re girtiye, û bi xurtayî li hemberî vê xebatê derneketiye, sedemên vê yekê pir in, lê ev nayê wê manê ku wê sibê jî li hemberî vê xebatê dernekeve. Di nav Kurdan de jî gelek nivîskarên ku ji alî raya giştî ve baş tên naskirin hene, û ev nasîna wan ji wan re bûye wek zirxeke parastinê.

***Ji cem me ve birêvebiriya Sûriyê, bi taybetî jî Hafîz Esed û niha kurê wî wek dostê tevgera Kurd û tevgerên şoreşger tê xwiyakirin. Gelo Kurdên Sûriyê doza çî dikin ku mafên wan ji alî vê birêvebiriyê ve nayên qebûlkirin?**

- Siyaseta Sûriyê jî, siyaseteke durû ye. Dema ku ji derve de piştgiriya hin partiyên me yê siyasî dike, ne ji ber ku wan weke dost qebûl dike, ji ber berjewendiyên xwe vî karî dike. Lê, tu dizanî di têkilî û îtîfaqên siyasî de, yê qels tim dikeve bin berjewendiya yê xwîrt. Gava tu weke rêxistinekê

têkiliyê bi dewletekê re dênî, tu yê têkevî xizmeta wê. Sûriyê gelek partiyên siyasî çî Kurd û çî ji milletên din xistine bin kontrola xwe û ji wan îstîfade kiriye. Gelek aloziyên wê bi rejîma Turkan re hene. Bi Kurdên nav xwe re hene. Ger Sûriyê welatekî pêşverû û demoqratîk baya, û bi mafê Kurdan re ba, çima wê pirsê Kurdên nav xwe çareser nekira? Em mafên gelê Kurd yên neteweyî di çarçewa yekîtiya welêt de dixwazin. Em azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan dixwazin. Em bang bi aşî û biratiya bi gelê Ereb re dixwazin. Em piştî Ereban neteweya didiwan in. Em dixwazin ku hebûna me di rêdan û qanûna bingehîn a dewleta Sûriyê de cih bigre. Li gorî hejmara me -2 mîlyon- di parlamentoya Sûriyê de bîna temsîlkerin. Herweha jî em dixwazin li her sê herêmên Kurdî; Çiyayê Kurmênc (Efrîn), Kaniya Ereban(kobanê) û herêma Cizîrê Kurd bixwe karûbarê xwe birêve bibin. Di vê qûnaxê de, tevgera Kurdî li Sûriyê weke gava pêşîn çareserkirina pirsê Kurdên bînefûs daye pêşiya karê xwe. Wek hûn dizanin li gorî serjimareya awarte ya ko li Cizîrê di

sala 1962an de bû, 200 hezar Kurd bê par man ji nifûsê, em bawerin hejmara wan pirtir dibe. Di sala 1973an de, zinara Erebî pêkanîn; erdên Kurdan ji wan sitendin û dane Erebên dora Ferat û Reqayê, û li ser erdên bav û bapîrên me, ew bicih kirin. Em dixwazin erdê wan Kurdên ku ji wan sitendin li wan vegehrîn, û Kurd vegehrin ser xaka bav û kalên xwe.

Ji aliye çandî ve jî, em dixwazin ku Kurd bi zimanê xwe perwerde bibin, mafê wan ê çapemeniya bi Kurdî hebe; pertûk, rojname û kovarên Kurdî hebin, bi zimanê Kurdî weşana radiyo (êzge) û televîzyonê (wêneguhêz)ê hebe. Em ketin sedsala 21-ê, li zanîngehên Sûriyê beşên edebiyat û zimanên Fransî, Ingilîzî û..hwd. hene, gelo guneh an jî ecêbe ku beşê ziman û edebiyata Kurdî jî hebe, ku zimanê 2 milyon hevvelatîyên Sûriyê ye.

***Li Başûr tevî ku bi salan e zimanê Kurdî serbest e, bûye zimanê perwerde û niha rewşeke fi'li serbixwe heye jî, dibêjin ji ber ku em nikarin ji Îraqê cihê bibin em nikarin dev ji alfabeya erebî jî**

berdin. Li Sûriyê jî zimanê resmî Erebi ye, û hûn jî naxwazin ji Sûriyê cihê bibin, hûn çima alfabeya Latînî tercîh dikin?

-Ez bawer im rewşa ne rewşa cidabûn û ne cidabûnê ye. Gelek sedem hene. Bi kurtî, rewşa Kurdên Başûr ji ber dubendiya navbera wan tê. Welatê xwe kirine du mîrekî (emaret); Ya Behdînan û ya Soran. Mîrekiya Soran qet qebûl nake ku Kurd tîpên Latînî bikar bînin, ne ku dewlet bûye asteng. Îro Kurdistan wek te gotî defakto serbixwe ye. Tu girêdana wan bi rêjîma Seddam re nîn e. Wek haydar im, bernameyên xwendinê hîn yên dema Seddam in, ne hatine guhertin. Ez bawer im biryareke siyasî ne biryareke zanistî ye, ango ne bi ziman û alfabeyan (Latînî-Erebî) ve girêdayî ye. Ji ber ko her kes dizane ko alfabeya Erebi têra zimanê Kurdî nake.

Nivîsandina Kurdî ya bi tîpên Latînî li binxetê-Sûriyê, bi xebata Bedirxaniyan, bi riya kovara Hawarê ya ko di sala 1932-an de dest bi weşana xwe kiriye, dest pê kiriye. Ew nakoniyên siyasî bandora

wan li ziman û xebata rewşenbîriyê tune mîna li Başûr; em Kurdên binxetê tev bi yek alfabeyê dinivîsin. Em di wê baweriyê de ne ko alfabeya zimanê Erebî têra zimanê me nake. Zimanê Kurdî zimanekî Hîndo-Ewrûpî ye, û li seraserê cîhanê tîpên Latîni tîpên bikaranîn, di vê em jî vê alfabeyê bikarbînin. Alfabeya Erebî ne li gor fonetîka zimanê Kurdî ye.

***Rewşa kar û xebata rewşenbîrî ya kurdên Sûriyê çawa ye? Gelo fersenda ku nivîskar û entelektuelên Kurd bîna cem hev û hin kom û sazîyan pêkbînin heye?**

-Mexabin, rewşa heyî fersendeke wiha nade me; ne di warê siyasî û ne jî di warê çandî de. Di warê siyasî de, bi awayekî nehîni hin partî û rêxistin bi hev re (hevbendî) çêkirin, lê bi awayekî giştî tevgera Kurdî ne li ser hev e. Ev rewş bandora xwe li tevgera çandî, ya nivîskar û entelektuelên Kurd jî dike. Ji ber ko em ne xwedî desthilat in, xebatên çandî û rewşenbîrî jî di riya partiyên siyasî re dibe, rewşa

siyasî ya perçebûyî bandora xwe li ser rewşa çandî jî dike, û xebatên derveyî viyana wan dibin, pûç dikin û ne dihêlin here serî. Tu çapemeniyên aza û serbest nîn in. Ev jî derdekî giran e. Em bi hewceyî dezgehî rewşên bêrî ne. Di sala 1993an de, bi boneya mirina seydayê Cegerxwîn di 22ê meha 10an de, ev roj bi roja helbesta Kurdî li Sûriyê hate binavkirin. Ev kar ne bi destê partiyên Kurdî hate kirin; ji ber vê destê xwe dirêjî vî karî kirin, û ew beravêtî kirin. Her partiyek ji partiyên me vê çalakiyê ber bi xwe ve dikşînin. Mexabin dawîya dawî tarûmar kirin. Wek hûn dizanin dewlet ne bi avakirina tu dezgehî re ye. Vêca emê çewa karûbarê xwe pêşve bibin. Lê emê jî her hanbidin ku tiştêkî di vî warî de bikin.

***Tu niha ji bo xelateke ku li ser navê têkoşer, şair û zimannasê Kurd Osman Sebrî hatiye amadekirin bidî lêkolîner û civatnasê bi nav û deng Îsmail Beşikçi, li ser daxwaza 60 nivîskarî hatiye Tirkiyê. Hûn çawa karibûn bihata ba hev û we çawa biryareke wiha da?**

-Di 9ê meha 1ê sala 1998an de, em li Şamê, li mala birêz Osman Sebrî ji bo boneya 93ê saliya ji dayikbûna wî gelek nivîskar, siyasetvan û rojnamevan ji hemû herêmên Kurdî civiyan û me semînerek pêk anî. Li ser pêşniyarekê me komîteyek ji bo rêzlêgirtina têkoşîn û xebata siyasî ya birêz Osman Sebrî, ku yekemîn kesê bûye sebebê avakirina partiyê siyasî li Sûriyê û gelek xebatên çandî jî kirine û avakirine. Herweha jî me ji bo vê yekê biryara ku em ji her sê salan carekê xelatekê li ser navê wî bidin kesekî ne Kurd, ku ji bo Kurdan xizmet kiriye û cefa kişandiye. Komîta me jî xwest pêwendiyê bi nivîskarên hemî beşên Kurdistanê re dêne, û bi vê bîr û baweriyê Dr. Cemal Nebez ji xwe re weke serok hilbijart. Komît jî bi navê (Komîta Xelata Osman Sebrî) hate binavkirin.

***Îsmâil Beşîkçî heta niha tu xelat qebûl nekiribûn, çima xelata we qebûl kir?**

-Ez li ser navê Komîta Xelata Osman Sebrî hatim xelatê pêşkêşî birêz Î. Beşîkçî bikim. Wek hûn dizanin

Î.Beşikçi yekemîn kesê biyanî ye, ku gelek zor û cefa ji bo doza Kurdî kişandiye, û bi dehê salan ketiye zindanan, û gelek pirtûk û lêkolîn nivîsandine. Lewre, me xwest em xelata xwe ya pêşîn bidin wî. Mirovekî demokrat, zana û mêrxasekî bê hempa ye. Bervedêrê pîrsa Kurdî ye. Gava me di sala 99an de biryara ku emê xelata xwe ya pêşîn bidin wî wergirt, ew di zindanê de bû. Dema ku Î.Beşikçi ji zindanê derket serokê komîta me birêz C.Nebez jê re birûskeke pîrozbahiyê rêkir û div ê birûskê de got ku me biryareke wiha wergirtiye, û di demeke nêzîk de wê hevalek bê xelateke wiha pêşkêşî te bike. Wek te jî got gelek kesan, nivîskarên Amerîkî, yên Almanî, yên Swêdî û hîn gelekên din xelat danê, lê wî xelata kesekî negirtibû. Di destpêkê de, ji me re jî got:(Her çend hurmeta min ji xebat û têkoçîna Osman Sebrî re hebe jî, min heta niha xelata kesî negirtiye). Li ser vê yekê min jê re got:(Xebata te hemî di ber Kurdan de ye, ger tu vê xelatê wernegrî, tu yê dilê gelê Kurd ji xwe bihêlî, bêşînî. Em bi vê xelata sembolîk, heskirina gelê Kurd pêşkêşî te dikin, divê tu dilê wan

neşkînî). Li ser vê gotina min, ciwanmêr xelat girt û em jî gelekî kêfxweş bûn. Ev ji bo me cihê şanaziyê ye, ku Kurd cara yekemîn e xelatekê didin, û Î. Beşikçi jî cara yekemîn e xelata me werdigire.

***Bi sala ye tu jî li ser zimanê Kurdî dixebitî, pirsra hebûna zaravayên cihê di her zimanî de tiştêkî normal e. Lê ferqa di navbera zaravayên zimanê Kurdî de, gihaştiye wê derecê ku hin dikarin bibêjin zaravayê kurmancî (Zazakî-Dimilî) zimanekî serbixwe ye, ne Kurdî ye. Bi te nêzikîhevkirina zaravayên zimanê Kurdî bi çi awayî mumkun e?**

-Helbet wek di her zimanî de zaravayên cihê hene, di zimanê Kurdî de jî hebûna zaravayên cihê tiştêkî xweberî ye. Ferq û cudatiya kûr a di navbera zaravayan de ji ber xweberî û coxrafya Kurdistanê ya çiyayî tê, ya çem û golên avê tê, lê koka ziman yek e; ji ber yek millet e, yek neteweye, li ser yek xakê ye. Li seran-serî Kurdistanê piraniya Kurdan bi zaravayê Kurmancî (ya jorîn) dipeyivin. Dijminên me jî, di her fersendê de dixwazin vê cudatiyê kûrtir bikin û wek

coxrafya me, ziman û çanda me jî perçe bikin, me ji hev tarûmar kin. Weke mînak zaravayê kurmanciya jêrîn (Sorani) di warê nivîsandinê de nû ye, ne kevn e û kesên ku pê daxivin jî kêm in, li gorî hejmara Kurdên jorîn, lê li Başûr bûye zimanê fermî yê herêma Kurdistanê. Ta bi demekê ev herdû zarava ji hev fam nedikirin. Piştî têkilî, danûstendin, çûnûhatin ew sînorên herêmî yên zaravayan hilweşiyar û roj bi roj pirtir ji hev fam kirin. Nemaze piştî şoreşa ragehandinê, çapemenî, êzge, televîzyon û Enternêt...hwd. Wek çewa ne yekîtiya alfabeya Kurdî aloz û kelem e li pêşiya zimanê nivîskî, weharengê belavbûna zaravayan keleme li pêşiya zimanekî yekgirtî. Pêwîst e yekîtiya zaravayan, ji bo zimanekî yekgirtî pêk bînin. Ji bo vê jî, hin dezgehên zanistî bêne avakirin û îro berî sibe bi vî karî rabin. Ez bi xwe ne bi raya ku heta Kurdistan azad nebe em nikarin di warê çandî û ziman de tiştekî bikin. Li gorî baweriya min zaravayê herî berfireh ê kurmanciya (jorîn)e, divê ew bibe bingeha zimanê yekgirtî. Bi mirovên pespor, zana, zimanzan û xwediyên ziman

ev kar bibe. Ne karê partî û rêxistinên siyasî ye, ko her partiyek ji wan civîn û konfiransan di bin navê (ziman) de lidar dixin, tenê heval û dostên xwe vexwendî van civatan dikin. Ez bawer im ew kesên vexwendî vê civatê bûne nizanin zimanê xwe jî bi Kurdî binivîsin. Bêgûman, armanca wan ne ziman e, tenê propaganda partîtiya wan e.

Div ê em jibîr nekin gelek ziman mirin û wenda bûn, lê zimanê Kurdî ji ber resenî û dewlemen-diya xwe, li hember hemî zoriyan heta îro hatiye. Zimanê Kurdî xwe bi xwe avadike, ji du peyvan peyvek nuh pêk tîne. Wek Mîr Celadet gotiye: zimanê Kurmancî zimanekî hevedûdanî ye.

***Tevî ku zaravayê Kurmanciya Jorîn zaravayê herî berfirehe jî, ger em fersendê nedin zaravayên biçûk ku pêvajoya hebûna xwe tamam bikin, em ê neheqiyê li wan nekin û zerarê nedin zimanê xwe?**

-Di zimanê Îngilîzî, yê Erebî, û...hwd de jî wiha ye; devok û zaravayên cihê hene, lê zimanê xwendin û nivîsandinê yek e. Gava tu zimanê Kurdî bi zimanê

Erebî re yan zimanên din re bidî berhev, problemên zimanê Kurdî pir hindik in, û ji hêla zaravayan de zaravayên hemû miletan ji yên Kurdan bi gelekî pirtir in. wek nemûne, di nav Ereban de, zimanê Qur'anê zimanê xwendin û nivîsandinê ye. Lê, ji hêla zaravayan de, Erebiya her welatekî li aliyekî, yên Mexribî, yên Tunisî, yên Mesrî, yên Libnanî... hwd. Qet ji hev fam nakin. Tu dibê her zaravayek ji van zimanek serbixwe ye. Ta bi yên herêmî û navçeya welatekî mina Sûriyê, ya Şamî, Helebî, Dêrî û Beravî ji hev cihê ye.

Helbet gava ez vê dibêjim divê ziman bibe zimanê perwerde û bi awayekî akademîk yekîtiya ziman pêk bê, ne ko em tenê zaravayê kurmancî bigrin û yên dî hemiyar ji ser rûyê erdê winda bikin. Ev qet ne gotineke zanistî ye. Ez xwediyê wê baweriyê me ko pirbûna zaravayan dewlemandî û resenbûna wî gelî nîşan dide. Lê divê, ji me tê xwestin em bi yek alfaba, bi yek zimanî, bi yek biryarê mijûl bibin. Tu dizanî berê zimanê Osmanî ji gelek zimanan pêk

dihat; Kurdî, Erebi, Farisî, Latîni..hwd, û bi alfabeya Erebi dihate nivîsîn.

Vêca, Atatürk bi yek biryarê ne tenê alfabeya Latîni bikaranî, belê zimanekî nuh, modêrin di riya hin zimanzanên biyanî re saz kir, û di riya dibistan û dezgehên dewletê re xelkên xwe perwerdeyî vî zimanê nuh yê çêkirî kirin. Di koka xwe de zimanê wan ne yekziman bû. Îro, nifşên Turkên nuh bi zimanê Osmanî qet nizanin û ne dikarin wan tîpan bixwînin. Lewra, ew ji wê dîrokê qut bûne. Akama min ji vê serpêhatiyê ne ji navê rakirina zaravayan e, avakirina zimanekî yekgirtî ji zaravayên heyî ye. Pêwîst e em xwedî li zaravayên xwe derkevin û pêş de bibe. Pêşketina wan wê bide hêz û qewet ji yekzimanî re. Di vî warî de, ligel zanîngeh û dibistanan, rolekê mezin ê çapemeniyê jî heye, û divê ew jî vê rola xwe bilîzin.

***Tevgera me ya siyasî, bi taybetî jî li Turkiyê gelek caran zimanê Turkî bikar tîne û pê weşanên xwe derdixe, li perçeyên din jî bi Erebi û Farisî gelek**

xebat dibin. Lê, min bihîstiye li Sûriyê, ji bo ku tu bibî endamê partiyekê, pêşîn divê tu bi Kurdî û bi tîpên Latîni zanibî bixwînî û binivîsînî. Ev ferq ji ber çi tê?

-Li gorî baweriya min, divê li her beşekî Kurdistanê hemî weşanên bingehîn bi zimanê Kurdî bin, û ji bo propaganda, an danasîna civata Kurd; di warê ramiyarî, çandî, civakî...hwd. Ji bo biyaniyan bêne wergerandin zimanên din. Divê xebata me ya sereke bi zimanê me be. Li hember asîmlasyonê, teknolojiya pêşketî ya ku dewletên dagîrker pêk tînin, divê em jî li zimanê xwe xwedî derkevin û wî ji van êrîşan biparêzin da ku wenda nebe, ne ku em jî avê li aşê dijmin kin û zimanê xwe bidin jibîrkirin. Ez dibêjim televîzyon mêvanekî rûşûştî ye, bêyî ku îznê ji meriv bistîne derbasî malan dibe. Ne wek kovar û rojnaman e, ji 7 heta 70 salî bandorê li herkesî dike.

Rast e, li Sûriyê partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd ev biryar li nik wê heye. Di baweriya min de ev jî ji ber hestê erk û stûbariya li nik wan hevalên wê

partiyê tê. Ji pêwîstî û hewcedariya bi zimanê bav û kalan tê. Parastina ziman ji parastiya nasnameya neteweyî ve tê girêdan. Lewre, ziman nasnameya gela ye.

***Ji xeynî televîzyonên herêmî yên li başûr, îro sê televîzyonên ku bi alîkariya satelîtê weşanê dikin hene. Tu weşana van televîzyona çawa dibînî?**

- Televîzyon (wêneguhêz) weke kêra du dev e, ger tu wê bi zanebûn bikarnênî, tu yê xwe jî pê bêşînî. Ez weşana televîzyonên Kurdî yên ku ciyekî pir mezin didin weşanên bi zimanê biyanî baş nabînim.

Nemûne Medya TV. Beşekî ji wî wextê xwe yê zêrîn û dêrîn dide zimanê Turkî yan Erebî, yan jî zimanên din... Ez ne bi vê yekê re me, hin nûçeyên giring ên ku tu pê karibî hin mesajan bidî miletên din ne tê, divê weşana xwe hemî bi Kurdî bike. Divê em bi Kurdî bixwînin, binivîsînin, bijîn û bi Kurdî jî bimirin.

Mixabin, televîzyonên me yên bi riya satellite weşanê dikin jî herêmî ne. Çawa, siyaseta danîna

wan û programên wan herêmî ne, zimanê wan jî herêmî ye. Mesela televîzyona Kurdistan.TV, KURDsate jî heta niha tu bername li ser Kurdên Sûriyê û yê beşên din belav nekirne. Bi erk û stubariya xwe ya dîrokî wek netewe ranebûne.

***Mesaja te ya dawîn?**

-Ji bo vê fersendê sipas û bi hêviya ku hûn li pêşerojê bêtir cih bidin zimanê Kurdî. Herweha jî, ez hêvî dikim ku girêdanek di navbera xebatên çandî yê li beşên cihê de hebe û em ji hev agahdar bin. Dîsa bi hêviya ku em rê nedin sînorên heyî wek coxrafya me, çanda me jî perçe nebe...

*Rojnameya Roja Teze-sal:2, hejmar:54,-21-Tîrmeha 2000-Turkiye-Istenbol.

Bibona wergirtina Prof. Î.Beşikçi

Xelata Osman Sebrî

Hevpeyvîna kovara Pirsê

bi Dilawerê Zengî re³

Prof. Îsmâil Beşikçi:

Di sala 1939-an de, li bajarokê Îsklîpê (Tirkîyê) ji dayik bûye. Xwendina xwe, ya seretayî û navîn li wir kuta kiriye. Piştî ew di sala 1962-an de fakulta zanistiyên ranyarî li Erzeromê diqedîne.

Leşkeriya xwe di du gundên Kurdistanê -Bedlîs û Hekarê- de dike. Li van herdu bajarên Kurdan, wî demên xwe vala derbaz nekirine, rewşa gundiyan, çanda Kurdan pir ji PROF. Î.Beşikçi re balkêş û hewaskar bûne. Şûnmayîna hemû aliyên jiyana Kurdan ji nêzîk ve naskiribû, û bi êş û derdên Kurdan re dibû hevpar.

³ Kovara Pirs- Hejmar: (20), Sal: (7), zivistana 2000. Sûriye.

Di sala 1964-an de, pileya doktriyê di civatnasiyê de, li ser pirtûka xwe (Eşîra Elîkan ya koçer) wergirt.

Ji ber ku Prof.Î.Beşikçi li ser Kurdan lêkolîna xwe didomand, ew di sala 1969-an de, ji zanîngehê tê qewitandin, lê dîsan, ew di sala 1971-ê de, di fakulta rêzaniyê de, li Enqerê dibe mamoste, lê vêcarê ji ber xebatên xwe yên zanistî, derbarê gelê Kurd, tê girtin, û 13 salan ceza dixwe, lê li gor biryara bexşandina giştî, ew azad dibe.

Di sala 1979-an de, ji bo berhemin nû li ser Kurdan diweşîne tê girtin, û di 12-ê Nîsana 1980-î de serbest dibe.

Girtina wî, bandorek mezin li raya giştî kiribû, lewre, rêxistina (Emnestî Internasyonal) yekîtiya nivîskarên Siwêdî, Nerwêcê û Holandayê nikarî-bûn bêdeng bimana, û karbidestên tirkîyê pirotêst kirin. Ji ber vê jî, dîsa polîsan ew di 30-ê Tîrmeha 1981-ê de girtin, û ew ta sala 1987-an, di girtîgehê de dimîne.

Di navbera 1970-1990-ê de, Prof.Î.Beşikçi li derdora (13) salan di zindanan de xew dike, û 27 caran-ji ber Kurdan ve- de'we lê hatine vekirin.

Di 14.08.1980-ê de, ji zindanê, nameyek dirêj ji UNESCO (Yonêsko) re dişîne, û tê de ramanên M.Atatork û destlatên Tirkîyê, yên dijî Kurd û Kurdistanê, gelek bi ferehî û kûr dicersîne, her weha jî tê de bervedêreke zanistî û rêzanî ji ber gelê Kurd ve dike.

Di 9ê Şibata 1993an de, dadgeha parastina dewletê li Enqerê, bi sedema (13)ê lêkolînên wî li ser Kurdan, bi (26)Milyar Lîre ceza dike.

Di sala 1993an de, ji bo gotarekê (Jina Kurd û girîla) li dora (12) mehan dikeve zindanê.

Ji sala 1962-1999an de li dora bîst (20)salan ketiye zindanê.

Bi bona wergirtina Prof.Î.Beşikçi xelata Osman Sebrî, kovara **Pirsê** ev hevpeyvîn bi **Dilawerê ZENGÎ** re çêkir:

1-Birayê Dilawer, em dixwazin tu hinekî ji me re li ser vê xelatê bipeyivî, kengî çêbû, û armanca wê çiyê?

-Di destpêkê de, ez pir sipasiya we dikim, û hêviya pêşketinê ji karê we re dixwazim. Di 09.01.1998an de, sêminerek ji aliyê hin wêjevan, rojnamevan, rewşenbîr, nivîskar û hunermendên Kurd ve, li mala nemir Osman Sebrî, li bajarê Şamê pêk hat, da ku bûyera buhartina 93ê salan di ser roja bûyînê re, ya helbestvan, wêjevan, zimanzan û xebatkarê Kurd Osman Sebrî careke din were pîrozkirin, û avakirina şêwazekî rûmetiye ji bo kesayetiya Osman Sebrî bête gotûbêjkirin.

Pêşniyaza damezrandina xelatekê bi nave (xelata Osman Sebrî) yê nemir hat kirin. Ev pêşniyaz ji hemû beşdarên û rêvebirên şevînê hate pejirandin û biryar hate standin, komîtekek ji heft kesan, bi serokatiya Dr. Cemal Nebez bête avakirin. Dema ko komîtê pêwendî bi Dr. Cemal Nebez re, li Berlînê kir, ewî

pêşniyaza me zor sipas kir û amadebûna xwe ji bo vî karê pîroz diyarkir.

Ev xelat dê her sê salan carekê ji bo kesekî ne Kurd were pêşkêşkirin, yê ko xizmet û xebatên hêja û giring ji bo gelê Kurd, di warê ziman, wêje, dîrok, huner, şaristanî, polîtîk yan mirovatîyê de kirine.

Xelata me perçeyek zêr e, wêneya nemir Osman Sebrî û sîmbolek (**Xelata Osman Sebrî ji bo Dostaniya Gelan**) li ser e.

2-Çima we Îsmâil Beşikçi hîlbijart weku yekemîn kes vê xelatê wergire?

-Piştî şêwir û danûstendineke dûr û dirêj, komîta me, hêja dît, ko bi şanazî xelata xwe ya pêşîn pêşkêşî rewşenbîrê demoqrat û dostê gelê Kurd Prof.Î. Beşikçi bike. Çimkî ji biyaniyan, ew yekemîn mirov e, ko jiyana xwe, ji bo azadiya gelê Kurd û Kurdistanê terxandîye, û ji bo doza me, ya dadmend, gelek sal ji temenê xwe di girtîgehên destlata nijadperest de, bi pêdarî derbas dike. Tucarî Prof.Î.Beşikçi li hember

hêrîş û çewtiyên Îdyolociya destlatên Turkiyê bêdeng nemaye, di zindan û dadgehan de, bê dudilî nemaye, û herdem ala peyva rastgo radike. Bi dehê lêkolîn û pertûkên zanistî li ser pîrsa Kurd û Kurdistanê nivîsîne û dinivîse. Kar û xebata Prof.Î. Beşikçi di ber pîrsa Kurd û Kurdistanê de, ne ji bo berjewendiyê kesayetî an deraviyê ye. Piştgirê doza gelê Kurd, xêrxwazê gelê xwe ye.

Lewra jî, me hêja dîtiye ko em bi serbilindî xelata xwe ya pêşîn pêşkêşî têkoşerê mirovper-wer, yê nasdar, û dostê gelê Kurd Prof. Î.Beşikçi bikin.

3-Wek hatiye naskirin, Prof. Î.Beşikçi xelat ji tu kesî wernegirtiye, baş e, çilo ev xelat ji we wergirt?

-Wek we got, berî vê xelatê Prof.Î.Beşikçi xelat ji tu kesî wernegirtiye. Ev xelata pêşîn e, ko werdigre.

Berî niha, xelatek ji komîta yekîtiya nivîskarên Emrîkiyan, digel pereyekî pir (şêkekî vekirî) diyarî wî hat kirin. Lê berêz Prof. Î.Beşikçi ev xelat nepejirand. Bersiva wî ev bû:(*Hûn piştgiriya gelê Kurd nakin, û*

dewleta we dostaniya rijîmên zorkar dike, ew diyariya we ji pereyê vê dewletê ye).

Xelateke dî ji hêla rewşenbîr û nivîskarên Elmanan pêşkêşî wî bû. Lê ew jî ji ber rewşa me Kurdan nepejirand û got: *(Ez xelata we wernagirim, ji ber, hûn alîkariya rijîma Turkiyê bi çekan dikin. Rijîma Turkiyê jî bi wan çekan li Kurdan dix).*

Xelateke din ji hêla serokê komîta (Weqfa Bêjeya Serbest) 'Fund for free expression' Gara Lara Marîş, di sala 1991ê de, pêşkêşî wî hate kirin. Lê, bervedêrê mafê gelê Kurd, Prof. Î.Beşikçî ew jî ji ber zordariya, ko li gelê Kurd dibe nepejirand.

Xelata me, xelata pêşîn e, ko Prof. Î.Beşikçî werdigre û dipejirîne. Ev jî ji bo me û ji bo doza gelê me serketineke pir pîroz û mezin e.

Birastî, dema me xelata xwe pêşkêşî wî kir, bersiva wî ya pêşîn ev bû: *(Min biryar daye, ko tu xelatan wernegirim, ez pir hirmeta xebata mamoste Osman Sebrî digrim û vê gava we pîroz dikim. Lê, tu*

diyariyan wernagirim). Min lê vegerand: (Ez benî! Ya me xelat e, ne diyarî ye. Ev cara pêşî ye, ko bi navê xebatkar û nivîskarekî Kurdan xelatek weha çê dibe, û tu yekemîn mirovê biyanî ye, ko di ber pirsê gelê Kurd û Kurdistanê de êşiya ye, û pir cefakêşî, dijwarî û zor dîtiye. Em pir hirmeta vê xebata te digrin, û di riya vê xelatê re, em dixwazin vê rêzgirtin û heskirina xwe ji te re diyar bikin, û tu kesî pêvî te hêjayî vê xelata xwe yî pêşîn nabînin. Tu di dilê gelê Kurd de ye. Heger tu naxwazî xelata me wergirî, tê dilê gelê Kurd bihêlî, heger ev yekan li te hêsan be, xelata me wernegre).

Birastî, piştî min gotina xwe birî, bi riwekî geş û dilekî şa bersiva min da û got: *(Ez xelata we werdigirim, û bi dilekî şa dipejirînim. Ez her serkeftin û pêşveçûnê ji we re dixwazim. Karê we, karekî pîroz e. spas ji we re, û silavên min bigehîne hevalên xwe).*

4-Kak Dilawer, cara yekemîn e tu bi Prof. Î.Beşikçi re rûdinê, tu çi dikarî ji me re li ser kesayetiya wî bipeyivî?

-Dema komîtê ez dame pêş, û ji min xwestin ko xelatê bigînim destê Prof.Î.Beşikçi, birastî ez pir şa bûm û min xwe bextewar dît. Lê, ya hîn bi min xweştir, dema xelat ji destê min wergirt. Ew roj, ji bo min, rojeke dîrokî bû. Ji ber wê dîtîne serbilind im.

Prof.Î.Beşikçi lêkolînav, nivîskar, peya û zanayekî zanistî ye. Yekemîn mirovê biyanî ye, ko jiyana xwe ji bo doza Kurd û Kurdistanê terxandîye. Ji sala 1962-an ta bi sala 1999-an, li dora bîst salan di girtîgehên destlatên Turkiyê de girtî maye. Bi bîstên pertûkên zanistî û gotarên hêja li ser pîrsa gelê Kurd û welatê wan Kurdistanê nivîsiye.

Mirovekî pir xwedî bawer û rastgo ye. Rûgeş, zimanxweş, kêmpêyv, dilovan, nerm û pir zelal e. Tiştê di dilan de, di çavan de diyar in. Ew çavên zer, mizgîniya pêşerojê tê de dibînim. Rûken û şabûna zarokên sade, perîşan û xizan tê de diyar in. kovan û derdên gelê Kurd di keser û peyva wî re agadar dibim. Mirovekî demoqrat û aştxwaz e. Bi hizr û hişê xwe, can û dilê xwe, bervedêrê pîrsa gelê Kurd

û Kurdistanê ye. Mirovekî pir mêrxas û dilsoz e. Em gelê Kurd, deyndarê vî lehengî ne. Bila diya wî ya Turk serbilind be, ko mirovekî mina wî aniye.

5-Di danûstendina te bi Prof.Î.Beşikçi re nerîna wî li ser Kurdên Sûriyê çi bû?

-Ez bawer im mirovekî mîna Prof.Î.Beşikçi ne dûrî rewşa gelê Kurd û Kurdistanê ye. Lê tiştê balkêş, pireya Kurdên bakur, wêneyeke şaş û nerast li ser rewşa Kurdên me wergirtine; ko em li welatê xwe azad û serbest dijîn. Tu êş û derdên me tune ne. Rijîm ji me re baş e. daxwaz, xwestek û mafên me parastî ne. Birastî, ev nerîna şaş ne ji ber xwe ve hatiye, û ne jî dijminê gelê Kurd belav kiriye. Mexabin ew partiyên ko têkilî û girêdanên wan bi rijîma Sûriyê re hene, heta ji wan hatiye, ew bêbextî û nîfaq kirine, û di nav Kurdên bakur de belavkirine. Ev jî tişteki pir xerab e. Prof.Î.Beşikçi hayê wî ji rewşa me hebû, lê gelek tişt jê ne zelal bûn. Gelek tiştên şaş jî jê re hatibûn gotin. Lê, ez bawer im hayê wî ji wan munafiqan hebû.

Di dawiya danûstendina me de, min jêre got: *(Berî demekê, pirtûka te (Kurdistan mêtinge-heke navnetewîye) bi zimanê Erebi li nik me (Sûriyê) belav bû. Cihê şanaziyê bû. Lê, gazinek me heye, tu di pirtûka xwe de, li ser rewşa me bi firehî nepeyivî ye. Pir bi kurtî di ser pîrsa me re derbas bûyî).* Bi riwekî xweş girnîjî û got: *(Dema min ew pirtûk nivîsî, min weha dizanî bû. Lê, ez sozê didim, di rojên bê de, bi renekî fireh, ezê li ser rewşa we binivîsînim).*

6-Pêwendiyên Prof.Î.Beşikçi bi nivîskarên Kurd û Turk re çewa ne?

-Ez bawer im, wê pêwendiyên Prof.Î.Beşikçi bi hemû nivîskarên Kurdan re xweş bin. Beşikçi cihê rêzgirtina her kesî ye. Lê, pêwendiyên wî û hin nivîskarên Turkan wê ne cihê xweşiyê bin. Ji ber ko nivîskarên mina Prof.Î.Beşikçi azad û serbest, pir di nav Turkan de kê in, heger em nebêjin tune ne. Li gorî baweriya min, her kesê dostê gelê Kurd be, demoqrat û aştîxwaz be, wê hevalbendê wî be. Li vir ez dixwazim bûyerek di navbera wî û çîroknivîs Ezîz

Nisîn de çêbibû bibêjim: (Di kongirekî ji kongirên nivîskarên Turkan de, Prof.Î.Beşikçi gotinekê li wir dixwîne, û di wê gotinê de, pirsê gelê Kurd dide pêş. Çîroknivîs Ezîz Nisîn li hember radibe û jê re dibêje: *(Beşikçi çima tu her carê pirsê Kurdan tînî zimên, diyare tu nokerê Ingilîza yî!!)*. Prof.Î.Beşikçi lê vegerand û got: *(li hemberî rijîma zorker, ez bervedêrê gelê bindestim, lê tu li hember gelê Kurd yê bindest, bervedêrê rijîma zorkarî. Vêca tu noker î yan ez)*.

7-Dema ku te xelat pêşkêşî Prof.Î.Beşikçi kir, tu çawa dikarî, ji me re, li ser rojname û kovaran bi peyivî, yê ko beşdarbûn ji bo belavkirina vê bûyerê?

-Wek hûn dizanin, Prof.Î.Beşikçi, ji demek ne dûr, ji zindanê derketiye. Lê ew bi xwe, ji girtiya ye. Dibin çavê polîs de ye. Jiyana wî ne serbest û azad e. Ji hêleke din, ew dused sal ceza li ser heye. Vêca, dema min xelat li bajarê Enqerê pêşkêşî wî kir, me

nikarîbû xwediyê kovar û rojnameyan başdarî wî cihê bikra. Di rewşeke awarte de dijiya.

Li bajarê Istenbolê rûniştineke rageyandî hate girêdan, gelek kovar û rojname, nivîskar û rewşenbîr beşdar bûn, û hevpeyvîn û dîtin li ser xelatê bi min re çêkirin.

Bi rastî, hemû kovar û rojnameyan guhdaneke pir mezin dane vî karê me, û pireya nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanên Kurdan rêzgirtina xwe ji karê me re diyar kirin. Bi navê xwediyê kovar û rojnameyan, rewşenbîr û siyasetvanan gelek birûskên pîroznameyê ji Prof.Î.Beşikçî re rêkirin.Ji wan kovar û rojnameyan ko hevpeyvîn bi min re çê kirin û beşdar bûn:

-Rojnameya 2000yenî gundem. Rojnameya Roja Teze. Rojnameya Azadiya welat. Kovara Jiyana Rewşen. Kovara Zend. Kovara Nûbuhar. Rojnameya Pîne....hwd.

Min gelek dîtin û rûniştin bi xwediyên dezgehên Kurdî re çêkirin, ji wan:

Serokê Ensêtûta Kurdî li Istenbolê. Cîgirê serokê HDPê. Seroka Navenda Çanda Kurdî li Istenbolê. Nûnerê Weqfa Kurdî....hwd. Digel dîtina çend nivîskar û rewşenbîrên Kurd, ji wan:Mele Ebdulla Varlî, Feqe Husên, Mele Îsmet, Mele Reşîd, Mele Ebdirehman, Mele Silêman, Mele Ehmed, Hesên Kaya, Salihê Kevirbirî, mamoste Selah, nivîskar Mihemed, nivîskar Yaqûb karademîr, mamoste Xenî bavê Şoreş, mamoste û lêkolîner Malmîsanij û Gulbuhar Bedir-Xan... hwd.

Di riya kovara we re, hêja ye, ko ez spasiya van biraderan tevan bikim û bi taybetî Mele Îsmet, ji ber ew pir bi min re westiya, û ji bo min pir zor û dijwarî dît. Li hêleke din, wî karê wergêriyê di navbera min û Prof.Î.Beşikçi de, xweş dikir.

8-Baş e, kak Dilawer, di serdana te de li Kurdistanê bakur, em dixwazin tu hinekî li ser tevgera rewşenbîrî ya Kurdan bipeyivî?

-Wek hûn dizanin, ta bi vê rojê, rijîma destlatên Turkiyê li serê xwe siwar e, û bi hebûna Kurdan û Kurdistanê rûneniştine. Rewşa gelê Kurd bi şêweyekî awarte derbas dibe. Her tiştê bi navê Kurdan qedexe ye. Rewşa tevgera rewşenbîriya Kurdan jî bi rewşa tevgera ramyariyê ve girêdayî ye.

Di roja îro de, û ji bo birêketina dewleta Turkiyê bi karwanê Ewropiyan re, jê tê xwestin hin guhertinan di rêdan û qanûnên dewleta xwe de bike, û gavinan ber bi demoqrasî û aştîyê de bavêjin. Lê, ta bi vê rojê tu gav nehatine avêtin. Tenê çavên xwe ji weşandina hin kovar û rojnameyan, pirtûk û nivîsan digrin, lê bi awayekî serbest û azad tu tişt dernakeve. Zimanê Kurdî qedexe ye. Tevaya Kurdên me bi zimanê Turkî di mal de û li serserê karê xwe dipeyivin. Tiştê pir xerab xwendevanên zimanê kurdî tune ne. Kurd jî guh nadin zimanê xwe. Rojnameya (2000 yenî gundem) bi zimanê Turkî li dora- 15000- hejmar tê çapkirin. Lê rojnameya (Azadiya Welat) an (Roja Teze) yê ko bi zimanê Kurdî derdikevin, ne pirtirî-2000-hejmar tèn çapkirin. Ew jî bi tevayî

nayên firotin. Ev tişteki pir xerab e. Ji hemû nivîskar û rewşenbîran, partî û rêxistinên tê xwestin ko li ser vê rewşa ne durist bisekirin, û destên xwe li ser birînan deynin, û derman bikin.

Ev rewşa ne durist pir girêkên ne saxiyê di laşê tevgera rewşenbîriya Kurdî de çêdikin. Yek ji van girêkan, rewşa aborî ye. Çaxê pirtûk, kovar û rojname têne çapkirin, xerciyek pir mezin li wan dibe. Heger ew weşan xerciya xwe dernexe, piştî çend hejmaran, ez bawer im, wê bisekine. Herweha rewşa tevgera rewşenbîriyê jî qels dibe. Ango, têkiliya di navbera xwendevan û berheman de namîne. Ango, rola rexnegîr namîne. Wê gavê awayê nivîsandinê, celebên nivîskariyê, naveroka berheman û asoyê rewşenbîriyê diçilmisin, pûç û bê ber dibin.

Li bajarê Istenbolê, tevgera nûzayî dest pê bûye. Li dora neh-deh kovar û rojname tîn weşandin. Pênc çapxaneyên Kurdî hene. Du-sê dezgehên Kurdî, ji bo rageyandin û weşanên Kurdî hene. Lê mexabin,

herêmên Kurdistanê ji van tevgeran tevan bêpar in.
Li van weşanan qedexe ye derbasî Kurdistanê bibin.
Heger derbas dibin jî bi awayekî pir kêr û ne penî
ye.

*Kovara **Pirs**-hejmar:20,sal:7,zivistan 2000.Li
binxetê tê weşandin.

Hevpeyvînek digel xamesoz û mamoste Dilawerê ZENGÎ re⁴

Mîdasê Azîzî

***Berî hertiştî em bixêr hatina te dikin, ku ji nêz ve tu ji Kurdistanê hatiye, bi bihneke xweş, hinekî li ser çûna xwe wekî pêvajo û helwest.**

-Di destpêkê de, ez ji dil û can spasiya we dikim, weşana kovara we (Zevî) pîroz dikim.

Bi rastî, ji mêj ve, dilê min û çûna Kurdsitana başûr pir hebû. Lê, mexabin ji ber gelek sedeman pêk nedihat. Li vê dawiyê çûn û hatin di navbera Sûriyê û Îraqê de serbest bû, min ev nîr bi dest xwe xist û ez çûme Kurdistanê.

Di baweriya min de, dan û standin, têkilî û girêdana pêwendiyên di nav perçên Kurdistanê de qels in,

⁴ Kovara Zevî-hejmar:4-sal:2002. Rû:37-42. Sûriye.

pêwîst e geş bibin, nemaze di vê qûnaxa ku gelek pîlan û êrîşên pir mezin li ser pirsê Kurdî dibin, çî di warê ramiyarî û doza Kurdî de be, û çî di warê rewşenbîriyê de be. Dijminên me, bi van sînorên çêkirî şerê me dikin, em perçe kirine, divê perçebûna xaka me ne be sedemên perçebûna çanda me.

***Te rewşa Kurdistanê çawa dît, ji layê çapemenî û dezgehên rewşenbîrî de, û ji layê siyasî ve? Te ji nivîskaran kî dît?.**

-Di sala 1991ê de, piştî serhildanê, ez çûbûm Kurdistana başûr û li dora mehekê li wir mam. Bi rastî, pir cudahî di navbera herdu çûnan de heye, tu nikarî bidî ber hev, di roja îroyîn de, Kurdistana başûr di rewşeke azad û serbixwe de dijî, hikûmeteke xwedî rêbaz û dezgeh, xwedî perleman û civakeke nû ye, serpêhatiyeyeke nû ye, bi awayekî demokrat, kar û bare xwe pêşve dibin, ji her hêlê de, avahî dest pê bûye, gund û bajarên ku bi dest dijmin hatibûn wêran kirin, ji nû ve lêdibin, rêbaza pîrbûna

partiyên heye, rêbaza çapemeniyê heye, wezaretên mafê mirovan lidar e...

Bi rastî, kar û xebatên ku li welatê xwe kirine ji temenê serpêhatiyê mezintir e, rewşa çapeme-niya Kurdî pir li pêş e, weşan û çapkirina pirtûk, kovar û rojnameyan şoreşek bi serê xwe ye, ez çûme serdana hemû dezgehên çandî û çapeme-niyê, mîna: weşanxane û dezgeha Aras, mala Şerefxanê Bedlîsî, dezgeha Gulan, rojnameya Medya, rojnameya Biratî, Xebat û yekîtiya nivîskaran, dezgeha ragiyandin û rewşenbîriyê ya Partî demoqrati Kurdistan, mekteba siyasî ya partî demoqrati Kurdistan-Îraq, mekteba siyasî ya partî demoqrati Kurdistan-Îran, partiya YNDK, û di 26/7/2001-ê de, li Serê reş (Serê bilind) serokê partiya demoqrata ya Îraqê, serok **Mesûd Barzanî**, ez pêşwaz kirim. Bi rastî, ew dîtî, ji min re, şerefek pir mezin bû, ez pir sipasdarê wî me, ku ji wextê xwe yê pir zêrîn demek dirêj û xweş me bi hev re bûrand, bo min rojeke dîrokî bû.

Min gelek rewşenbîr û nivîskar jî dîtî, ji wan; prof-Marûf Xeznedar, Dr. Şukriye Resûl û mere wê Dr. Xelîl Îsmâil, cîgirê parêzgeha Hewlêrê Mihdî Xoşnaw, nivîskar Hesên Silîvanî, nivîskar Ahmed Qerenevî, zimanzan Salar Osman, helbestvan Mihsin Aware û gelekên din...

Di van rûniştin û danûstendinan de, em gelekî axivîn li ser pêvajoya çand û toreya Kurdî, li ser rewşa îroyîn ya ku Kurdistanê başûr tê de ye, min doz li siyasetvan û rewşenbîran kir, ku vê pêvajoyê bi hestekî neteweyî hilgirin ser milan, û qûnaxa bûrî bi mejiyekî neteweyî, vekirî û serbixwe binerxînin, lê mixabin, hestê herêma li nik wan pir xurt bû, pêvî rewşenbîr û siyasetva-nên partiya (YNDK) bi serokatiya kek Xefûr Mexmûrî, ramana neteweyî li nik wan pir bi hêz bû. Di weşanên xwe de gelek lêkolîn û berhe-mên hêja di vî warî de, dane weşandin.

Li hêleke din, em baş li ser rêzgirtina taybet-mendiya her rêxistinekê li her perçakî ji Kurdistanê

sekinîn, û em hewcedarê geşkirina pêwendiyên siyasî û rewşenbîrî ne, ew têkilî li ser bingeha kurdayetî, ne li ser bingeha partîtî bin, di gelek dîtin û nêrînên xwe de, em wek hev nediramiyan. Lê, armanca me tevan ji bo pirsê Kurd û Kurdistanê bû.

***Gelo nêrîn û dîtina wan, bo rewşa çandeyî li nav Kurdên Sûriyê çawa bû?**

-Mixabin, hayê wan ji rewşa çandeyî ya me nîn e, ev jî ji ber gelek sedeman tê, ya sereke ew e ku me tu pêwendiyên bi rêkûpêk bi hev re girênedane; wan sînoren çêkirî ji nav xwe ranekirine, û derbas nekirine, her û her ew xwe di ser me re dibînin, ev jî pir sedemên girêkûtî jê re hene.

Em bi firehî li ser van derd û êşan rawestiyan û me pir gilî û gazine xwe bi hev kirin, bi rastî cihê razîbûna gelek rewşenbîr û siyasethvanan bû.

***Wek tê zanîn, li tevaya rojhilata navîn, ku herdem dadmend pênuşên nivîskaran dixin bin**

bandore xwe, gelo li Kurdistanê ev sînor hatine derbaskirin an na?..

-Wekî min di pêşî de jî diyar kir, serpêhatiyeke nû û taze ye, pêşiyên me gotine: (Goşt bê hestî nabe). Nemaze hin nivîskar û rewşenbîrên ku pir erzan in û erk û berpirsiyariya xwe li hember dîrokê nizanin; li ser rûpelên kovar û rojname-yên partiyekê şerê partiyekê din dikin. Hene yên ku avê li aşê partîtiyê, şerê birakujiyê dikin. Lê, tucarî nabe mîna rejîmên derdora me. Pênûsên xweparêz û serbixwe pir in, rêbaza çapemeniyê li Kurdistanê heye, di bin vê serbestiyê de, tu dikarî, û ji mafê te ye her tiştî di riya rêbazê re bikî.

***Piştî hatina te, çi li nik te ma û di hişê te de xwe dilivîne wek bîranîn?**

-Bi rastî, gelek tişt û bûyerên bi bandor hebûn; hin bi rewşa gel û aboriyê ve û hin bi rewşa siyasî û çandeyî ve girêdayî ne. Lê, tiştên hez-dikim bibêjim ev in:

-Gavek pêwîst e, ko hin nivîskarên başûr berhemên xwe bi tîpên Latînî diweşînin. Ji me tê xwestin em piştgiriya vê gavê bikin, gaveke pîroz e.

-Geşkirina têkilî û danûstendinê (çandî, aborî û civakî) di nav perçeyên Kurdistanê de.

-Tevgera Kurdî li Sûriyê taybetmendiya xwe di bin konê (Kurdistanî) de winda neke, pirsgirêka wê li bajarê Şamê tê çareserkerin, nakokiya wê bi rêjîma Sûriyê re ye, çekên Zaxo û Dihokê wê rizgar nakin. Lê, ez ne dijî pêwendiyên li ser bingeha rêzgirtina wekhev bêne avakirin.

-Rewşenbîr û nivîskarên Kurd li Sûriyê di pireya kovar û rojnameyên wan de dinivîsînin. Ez bawer im ev rev e ji jîweriya xwe, gelo kovar û rojnameyên me tune ne..!! Pêşketina civaka me erk û stûbarê me rewşenbîra ye. Lê, ne şaş e berhemên xwe ji hev re rêkin da ko hayê me ji hev hebe, û divê jî hebe.

Di dawiyê de, ez sipasiya we dikim, li ser vê guhdanê, û her bijîn ji bo çanda Kurdî.

Kurtejiñenîgariya Dilawerê ZENGÎ:

*Ew bixwe ji xelkê Kurdistana Bakur e, ji (Qeza Şêrwanê, welayeta Sêrtê, gundê Qewmik), û ji êl û eşîra Dumila ye.

*Di dema şerê Dewleta Osmanî û Êris de û ji ber sedemên ranyarî yên wê demê, kalkê wî (Mihemedê 'Emê) tevî malbata xwe, ji gundê xwe derdikevin û berî didin binya Xetê. Bi rê de, û li gundekî ji gundên Wêranşehrê Mihemedê 'Emê dimre. Lawên wî (Isma'îlê Mihemedê 'Emê û birayê xwe Mihemed) meşextî binya Xetê dibin û li bajarê Amûdê bicî dibin.

*Dilawerê Zengî, piştî şewata Sînema Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961-ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê.

*Ji ber rewşa xizanî û feqîrtiyê xwendina xwe ya bilind kuta nekir. Lê xwe ji xwendina pertûkan û çûn û hatina linik mirovên rewşenbîr, siyasetmedar û zanayên Kurd û civatên wan bêpar nekir .

*Di sala 1979-an de, li Amûdê bavê wî diçe ser dilovaniya Xwedê, di wê salê de, dest bi nivîsandina helbestanê dike.

*Li ber destê diyeke welatparêz û miletperwer mezin dibe. Evê diyê (Ferîde Elî) akameke (bandûreke) pir mezin li jiyana wî ya nivîskarî û ramyariyê dike. Diya wî Ferîde Elî gelek zarok ji nav agirê sînema Amûdê xelas kiriye û bi navê diya Pakrewanan tê naskirin.

*Bandûra Şêxê welatparêz û miletperwer (Şêx Sedredînê bavê kal) pir lê dibe û li ser destê wî dest bi nivîsandina Kurdî dike.

*Du salan li gundê (Girê Sor) mamosteyî dike.

*Di sala 1979-an de, li ber destê seydayê Tîrêj hînî nivîsandina helbestê dibe, û ji wê rojê de heta roja koçkirina seyda hevaltiya wan berdewam kiriye. Hêjayî gotinê ye ku seydayê Tîrêj navê Dilawer lê kirye.

*Di sala 1980-an de, ji neçarî berê xwe dide bajarê Şamê û li Zangoya Şamê kar dike. Piştî heşt salan ew dûrî karê xwe dikeve. Ji wê rojê de, xwe ji nivîsandin û lêkolîn û xebatê re vala dike.

*Di sala 1983-an de, li ber destê Osman Sebrî hînî nivîsandina serbest dibe. Ji wê rojê de, li dora deh

salan, têkilî di navbera wan de berdewan dibe ta ku Apê Osman ji nav me koç dike.

*Li bajarê Şamê gelek qursên fêkirina zimanê kurdî li nav kurdên Şamê lidar dixê û bi sedan xort û keçên kurd fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dike.

*Di warê ranyarî û siyasetê de, li dora 35 salan kar kiriye û di vî warê de gelek keda wî heye.

*Di sala 1987-an de, Rewşen Bedir-Xan nas dike.

*Piştgiriya Rewşen Bedir-Xan di wergerandin, amadekirin û weşandina çend pirtûkên wê û yê malbata wê de dike. (Bîranînên Salih Bedir-Xan. Name bo Mustafa Kemal paşa. Mîr Bedir-Xan. Û....hwd).

*Di sala 1991-ê de, piştî serhildana Kurdên başûr, diçe Kurdistanê û li wir çend semînerên rewşenbîrî û toreyî lidar dixê.

*Di hin rêdaksiyonên kovar û rojnameyên Kurdî de kar dike.

*Ji bilî nivîsandina lêkolîn û helbestan karê rojnamevaniyê jî dike. Di gelek kovar û rojnameyên Kurdî de nivîsandiye û dinivîsîne.

*Gelek dîwanên helbestvanên Kurdan yê navdar ji tîpên Erebî wergerandiye Latînî û pêşgotin ji wan re nivîsiye ji wan: (Seydayê Tîrêj: dîwanên wî: Xelat, Zozan û Cûdî), (Seydayê Bêbuhar: dîwana wî: Zindan)...û du dîwanên helbestvan Ebdurehmanê Mizûrî (Ji evîna çirayên kevin û li xelkê tehlê li min şêrînê). Li dora (200) pertûkên li ser tore, çande, dîrok, û folklorê Kurdî li Sûriyê daye weşandin.

*Di sala 1985-an de jin aniyê. Sê kur û keçek wî hene: (Roya, Rodî, Ronî û Rewan).

*Di sala 1999-an de ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di 12/7/2000-an de, li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe bajara Enqerê û xelatê pêşkêşî prof. İsmail Beşikçi dike.

*Di sala 2004-an li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide xanima hêja Danyêl Metran.

*Di sala 2008-an li ser navê Komîta (xelata Osman Sebrî) diçe Elmanya ji bo xelata Osman Sebrî bide mamosteyê gewre Munzir Elfedil.

*Di sala 2011-an de careke din ji hêla Rojnameya Mîdiya ya ku partiya (YNDK) li başûrê Kurdistanê diweşîne xelatê (Rêzname) werdigre.

*Di sala 2012-an de, ji hêla komela Celadet Bedirxan ya çandeyî li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

*Di sala 2013-an de, ji hêla komela Şawîşka li bajarê Qamişlo hat xelat kirin.

* Gelek caran serdana başûrê kurdistanê kiriye û ji aliyê serokê kurdistanê Mesûd Barzan û Celal Telebanî û gelek serkirdayetiyên partî û rêxistinên siyasî û rewşenbîrî li başûrê kurdistanê dihate pêşwazî kirin.

*Têkilî, danûstendin û hevaltiya wî bi van navdaran re pir xurt bû: Seydayê Tîrêj, Seydayê Cegerxwîn, helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), ronakbîrê mezin Osman Sebrî, wêjevana gewre Rewşen Bedirxan, dîrokzan Hesên Hişyarê Serdî, helbestvan Keleş, helbestvan Hamid Bedirxan, helbestvan Umerê Lelê, Zimanzan Ehmedê Palo,

helbestvan Hadî Behlewî, zimanzan Rezoyê Osê,
helbestvan Mihemed Elî Heso, helbestvanê hêja
Ehmedê Şêx Salih.. û htd.

* Berhemên wî di warê Helbest, Çîrok, Ziman,
Dîrok, Wêje, Folklor û wergerandinê de, li dora (40)
pirtûkî weşandiye. Gelek pirtûkên wî destnivîs
hene..

*Ji sala 2013-2020 de, ew serokê Yekîtiya
Nivîskarên Kurd-Sûriyayê bû.

*Xelata Azadiyê ya Şehîd Miş'el Temo ya salên
2017-2018-an, li bajarê Qamişlo wergirt.

Berhemên wî:

*Mem û Zîn, Ehmedê Xanî, Veguhestina tîpan ji
Erebî bo Kurdî; Dilawerê Zengî û Seydayê Tîrêj. Şam,
1984 (Destnivîs) e.

*Dîwana (Pêdarî), Helbest. pêşgotin: Seydayê Tîrêj.
Sal:1985.Şam.

*Gramêra Ziman-Celadet Bedir-Xan û Rojê Lîsko -
wergerandin-1990. Şam.

*Ji Mesela Kurdistanê- Celadet Bedir-Xan – wergerandin-1990. Şam.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Ji Evîna Çirayên Kevin) veguhestina tîpan 1991.

*Dîwana helbestvan Ebdirehmanê Mizûrî (Li Xelkî Tehlê li Min Şîrînê)- 1991. Şam.

*Mîr Bedir-Xan: Lutfî, wergerandina: E.S. Goranî. Amadekirin û lêveger: Rewşen Bedir-Xan û Dilawerê ZENGÎ. Şam.

*Alîkariya Rewşen Bedir-Xan kir di weşandina hin pertûkan de, ji wan:

-Bîranînên Min, Salih Bedir-Xan. -Name bo Mistefa kemal Paşa. (Celadet Bedir-Xan). -Bîranînên jinekê (perçê didiwan).

*Şerefnameya Menzûm- Cegerxwîn- ji tîpên Erebi bo tîpên Latîni, û lêveger, ravekirin û serastkirin. 1997.

*Ez û Agir- Dîwana helbestvan Hizrevan-wergerandina tîpan 1998.

*Stran, berf û baran -helbestvan Mûeyid Teyib wergerandina tîpan.

* Bedir-Xanî di Cizîra Botan de-Malmîsanij-wergerandin: Gulbuhar Bedirxan û D.ZENGÎ. 1998.

*Berî Heyv Hilê -çîrok- wergerandina Tewfîq El-Huseynî ji zimanê kurdî bo zimanê Erebî. Ji weşanên Mîdiya-Erbîl. 2001.

*Qedrî Can-Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.- amadekirin û berhevkin. Bi zimanê (Erebî). Çapxana Aras, Hewlêr 2001.

*Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Erebî- 2001. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

* Bîranînên Osman Sebrî- bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Şerrên Sasûnê -Osman Sebrî-.komkirin û amadekirin. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral. Careke din li Istanbulê, li weşanxaneyê Pêrî, 2005- hatiye çapkirin.

*Dîroka Kelepûra Mîrnişîniya Botan. –Mele Xelefê Bafî.-veguhastina tîpan. Bi zimanê Kurdî -2005. Beyrût, Libnan. çapxana Emîral.

*Qedrî Can -Helbest, Gotar, Çîrok û Wergerandin.- amadekirin û berhevkirin. Bi zimanê (Kurdî). Çapxana komal, Istenbol-2004. Careke din ev pertûk li çapxana Emîral, Beyrût- Libnan. 2005-an de hate çapkirin

*(Wesenun Lil'işiq) dîwanek ji helbestan-wergerandina: Şêx Tewfîqê Huseynî bo zimanê erebî. Weşandina Dar -Kîwan-Şam -2005.

*Dîwana Helbestvan Yûsivê Berazî (Bêbuhar), Zindan, veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

*Dîwanên seydayê Tîrêj (Xelat-1, Zozan-2 û Cûdî-3), veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.

*Mewlûda Pêxember –Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral. 2006.

*Serpêhatiyên Kurdan-Tîrêj- veguhestina tîpan û pêşkêşkirina: D.Zengî. Beyrût- Libnan. Çapxana Emîral.2009. Di sala 2010-an de, ev pirtûk hatiye wergerandin bo zimanê Erebi, digel nivîskar Tewfîq Huseynî -Şam.

*Muxtarat (Lîqaat we Hîwarat), D. Zengî, Perçê 1-2. Beyrût-Libnan.Çapxana Emîral. 2009.

*Etyaf El-Madî, Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana Emîral.2009.

*Bînahî- (Gotar û Lêkolîn, Helbest û Hevpiyivîn), D.Zengî, Beyrût – Libnan. Çapxaneyaya Emîral.2010.

*Ebdulrezaq Bedir-Xan, wergerandina D.Zengî, Beyrût - Libnan 2010

*Bîranînên Celadet Bedir-Xan. Komkirin û veguhestin: D.Zengî. Bi herdû zimanan /Kurdî-Erebî/. Çapxana: Emîral. Beyrût-Libnan. Çapa: didiwan. 2010.

*Çîrokên Kurdî, Danheva: Rojê Lîsko, Wergerandin ji zimanê Kurdî: Tewfîq Huseynî û Dilawerê Zengî, Şam, 2010.

*Ji wêjeya dozê. Amadekirin û komkirina D.Zengî û Ehmed Şîhab. Elmanya- Berlîn- 2011.

*Osman Sebrî. (Jiyan, Tekoşîn û Berhem), Daner: D.Zengî. Beyrût-Libnan. Çapxana: Emîral.Sal: 2012. Bi zimanê Kurdî-Erebî.

*Çîroka Alaya Kurdî. Qamişlo. 2012.

*Pirtûka (Wêjeya Kurdî- Di navbera Rastî û hêvîyan de)- Daner: D.Zengî Qamişlo, 2014-an.

*Tedarîs El-Edeb El-Kurdî, Wergerandin ji zimanê Kurdî bo zimanê Erebi, Qamişlo, 2014.

*Pirtûka (Kurd û Kurdistan) Daner: D.Zengî. Bi zimanê erebi, Qamişlo, 2015-an.

*Nivêjên Êzîdiyan- Celadet Bedirxan- Veguhestina tîpan ji erebi bo latîni: D.Zengî- Qamişlo, 2017

*Xwendina Kurdî, Kamîran Bedirxan. Wergerandin bo zimanê erebi: D.Zengî. Qamişlo 2017

*Rewşen Bedir-Xan, (Jiyan û Berhem). Dilawerê Zengî, Qamişlo 2017

*Ji Xunava Bîranînan, (Dîtin û Hevpeyvîn), Qamişlo 2017

*Raperîna Çanda Kurdî di Kovara Hawarê de, Daner: Husên Hebeş, Wergerandin ji zimanê Kurdmancî bo zimanê Erebi: Dilawerê Zengî, weşanxana: Dar, Qamişlo, sal:2017.

*Rewan, (Gotar û Lêkolîn), pêşgotina Dilovanê Deştê, Qamişlo 2017

*Tabloyên Şerefnamê, Ebdulreqîb Yûsiv Zivingî, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2018.

*Destpêka edebiyeta kurdî, Mihemed Uzun, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê erebî: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

*Şerên Sasûnê, Osman Sebrî, wergerandin ji zimanê kurdî bo zimanê Erebi: Dilawerê Zengî, Qamişlo 2019.

*Qîrîna Mirinê, Dilawerê Zengî, bi zimanê Kurdî, pêşgotina Dilovanê Deştê, Qamişlo 2019

*Dîwana Gulistan, Dilawerê Zengî, bi zimanê Kurdî, Qamişlo 2019

*Kurdên Çewisandî û birayên wan ên Misilman, Cemal Nebez, wergerandin ji zimanê erebî bo zimanê Kurdî-Kurmancî, Qamişlo, 2021

Helbestên ku diyarî min bûne

Ji Dilawerê ZENGÎ re

Li Şamê qebqeba kew tê

Li min da şewşen û şew tê

Hilavêtim nema xew tê

Ji rengê Dicle rûbar im

Hejandim nameya ZENGÎ

Ji xew rabûm bi wî dengî

Bi kêf û rewş û ahengî

Ji mihla wî evîndar im

Ji mihrê pertewek da min

Li min nûkir evîna min

Du mestanê bi yek cam in

Belav û sewsî û tar im

Kevanê Xan-Şeref da mil

Li min nêrî bi çavê kil

Perî kêşane cerg û dil

Bi sê tîran birîndar im

Li meydanê DILAWER bû

Di mihrê de li hev wer bû

Bi nîşana xwe bawer bû

Di fitrakê giriftar im

Çeleng û jîrek û têz e

CELADET vêge ew rêz e

Ziman û şêwe parêz e

Bi seyda re tebakar im

Ji endamê dibistan e

Tenê murxê gulistan e

Li dora wî piristan e

Digel wî hemdem û yar im

Li goşê bîr û zanînê

Di ferhengok û azînê

Bi endazî dira çînê

Li wê kamê xerîdar im

Enê jor û qelemgêr e

Sipas û aferîn jêre

Dijê dijmin ez im pêre

Li dengê wê hewadar im

Li baxê rist û awazê

Bi raman û qelembazê

dibînim wê bi ustazê

Ji bo mafê nigihdar im.

Ehmedê Şêx Salih

Cizîrê-Eyndîwar/1991

Ji Dilawerê ZENGÎ re

Mizgîn li te be Cegerxwînê Kurd

Seydayê nemir, zana û rêber

Warê tu lê bû, nemaye xalî

Di pey te îro, maye DILAWER

Şehr û bajarê tora gelê Kurd

Nemaye vala, bêkes û xwedî

Barê te'y giran, daye milê xwe

Şopa te îro, ewê daye ser

Seyda de rakev, bê derd û bê kul

Ala te îro wa hildaye jor

Xortê çeleng û jîr û hinerbaz

Şahê evînê li textê Keşwer.

Seydayê Tîrêj

Cizîrê/Hisiça

22/6/1985

Dilawer...

Hey Dilawerê ZENGÎ Lawekî çak û şengî
Hem tu comerd û zanî Hem tîkoş û lehengî
Girnas û dilawerî Ji bo welat perwerî
Îro ji gelê Kurd ra Hozan û rewşenberî
Kurd bi hewcî wek te ne Ên wekî te çande ne
Kurd di şevên tarî da Li ber ronahî we ne
Gelê Kurdê pehlewan Mabûn ne xwendî nezan
Gelê Kurd zana kirin Xortên wekên te hozan
Gelê Kurd raketi bûn Sed salan paş keti bûn
Bindest kevneperestan Bend bend bihevketibûn
Ji ber dijmin zan kuştin Heçê ên nezan hiştin
Xwe firoş kirin padşah Wan Kurd bihev dan kuştin
Hozan rabûn ban kirin Gelê Kurd şiyar kirin
Kurdan riya çewt berdan Wan riya rast naskirin
Yek Cegerxwînê nemir Wî bi rista xwe şerkir
Kirk ji dest xwe berneda Wî nivîsî heya mir

Yek ji wan Osman Sebrî Zanê manî nemirî
 Li pişt mê xema mexwin Zanyarî ezber kirî
 Tu û seydayê Tîrêj Hûn du devên hingivrêj
 Hûn di pê Cegerxwîn ra Şewq didin wek gilawêj
 Em milên xwe bidin hev Binvisînin roj û şev
 Wek Cegerxwînê nemir Bê çewtî badan û rev
 Hozanên li çar birran Ji Sor û Lor û Goran
 Ji Badîn û Zaz em tev Hilgirin barê giran
 Hevalê min Dilawer Ez dibêjim bi bawer
 Kurd nagên armanca xwe Bê tore û rewşenber
 Heçî gelê bê hozan Wê tim bimîne nezan
 Ne şiyar û raketî Bindest, hejar û xizan
 Ê hozan û tore bê Dibê yara wî hebê
 Nizanê binêvêsê Di evînê wernebê
 Ji eşqê bûm Bêbuhar Ez pir geryam war bi war
 Kurdistana xwey rengîn Min jê rindtir nedî yar.

Bêbuhar (Yûsifê Berazî)

**Diyarî ji bo helbestvan û torevanê mezin
Dilawerê ZENGÎ re.**

Ebdurehîmê Mûşî

Ji deva gul dibarin
Bi pêûsa wêjekar
Xortê leheng û zanyar

Dirêse derdê xedar

Heta bihara me bê
Bêje tu wek bilbila

Saet xweş be Dilawer
Te pêtek berda dila
Ronakbîrê, rewşenbîr

Birêje derd û kula

Silavên xwe dişînim

Bi derya baxê gula

Tu gewherek biha ye

Ey ezîzê wênedar

Destbirakê xoşewîst

Tu pir ciwan e, kubar
Tu wek Cegerxwîn şêr e
Polat in dil û ceger
Belê mêrxas gişt şêr in
Ji ber ku zehf bi wêr in
Ne wek hinek xewêra
Nezan in, an jî newêr
Hewl didin wekî mîra
Ji bo azad'ya xweser
Ta'j koletî rizgar bin
Natebitin ew yekser
Rê ya gel ronî dikin
Bi wan Helbestên ramyar
Ne ku pesnê te didim
Di te da pir in gewher
Dilawer xortê Zengî
Li ser welat tu bengî

Vê Helbesta'm dîyarî
Lê hinek ma dereng î
Ez jî wek cenabê te
Bûme bilbilê şeyda
Bindestî dil dihêre
Derd û kul lê bûn peyda
Wek Cegerxwîn gotî ye
Divê em rizgar kin war
Bibîrtînim ez „Seyda”
Hesret pêr çû xaka sar
Em ê mizgîn bidin wî
Roja em bibin rizgar
Welatê me wêran kir
Sitemkar dikin fişar
Di bin zilma zalim de
Stûxwarin hemû yar
Rabin hûn hemû leheng

Di cîhanê bidin deng
Ji bo ku em azad bin
Divê hemî bibin yek
Di bin sîwana welat
Kom bin nemînin dereng!
Di cîhana bêfedî
Em in îro ne rizgar!
Lewra gişt penaber in
Manin em bê cih û war
Yek bi yek em dimirin
Bi hesreta dost û yar
Kulmek lêxin li zilmê
Bes e! Ji zilma neyar
Her roj ew me dikujin
Wan zalimên koledar
Divê ji holê rakin
Êdî em zilma zordar

Heta kengê bindestî?
Bes e! Fîxan û hewar!
Rom û fêris, ecema
Li me xistin dor bi dor
Me kirin Qebra tarî
Van zalima qor bi qor
Pesta ku gelê me dî
Fîxan çû ezmanê jor
Cîhanê çavê xwe girt!
Navîn Kurdistana sor!
Welat bi xwînê avdan
Wek laleyan kirin mor
Ji bo Libya çarçav in
Ji bo kurda ker û kor!

Almanya, 23.03.2011

Ji Dilawerê Emê re (ZENGÎ)

Qebqeba Kewê Gozel
Ji mêj da, ta ji ezel
Me sondxwarî bi Furqan
Heta em herin mezel

Bernadin em azadî
Rêber Şêx Seîd, Qadî
Tu wext namirin Serwer
Dijîn di dil ebadî

Dema birayê xweş be
Bira Tu' b xeml û rewş be
Tu her hebî Dilawer
Dil û cergên te geş be

Silav, rêz û giramî
Tu her bijî b'aramî
Birayê ezîz, kubar
Dilawerê Zeng Emî

Mij ter nivisî helbest
Bi raman û fikr û dest

Destbirakê kurdewar
Te li min rakirî best

Min girt destên biratî
Bi dostî, bi hevaltî
Di rêya azadî de
Dilawer Tu b'xêr hatî

Bilbil im ez Dilawer
Dixwînim li seranser
Mêrekî bi xîret im
Ji bo azadya xweser

Li ser Gulê dixwînim
Dil bi kul û evîn im
Heta azadya me bê
Xewê çava d'revînim

Ebdurehîmê Mûşî
Almanya, 21.05.2011

BÎLBÎLÊ KURDISTANÊ

Bes e bikî Tu Fîxanê
Ey Bilbilê Kurdistanê
Te cîgerê min peritand
Wekî mîsala biryanê

Zarê te sêva l' dikanê
Dengveda heya Îranê
Têrnabim ji awaza te
Ey Sorgulê dibistanê

Xweda bide emrê dirêj
Me azadke j' zilma qirêj
Xwe biparêze Dilawer
Neşewtîne wekî kirêj

Min bihîst fîxana Bilbil
Birîndarim birîna dil
Wele te dilêm peritand
Dihelim ez ji nava dil

Kesê pêre parvekim derd
Nîne yekê wekî te merd
Di dilê min de şêrînî
Tu her bijî biray' comerd

Ebdurehîmê Mûşî
Almanya 05.12.2011

Dilawer Tu Ş a ` i r î

Dilawer Tu Ş a i r î
Di bin zilma gawirî
Zilma zalimê xedar
Dîsa dilê min b i r î

Xema dilê min xwarî
Ji pesta wî barbar î
Ewan kafirên bêdîn
Cîhan li me kir t a r î

Aqûbeta xwînxwara
Li serê hemû hara
Mitleq tê dawiya wan
Wan wawik û keftara

Dema fersendek çêbû
Hûn azadkin wî warî
Eger rêkî j' wer nebû
J' holê rakin wî harî

Ebdurehîmê Mûşî
Almanya

Ji bo Dilawerê Zengî

Baqê gulan jîna dil e
Zarşiranî banga dil e
Zêrîn sîmpel rewşa dil e
Azadî daxwaza dil e
DILAWER hevalê jînê
Reng dida rewşa civînê
Bijartin navê evînê
Qelem ji gerdena Zînê

Birayê we

Qehar Silo

Qamişlo 18.11.2016

Diyarî ji bo Dilawerê Zengî

Min bibûre ger nikarim bême serdanê bira
Ez bi hêvî me cîhan bo te bibî find û çira
Lê ezê qefdek gulê sor kek DILAWER rê bikim
Vêgre çend malik ji hestê xwe bihûnim ji te re
Zû tu rabî ser piyên xwe êş û azar dûr kevin
Rewşa tey çak û durist tim doz û omîd ji me re
Vegerî kar û xebatê têkoşîna xwe bikî
Tim hebî bona neviyên xwe ji van qîz û kura.

Hadî Behlewî

09-02-2017

Qamişlo

Wêne

Ji Xuxava Biraninan 249



Digel Serok Masûd Barzanî - Hewlêr- Serê Bilind



بارزان دلاوهر زهنگين - نوسهر و روشنيير

نوي بينتيلوني وهزيري دهرهوهي ئيتاليا كرد په يامنييري كورد



Digel Serok Celal Talebanî - Baregeha Qereçolan 2004



Digel Adil Mûrad - Silêmaniyê



Digel Cemîl Bayiq - Çiyayê Qendîl



Digel Rêdûr Xelîl û serbazekî pêşmergeyan
Buhurka Rebîa.



Digel Mele Bextiyar- Silêmaniye



Kongirê Raqihandinê ye Imzekirina Birnameya Levkirinê



Digel Endamê Serkirdeya P.D.K Mehmûd Mihemed -Hewlêr



Digel Ekrem Hiso li baregehê rêberiya xweser- Amûdê



Digel tekoşerê navdar Heme Hacî Mehmûd- Silêmaniyê



Digel Sekreterê P.D.K.P.S birêz Hemîd Hec Derwêş



Digel Sekreterê Y.N.D.K Xefûr Mexmûrî- Hewlêr



Digel Tekoşerê Gorbuhîştî Husên Şawîş



Digel Tekoşer Osman Sebrî ü Akiko Yamada ya Japonî



Digel Hoşeng Osman Sebrî - Berlîn



Digel Sekreterê P.D.K.S Nesridîn Ibrahim -Qamişlo



Digel Şanda Hevbendî û ya Encûmena Hozên Cizîrê



Digel Nesrîn Ebdella, Enwer Muslim û Nûşîn Bêcirmanî




Digel Bêrîvan Xalid û Mitran Behnan Hîndo- Hîşiça




Digel Wezîrê Çandê Xalid Doskî - Hewlêr



Digel Dr. Nûzad Ehmed Eswed - Berpîrsê Navenda Gelawêj



Digel Rewşenbîrê Gewre Celal Zengabadî - Hewlêr



Digel Serokê Yekîtiya Nûseranî kurd - Hewlêr




Digel Dr. Şêrgo Ebdulla



Digel Helbestvan û siyasetvan Mihemed Emîn Pencewînî



Digel Prof- Merûf Xeznedar - Hewlêr




Digel Prof- Izedîn Mistefa Resûl - Şam



Digel Dîrokzanê Gewre Ebdulraqîb Yûsif ê Zivingî



Digel Nivîser Ehmedê Zero



Digel Nivîskar Mustefa Şekûr - Li Mala O.Sebrî. Şam



Digel Hersî Bira Fehmî, Necîb û Ehmed Balayî- Berlîn




Digel Celîlê Celîl, Izedîn Mele, Dr. Wehbîyê Şewket- Şam



Li baregehê Yekîtiya Nivîserên Kurd - Duhok



Digel Helbestvan Şêrgo Bêkes, Dr.Azad Elî û Nezîr Cezmatî



Digel Neviyê Êzdînsêr ê Azîzî Mihemed Selîm Tahir-Urdin




Digel Zimanzan Feqe Husên û Mele Usmet - Istenbûl



Digel Zanyarê Gewre Taha Maî -Duhok - 1991



Digel Zimanzan Deham Ebdulfetah - Amûdê



Digel Prof- Dr. İsmail Beşikçi - Turkiya- Enqera 2000z



Digel Hunermendê Gewre Şivan Perwer - Elmanya- Bon



Digel Herdû Helbestvanan: Yûsiv Berazî û Tîrêj -Amûdê-1985



Digel M.Şêxo,B.Nazê,Tîrêj,S.Şûzî, Li Newroza Şamê 1984



Digel Lêkolînerê Gewre Malmîsanij - Turkiye- Istenbol



Digel Nivîskarê Hêja Dilovanê Deştê - Qamişlo



Digel Nivîskarê Gewre Mehmûd Lewendî- Parîs



Digel Nivîskarê Gewre Husên Mihemed Elî - Qamişlo



Digel Helbestvanê Gewre Ehmedê Şêx Salih-Eyndiwar




Digel Wêjewanê Gewre Şêx Tewfîq ê Huseynî- Amûdê



Digel Şêwekarê Hêja Zubêr Şêxmûs - Qamişlo



Digel Helbestvan û Hunermendê hêja M.Elî Şakir




Digel Xanima Gorbuhîştî Rewşen Bedirxan - Şam



Lawên min: Royar, Rodî û Ronî




Digel Nivîskar Evîndarê Xemgîn û Helbestvan Xemgînê Remo



Hunermendê Gewre Mezher Xaliqî - Silêmaniyê



Digel Sînem Bedirxan




Digel Helbestvan Ferid Zamdar



Digel Nivîskarê hêja Riza Çolpan û Ismaîl Umer - Şam



Digel Nivîskar Evîndarê Xemgîn û Nivîskar Hesên Dirê



Digel Nivîskar Mesûd Mihemed - Hewlêr



Digel Çend Nivîskarên Yekîtiya Nivîserên Kurd - Duhok 1991



Digel Nivîskar Zeynelabidîn Zinar - Şam



Digel Nivîskarê hêja Mihemed Şêxo



Digel Wêjevanê Çînî Arif Lî Ronx jiyan - Şam 1998



Li Ferensa - Parîs - 2008



Li Danîmark 2004



Li Belcîka - 2008



Digel Nivîskar Dilovanê Deştê, Zimanzan Dr.Diyai
Receb,Ez û Şanoger Mihemed Eşerf- Qamişlo



Li Duhokê- Zangoya Emrîkî



Digel Şêwekarê Hêja Mihemed Se'dûn - Amûdê



Digel Helbestvan Stêrê Çelo - Kobanê - 2016



Digel Nivîskar Faris Osman - Qamişlo



Digel Nivîskar Hesên Cengo - Qamişlo



Digel Mamoste Hekem Xelo û Nivîskar Xalis Misewer



Digel Şêwekar Dildarê Felemez - Qamişlo



Lawê min Ronî û keça xwe Ava- Danîmark



Neviyên Min Honya û Beyar - Danîmark



Digel Helbestvan Hadî Behlewî Bavê Nûhat



Digel Nivîskar Mihemed Cezai Bavê Boşkîn



Digel Nivîskar Ebdulbarî Xelef - Qamişlo



Digel Nivîskar Qehar Silo - Qamişlo



Digel Helbestvan Se'îd Dêrşewî- Amêdiyê- 1991




Digel Nivîskar Salihê Heydo - Qamişlo



Digel Siyasetmedar û Rewşenbîrê gewre Îsmâil Umer



Digel Nivîskar Gorbuhîştî Xelîl Kalo - Qamişlo



Digel Seydayê Gewre AbdulFerîd Cizîrî - Hisiça 2017



Digel Dr. Mihemed Bekiro - Hisiça 2017



Bavê min Îsmailê Emê û Diya min Ferîda Elî



Keça min Rewan - Qamişlo, Di roja Cil û Bergên Kurdî de



Bav, dê, xuh û birayên min






Neviyên min: Lîlav û Perî - Qamişlo - 2016





Hin Pirtûkên Min î Çapkirî





Hizirvan
EZ Û AGIR

